# *Serpêhatiyên Penabertiyê*

Hesen Huseyîn Denîz

**Aram/Anı-Roman**

**Serpêhatiyên Penabertiyê**

Hesen Huseyîn Denîz

**Aram:** Anı/Roman

**Türkçesi:** Sibel Yeşilgöz-Burcu Şentürk

**Aram Yayınları**
ŞEVDA Basım Yayın Markasıdır

***Baskı Tarihi:***
**1. Baskı:** 2003
**2. Baskı:** 2012

**Yayın Koordinatörü:** Gökhan HUSEN

**Editör:** İlhami SİDAR

**Grafik Tasarım:** Zafer TÜZÜN

**Baskı ve Cilt:**
Gün Matbaacılık
Reklam Film Basım Yayın San. Tic. Ltd. Şti.
Beşyol Mah. Akasya Sk. No: 23/A
Küçükçekmece İstanbul
**Tel:** 0 (212) 580 63 81

**ISBN:** ieaieaaie

**Şevda Basım Yayın**
Huzurevleri Mah. Kalem Sok. No: 32 Kat: 3/3
Kayapınar / DİYARBAKIR
Tel: 0 (412) 238 30 71



*SERPÊHATİYÊN PENABERTIYÊ*

**Li ser bîranîna şehîdên nemir hevala Amara û hevala Ûta ku di qezayeke trafîkê ya bêbext û ne di demê de jiyana xwe ji dest dan…**

**Ez vê pirtûkê diyariyê giyana wanî pak dikim…**

***H.H.Denîz***

## *NAVEROK*


| | |
|---|---|
| Azadî Daxwaza Me Ye | 8 |
| Şerma Mirovahiyê | 27 |
| Xwelî Li Serê Min Be! | 38 |
| Koçberiya Di Koçberiyê De Ji Nînova ber bi Nehdaran ve | 50 |
| Warê Dûpişkan: Mexmûr | 79 |
| Ber Bi Yekîtiya Azad Ve... | 95 |
| Jana Dilê Min | 101 |
| Ez Bimrim! | 108 |
| Şehîd Ewlekarên Pêşerojê ne | 113 |
| Germahiya Li Ber Keviya Berfê | 119 |
| Rojek Ji Rojan | 127 |



***Mirov dikare bê serkevtin bijî,***
***lê nikare bê hêvî bijî***

**Rêberê Kurdan**



## *Li Şûna Pêşgotinê*

Zarokên agir û rojê, zarokên xaka dergûşa mirovahiyê, zarokên dîroka hezarên salan, rojek xweşî û bextewarî nedîtin. Ji ser xaka welatê xwe berba bûn û li her çar aliyê cîhanê weşiyan, wekî tovên mirovahiyê.

Koçberiya Kurdan ne ji îro ve ye. Di her rûpeleke dîrokê de serpêhatiyeke wê ya berbabûnê heye. Lê cara dawî bi girseyeke mezin û bi rewşeke trajîk di hundirê welatê xwe de derket ser rêka penabertiyê.

Dewlet û artêşa Tirk rêka jiyaneke bi rûmet li ser xaka dagirkirî ji wana re nehiştibû. Yan teslîmkarî, yan berxwedan li pêşiya wana bû. Gelek mirovên Kurd berjewendiya netewî û mirovahî bin pê kirin û serî li ber daxwazên artêşa Tirk tewandin. Rahiştin çekên wan, cilên wan li xwe kirin, potînên wan xistin lingên xwe, xwarina wan berdan zikê xwe û ketin pêşiya wan. Li çiyan, li deştan, li gund û bajaran li hember gerîlayên Kurd rawestiyan û li cem Komara Tirkiyê cihê xwe girtin. Ev helwest di nava gelê Kurd de wekî rêka xiyanetê, rêka bêşerefiyê hat binavkirin û lanet lê hat barandin.



Lê li aliyê din; girseyeke gel, li gorî berjewendiyên netewî û mirovahî tevgeriyan, berjewendiyên kesayetî bin pê kirin. Bîr û baweriya xwe bi têkoşîna rizgariya netewî anîbûn. Bi zarok û eyalê xwe, bi mal û milkê xwe, bi ruh û canê xwe, bi vê dozê ve hatibûn girêdan. Hemû helwest, hewildan, daxwaz û bandoriyên dewlet û artêşa Tirk nepejirandin, li dij derketin û li ber xwe dan. Di vê berxwedanê de, dibe ku welatê xwe bi dest nexistin, lê rûmeta mirovahî, namûs û şerefa xwe bin pê nekirin, eniya wan reş nebû û azadiya xwe bi dest xistin, gîhiştin dilşadiya serkeftinê.

Bihabûna azadî û berxwedanê; xerabkirin û şewitandina gundên wan û koçberbûna ji ser xaka welêt bû. Di şevekê de hemû mal û milkê xwe di cih de hiştin û xwe li sînor dan, derbasî başûrê welatê xwe bûn. Wiha dihizirîn ku birayên wan wê li wana xwedî derkevin, cih bidin wan û wana biparêzin. Ji ber ku dema birayên wan ên Başûrî ji ber zilma dagirker, bi ber Bakur ve xwe li sînoran dabûn wana ev helwest bi dilgermî û biratî şanî dabûn.

Mixabin helwesta tevger û rayedarên gelê Başûr wekî ya dewleta Tirk û ji wê dijwartir li pêş ket. Rojekê rehetî nedan

penaberên Kurd, birayên xwe yên ji Bakur hatine. Jiyan li wana kirin zindan û di penabertiyê de koçberî li ser koçberiyê bi wana jiyîn dan. Penaberên Kurd, ji Bihêr û Şeranîş koçî Bêsîvê, ji Bêsîvê koçî Etrûş û Geliyê Qiyametê, ji wir koçî Nînowa bûn. Nînowa li ser sînorê Iraqê, dawiya xaka Kurdistanê bû. Lê dagirkerî û nokeriyê ew li wir jî rehet nehiştin. Penaber derbasî wî milê sînor bûn û ketin xaka Iraqê, li Nehdaran bi cih bûn. Li milekî wan qereqolên Sedam, li milekî wan qereqolên pêşmergeyên Barzanî hebûn. Vê carê di navbera du agiran de mabûn. Rayedarên herêma Soran jî deriyê xwe li wana girtin. Êdî cihekî pê ve biçûna nemabû. Yan wê li wir serî li ber qedera xwe bitewandana, yan wê rêyeke din a çareseriyê bidîtana.

Di van pêvajoyan tevan de nûner û rayedarên Netewên Yekbûyî jî ne li gorî zagonên xwe yên mirovahî û navnetewî, li gorî polîtîka û berjewendiyên dewleta Tirk û hêzên herêmê tevgeriyan. Dem bi dem bi biryara xwe, ambargoya alîkariya mirovahî danîn ser penaberan û ew bi serma, birçîbûn û mirinê re rû bi rû hiştin. Ji xwe ewlekariya wan ti caran hilnegirtin ser milên xwe. Her rêka teslîmkariyê danîn pêşiya wan û hewil dan ku yekîtiya wan bişkînin.

Dawî bi çareserîdîtina gerîla û partîzanên têkoşîna rizgariya netewî berê xwe dan xaka Mexmûr. Li kêleka bajarê Mexmûr, di berpala



çiyê de, li ser germaveke kifritê, di navbera kuç û beran de bi cih bûn. Ne dareke hişîn, ne tayeke gîha, ne dilopeke ava vexwarinê li ser vê xaka rût nedihat diyarkirin. Di tevahiya Kurdistanê de cihê tewra germ ev der bû. Mar û dûpişk kerî bi kerî digeriyan. Ti kesan bawer nedikir ku mirov bikaribin li vir bijîn û vê çola warê dûpişkan bikin warê jiyana mirovan.

Lê penaberên Kurd bi bîr, bawerî û vîna xwe ya mezin, bi hêviya azadî û girêdayina doza pîroz dest bi avakirina jiyanê kirin. Di salekê de hêviya hemû neyarên xwe -tev li dûpişkan- têk birin. Jiyaneke nû ava kirin û bi ser ketin.

Di van çîrokan de hûnê serpêhatiyên penabêran ji derketina gund heta gîhiştina serkeftinê bi wana re bijîn; êş, jan, kêfxweşî, hêvî û berxwedana wan parve bikin.



## *Azadî Daxwaza Me Ye*

Werza Havînê bandora germahiya xwe li ser wargehê bi xurtayî bihîstin dida. Sibehê taveke germ ji navsera çiyan tîrêjên xwe dirêjî ser deşta Zaxo kir. Penaberên konên xwe li seranseriya her du aliyên rêka zifta Şeranîşê vedane, bi dengê dîkan ji xewê hişyar bûn. Ji berpalên çiyê qebqeba kewan, ji ser latan şeqîna bilbilan, ji daristanê gengeşiya tebayan wekî mûzîkeke orkestrayî bilind dibû û bala mirovan dikişand ser xwe. Li milekî şînatî, li milekî çiya, li milekî dengê çwîkan xwezayeke rengîn û bi coş radixist ber çavan. Mirovên li wir dijiyan ger nezanîbana penaber in, di nava vê xwezayiya bi coş de, dikarîbûn kêfxweş bibana û hemû kul û kederên xwe ji bîr bikrana; li bin dareke geş pal bidana erdê, çavên xwe biqurmiçandina û di xeweke bê xem de xwe ji bîr bikrana. Lê jiyana penabertî wekî tîrêjên rojê li ber çavên wan diçirisî û bibûkên çavên wan bi şewatekê li ser rastiya wan vedikirin, qermîçokên bi keder li ser eniyên wan xêz dikirin.



Zilamên wargehê dema misînê wan di destê wan de, li binê daran destmêja xwe pêk dianîn û vedigeriyan ser sicadeya nimêjê, şivanan jî ji malan pez kom dikirin û bi derketina tavê re xwe didan berpalên çiyê.

Dayikan amadekariyên sibehê dikirin; çend darên hişk komî ser hev dikirin, du sê ber datanîn derdorê û agir berdidanê. Pişt re yan zerika şîr, an çaydaneke av datanîn ser û li hêviya kelandinê radiwestiyan.

Qîzên ciwan bi sistahiyeke têrnebûna ji xewê, bê dilê xwe, çavê xwe li vê roja nû vedikirin. Di nava nivînan de weke berdewamiya xeweke şêrîn, bêhnekê di nava xeyalan de diman. Lê bi qîrdayina dayika xwe ji nava nivînan derdiketin û dest bi komkirina hûr û mûrên malê dikirin.

- Fatê, de rabe qîza min, dereng e! Zarokan jî hişyarke, wê xwe bi xewê bikujin.

Zarok jî bê dilê xwe ji nava nivînan derdiketin. Navbera mijankên wan tije şelêq bûn û çavê wan hîn li xewê bûn. Li pişta konan dizîvirîn, doxînên xwe dianîn xwarê û xwe rehet dikirin. Car caran di bin çavan re li hevdu dinêrîn û bê şerm dikeniyan.

Li ser sifra xwarinê; hemû endamên malbatê xelekeke girover çêdikirin. Ji qasî ku xwarin kêm bibû, tevan bi hev re dixwar. Ên xwedî pez hîn dikarîbûn şîr, mast û penêr li ser sifra xwe bidîtana.

Yên çend mirîşk bi xwe re anîbûn, du-sê lib hêk di nava kevçiyekî rûn de diqelandin û datanîn ber zarokan. Çay, gelek caran bi nanê tisî re dibû pêxwarinî, lê êdî nanê tisî jî peyde nedibû: Nanê Erkdarên Netewên Yekbûyî belav dikirin, ne têra malbatê, têra zarokan jî nedikir. Ji ber vê yekê çend qirûş pereyên wan ên hene, li bajarê Zaxoyê didan bi ard û pêdiviyên din. Ev ard rojane li ser sêlê dikirin nan û qasî ji wana dihat, kêm dixwarin ku ji binî ve nekevin nava tinebûnê.

Piştî xwarinê, qîzên ciwan porên xwişkên xwe şeh kirin, cilên birayên xwe durist kirin û sifreya xwarinê kom kirin, dest bi firaxşuştinê kirin. Di malbatên bê qîz de ev kar tev bi destê dayikan rêve diçûn.

Zarokên keç û kur, pênûs û defterên xwe hilgirtin û berê xwe dan dibistanên wargehê. Pişt re qîz û xort jî bi pey wan re derketin ser rê û berê xwe dan dibistanan. Dawiyê jî mamostayên wan bi rê ketin.

Di jiyana penabertî de karê tewrî kêfa wana jê re dihat û bi dilxweşî diçûnê, xwendina li van dibistanan bû. Dibistanên wan, ji ti hêlan ve ne wekî yên li Bakur bûn. Avahiyên wan tine bûn, sireyên wan û berdilkên wan jî tine bûn. Zimanê fêr dibûn jî ne zimanê berê bû.





Li bin dareke siya wê geş kom dibûn. Hinekan kamaxa xwe datanîn ser axê, hinekan berek datanîn bin xwe. Defterên xwe datanîn ser kabên xwe û çav û guhên xwe li axavtinên mamostayên xwe vedikirin. Cara yekem mamoste bi zimanê dayika wan, bi wana re diaxivîn.

- Zarokno, îroj dersa me li ser çêkirina hevokê ye. Piştî fêrbûna tîp û peyvan, îroj emê li ser rêzkirina hevokê rawestin. Binivîsînin:

*"Azadî daxwaza me ye."*

Zarok, tiliyên xwe yên biçûk li derdora pênûsa xwe dipêçin, hişk pê digrin û dest bi rêzkirina tîpan dikin. Car caran defter ji ser kaba wan dişemite û kaxez xêz dibe. Lê ne xem e, jêbira wan heye. Xêzka zêde pak dikin û bi baldayîn nivîsa xwe didomînin.

- Mamoste, min nivisî!

Zarokek heşt-neh salî lênûsa xwe bilind dike. Ji kêfan re ew bi xwe jî rabûye ser lingan. Porê wî yê zerîn, di binê tîrêjên roja di navbera pelçîman re bi reqisandin dirêj dibin de, diterise. Çavên wî yên hişîn bi çirûskên serkevtinê tije ne. Li gorî xwe tiştekî pirr mezin bi ser xistiye; wekî fermandarekî artêşê ku bajarekî bi dest bixe û encama çalakiya xwe bîne ser zimên, ji xwe bawer û razî ye. Mamoste bersiv dide:

- Baş e, bila hevalên te tev binivîsînin, pişt re hûnê bixwînin.

Pişt re zarokên din jî defterên xwe bilind kirin û li hêviya hev rawestiyan. Dema tevan nivisîn, yek bi yek xwendin. Mamoste li nava wana geriya û kêmasiyên wan bi pênûsê durist kir, ji ber ku texte û tebeşîra wan tine bûn.

Piştî dersê, zarok bi coş belavî nava konan bûn. Komeke gerîla ji cihekî dûr hatibûn. Berya derbazî çiyê bibin, li wargehê ji bo bêhnvedanê navber dabûn meşa xwe. Ji ber feqîriya rewşa penaberan, gerîlan li nava konan belav bibûn, her du-sêk çûbûn konekî. Penaber bi hatina gerîlan pirr kêfxweş bibûn. Ji aliyekî ve, amadekariyên xwarin û serşuştina wan dikirin, ji aliyekî ve, ew di nava pirsan de difetisandin.

- Heval, li cihê hûn jê tên rewşa hevalan çawa ye, rewşa şer çawa ye?

- Li wir jî heval zahf in, wekî li cem me çekên wan ên giran hene?

- Dijmin di çi helwestê de ye; xurt e yan bi bin ketiye?

- Gelo li wir jî dijmin zilmê dide ser gel; wan jî ji gundên wan derdixe?

- Heval dijmin Li wî milî jî firokeyan bi kar tîne? Li vir qet rehetiyê nadin me. Hingî tengav bûne êdî bi helîkopter û firokeyan dixwazin xwe li ser piyan bihêlin.





Gerîlan bi bêhnfirehî pirsên wan guhdarî dikirin û hinekan bi kurtî, hinekan bi dirêjahî, bersiv didan tevan. Ji rewşa wan dihat xuyanîkirin ku ew jî bi dîtina penaberan kêfxweş bûn. Bi salan li serê çiyan, ji gel dûr jiyîn hesreta wan a gel bilind û kûr kiribû. Wan jî di navê re gundî bê pirs nedihişt.

- Hûn ji kîjan gundî hatine vir?
- Gelo hûn ji mêj ve hatine yan van rojan?
- Gund hemû hate vir an hinek bi deverên din ve çûn?
- Hatina we bi zahmet bû, ne wiha?
- Gelo ti derfet nemabû, hûn li wan deran bi cih bibûna?

Gundiyan jî li hemberî van pirsên gerîlan careke din dest bi serpêhatiya penabertiya xwe dikirin. Çavtirsandinên Artêşa Tirk û zordayîna ji bo cerdewaniyê, nepejirandina gundiyan, gulebarandinên ser gund, biryardayîna koçberiyê û birêketin yek pey yek rêz dikirin û wekî careke din dijiyan, mijankên xwe datanîn ser hev û xemgîniyeke kûr xwe bera ser rûçikên wan dida:

- Bi Xwedê êvar bû, em di ser şîvê de bûn, roj li ber avaçûnê bû. Wekî îroj di bîra min de ye. Dayika zarokan sawareke têr rûn çêkiribû û çend lib hêk jî li ber qelandibû. Min du-sê kevçî jê xwaribû yan nexwaribû, min bihîst ku qîrek bi nava gund ket. Min

ji zarokan re got ku 'dîsa operasyon hat, ev qîrdayîn ne ji xêrê re ye'. Ji xwe berya sê rojan leşker hatibûn gund û sê roj qewl danîbûn pêşya me. Gotibûn: "Di van sê rojan de yan hûnê biryara cerdewanbûnê bidin, an jî bi ku derê ve diçin, biçin. Lê ku em we li ser xaka Tirkiyê li ku derê bibînin, emê we bikujin".

Dema min qîr bihîst, ev hat ber çavên min û dilê min qurmiçî, xwarin di qirika min de ma û kabên min sist bûn. Min got: "Ezê van zarokan çawa xelas bikim?"

Bi lez rabûm ser xwe. Min ji Xezalê re got: "Zû tiştên hûr û mûr komke. Zarokan amadeke û li hêviya min bimîne."

Êdi xwarin di qirika ti kesî re nediçû. Zarok jî têgîhiştibûn tirsa em tê de û ew jî ji ser sifrê rabûn. Bes kurê minî biçûk Mihemed dest bi girî kir. Xuya bû ku ji helwesta me tirsiyabû. Dayika wî ew hemêz kir û min xwe avêt der ve. Ez rast çûm mala muxtarê me. Min dît ku gelek gundî wekî min bi bêhnçikyayî li ber derî civiyane. Berya ez pirsyarkim, gundiyan got ku şivanên gund xeber rêkirine û gotine, leşker ji qereqolê derketine, wekî rêzeke bê dawî ber bi gund ve tên. Şivanan jî derfeta vegera gund nedîtine, xeber ji me re rêkirine û pezê xwe ber bi tixûbê Başûr ve ajotine.

Em gundiyên li hev kom bibûn, ji her bavikî hebûn. Muxtar got: "Ka em biçin camiyê, li wir biaxivin."





Em tev çûn camiyê û muxtar ji me re civîn çêkir. Got: “Leşker heta nebe sibeh navêjin ser gund, lê sibehê fermana me ye. Qûmandar êdî qewlê dawiyê daye. Divê yan em cilika bênamûsiyê bikişînin serê xwe û rahêjin çekên dijmin, li hemberî zarokên xwe bikar bînin, an jî em îşev ji gund barkin. Min nêrîna hevalan jî stendiye. Gotine ku li we pirr teng bibe hûn dikarin ji gund derkevin”.

Muxtar li vir axavtina xwe birî û yek bi yek li çavên gundiyan nêrî. Li hundir ku mêş bifiriya wê dengê wê bihata. Herkesî bêhna xwe girtibû û tevan rasterast li çavê muxtêr dinêrîn, ka wê çi bêje. Muxtar gavekê pêş de hat û bi dengekî nizim axavtina xwe wiha domand:

“Ez li vir eşkere diaxivim. Ji ber ku piştî vê civînê ezê zarokên xwe hemêzkim; pezê xwe bidim pêşiya xwe û derbazî Başûr bibim. Lê zora me li ser ti kesî nîne. Her kesek bi wîcdanê xwe ye. Her du rêk jî li ber we ne. Yek rêka xiyanetê ye, yek rêka azadiyê ye. Rêka xiyanetê dibe ku rehet be û rêka azadiyê zahmet e, ji ber koçberî ye. Di koçberiyê de birçîbûn heye, kuştin heye, perîşanbûn heye. Her tiştên zor û zahmet hene. Dibe ku careke din em gundê xwe nebînin. Dibe ku dayik ji keçan, kur ji bavan qut bibin. Lê rêkek bi şeref e, rêka namûsê ye.

Muxtar dîsa axavtina xwe birî û wekî hêrs bûye bi dengekî bilind domand:

"Yên rêka xiyanetê hilbijêrin, destê wan bikeve nava selika zêran jî, heta dawiya imrê xwe wê rûreş û dilşikestî bin. Ti caran wekî mirovekî bi namûs nikarin li rûyê gelê Kurd binêrin û sibê ger şoreş bi serkeve wê bi lanetkirinekê bên dardakirin. Êdi biryar a we ye. Biçin malê û bifikirin. Lê zêde dema me jî nîne. Yên dixwazin bi rêka hevalan de biçin, piştî saeteke din bila li nava ziyaretê kom bibin. Emê ji wir pêk re bi rêkevin".

Em tev di nava bêdengiyeke nediyarbûna pêşerojê de belav bûn. Ez çûm malê û li ber derî rûniştim. Min kîsikê xwe derxist û çixareyeke stûr pêça. Min pêxist û du-sê hilmên dirêj, heta kûrahiya kezeba xwe, li ser hev kişand, dûmana wê bi ser gund de rêkir.

Hîv hîn nû derketibû, lê gund wekî di bin çariyeke tenik de, bi hemû xemla xwe ji min ve diyar dikir. Bilindahiya spîndaran wekî minareyên camiyan di nava reşahiyê de direqisîn. Ezman tije stêrk bû û bayekî hênik xwe ji navsera çiyê bera nava gund dida. Xuşe xuşa robarê me wekî lorîka dayikê mirov dawetî xewê dikir. Mijankên çavê min diçûn ser hev û min dixwest wê kêlîkê ez li wir xwe dirêjkim û bi rojan û şevan xewkim. Lê ji xewê dijwartir, xeyalan ez dorpêç dikirim.





Zarokiya min, ciwaniya min hemû di ber çavên min re derbaz bûn. Di deh saliya min de, li ber pez birûsk li bavê min ketibû û ji wê rojê ve barê malê di stûyê min de mabû. Hîn şazdeh salî nebibûm, dayika min zor da min ku ez bizewicim. Digot: “Ez tenê nikarim li vi pezî binêrim. Ezê ji te re qîza Hecî bînim ku alîkariyê bide min. Qîzeke jîr e û pirr xurt e.”

Ez zarok bûm, lê hûn rewşa gundan dizanin. Zewac bê dilê min bû lê min pejirand û ez bêhtir ketim bin barê malê. Pişt re di hijdeh saliya xwe de ez dil ketim Xezalê. Min xwest pê re bizewicim. Lê nepejirand û got; ‘Ez nabim hewî’. Heta min ew qanî kir çar sal derbaz bûn. Pişt re ji bo neçim leşkeriyê ez sê salan ji malê dûr mam, Bi roj dihatim gund, bi şev dûr diketim. Baş e, dawiyê heval derketin, şer despê kir, êdî hukûmetê pirsyara qaçaxan nekir, ez jî vegeriyam malê. Ev tev wekî şerîdekê di ber çavên min re derbas bûn.

Bîranînên min tev di vî gûndî de bûn. Dengê lingên hevalan, dengê şeran. Dengê pezî... Dengê bahoz û bageran! Dengê şapê! Tije guhê min bûn. Li jora gund her sal şape dihat. Sala berf zêde dihat, em diçûn me gule berdidan û şape bê zirar dadixist xwarê. Carekê tê bîra min hindik mabû em tev di binê şapê de bimana. Lê dîsa jî ew roj xweş bûn.

Ez serê te neêşînim. Li gund jiyana me bi feqîrtî derbaz dibû, ev rastiyek bû, lê em ji rewşa xwe razî bûn. Em birçî nediman, tazî nediman û di nava merivên xwe de li gorî xwe dijiyan. Lê êdî berê me diket xerîbiyê. Ev ne tiştekî rehet bû. Kê dizanîbû wê çi bi serê me de bihata?

Dema agirê çixarê gîhişt ser goştê tiliya min, ez bi êşa şewatê ji xeyalên xwe veciniqîm. Min bang li Xezalê kir û pirsyar kir ka amade ne yan na. Xezala min xetariya rojê ji min baştir têgihiştibû. Got ku her tişt amade ye. Çend parçe hûr û mûrên me, du-sê betanî ji bo zarokan û xwarina du-sê rojan xistibû têrê. Ji xwe hêstireke me hebû. Ez çûm hundir, çend tiştên din ku pêdiviya me pê çêbibe û hinek qûtê din min anî, danî ser têrê. Me barê hêstirê şidand û tiştên din ên di malê de li cihê xwe hiştin. Xezalê got: “Ezê derî kilît bikim.”





Min got: “Ma ji çi re ye? Tu dibêjî qey emê careke din vegerin malê? Me biryar da, em diçin koçberiyê. Vê carê ne wekî carên din e ku em xwe li derdora gund veşêrin û dema dijmin çû, vegerin mala xwe. Vê carê dijmin ne ji bo lêdan û girtina me, ji bo kuştina me tê. Wê rêveçûna me bixe xetariyê yan na minê bi destê xwe agir berdaba malê. Dilê min dişewite, lê malê dinyê ji çi re ye. Bila mirov bi şerefa xwe bijî, bila her birçî û belengaz be.”

Xezalê mesele baştir têdigihişt. Qet dengê xwe nekir. Lê ez pê hisiyam ku rondik tije çavên wê bûne. Berê xwe ji min guhert. Zarokan jî qet deng nekir. Te digot qey hemû di zanebûna xetariya wê şevê de ne û berya min biryara xwe ya koçberiyê dane. Bi rastî bêdengiya wan ez aciz dikirim. Dilê min wiha tije keder bibû ku min dixwest hinek ji wana deng bikin, li dijî min derkevin, ez hêrsa xwe bi ser serê wana de vala bikim. Lê te digot qey tevan sûnd xwarine. Ne jin, ne zarok, ne hêstir, ne pez... Bi Xwedê deng ji yekî ji wana derneket. Baweriya te ji Xwedê hebe, çar mirîşk û dîkilekî me hebûn. Ez çûm koxê, min ew girtin û xistin torbeyekî. Te digot qey ew jî pê hisiyane û sûnd xwarine; yekî dengê xwe nekir. Ez wiha bi hêrs, keder û qehra xwe re rû bi rû mam.

Dawî em ji bo birêketinê amade bûn. Ez çûm hundir ku çirayê bitefînim. Baweriya te hebe heval, sifra me hîn li erdê bû û pariyê min hîn li kêleka kevçiyê min bû. Dema çav lê ketim, kenekî biçûk kete nava lêvên min. Dilê min wiha sivik bû û min ji xwe re got: "Ev jiyan vala ye, tu çima xwe hêrs dikî? Wê sibê dijmin were, her tiştî bişewitîne!"

Bi rastî kenê min bi rewşa me bû û min dizanîbû girî bê fêde ye. Min çira tefand û di derî re derketim. Xezalê dîsa bi ya xwe kir û derî kilît kir. Min vê carê dengê xwe nekir.

Dema em gîhiştin Ziyaretê, gundiyan dest bi rêveçûnê kiribûn jî. Tişta ez dizanim, sê-çar mal ne tê de, yên din em hemû derbasî Başûr bûn. Ew sê çar mal jî derbazî gundê kêleka me, cem mirovên xwe bibûn. Di şevekê de me gundek vala kir.

Ez serê te neêşinim, wê şevê tiştê bi serê me hat, bi serê ti kesan nehatiye. Pez li aliyekî, hêstir li aliyekî, zarok li ser milan, pîr û kal bi kotekî rê ve diçin, nexweş û seqet li halekî, xetareya mayinan, xetareya dijminê li ser sînor, asêbûna rêkê... Bi kinahî heta em gîhiştin Başûr me deh caran mirina xwe bi çavan dît. Lê dawî em bi selametî gîhiştin pişta tixûb û tu dibînî em li vir bi cih bûne.





Gerîlayên bi baldariyeke kûr li serpêhatiya penaberan guhdarî dikirin, wekî ew bi xwe jî bi gundiyan re koç bûne û rê meşiyane wiha keser vedidan û êşa wana parve dikirin.

Pîrekên ji sihbeta zilaman firsend didîtin, ji gerîlan pirsyara zarokên xwe, yan mirovên xwe yên tev li gerîla bûne dikirin.

- Ev çar sal in me xeberek ji Rêdûrê min negirtiye. Dema tev li hevalan bû, hîn zarok bû. Wê çaxê kî dihat ber wan, dibirin. Bi Xwedê ji dawa min kişandin û birin. Digotin Zagona Leşkerî ye. Ji wê rojê ve min ew nedîtiye. Par, min ji hevalekî pirs kir, digot li milê Zagrosê ye. Gelo hûn wî dinasin?

- Keça min jî ji bo perwerdê gotin derbasî wî milî bûye. Ma qey çend salan perwerdê dibînin? Ev du sal in min bihîstiye ku derbaz bûye, lê hîn min nebihîstiye vegeriyaye, yan na. Yeke porzer û hûrik e.

- Ji xwe hûn hemû wekî kurê min in, lê berya ez bimrama min carekê Mihemedê xwe bidîta bes bû. Par ji Zapê komek heval hatin gundê me. Sûretê wî bi xwe re anîbûn. Gotibû ezê derbasî Botanê bibim. Lê ez çiqasî pirsyariyê dikim, kes ji min re rastiyê nabêje. Bi Xwedêkin we ew li wan deran nedîtiye?

Gundiyan wêneyên zarokên xwe derdixistin û didan destê gerîlan û wêne di destê gerîlan de yek bi yek digeriyan....

Piştî xwarinê çay vexwarin. Ji bo ku gerîlan bikaribin bêhna xwe vedin, zilaman dev ji sihbetê berdan û derketin nava wargehê. Jinan xwestin cilên gerîlan bişon û ji bo serşuştina wan jî av germ kirin. Lê ji ber ku wê rêka xwe domandibana, gerîlan cil û serşuştin nepejirandin. Dîsa jî çend gerîlayên di rêvehatinê de ji xwêhdanê

behdilî bûn, serê xwe bi erebkî şuştin û kefiyên xwe dan şuştinê.

Piştî nîvro gerîlan xatirê xwe ji penaberan xwestin û berê xwe dan çiyayên Heftanînê. Dema di nava wargehê re meşiyan, zarok, zilam, keç, ciwan tev derketin ber konan û bi dilbijandineke germ, ew silav kirin, bi rê xistin. Çend qîz hatin pêşiya wan û goreyên neqişandî ku bi destê xwe rîsandibûn diyarî dan wan. Gerîlan pir pê kêfxweş bûn û qîzên penaber jî dilşad bûn.

Gerîlan dema konê dawî derbaz kirin, serê xwe zîvirandin û cara dawî li wargehê, li lehiya penaberan nêrîn. Her gerîlayekî/ê hesretek ket dilê wî/ê. Her gerîlayekî/ê bîranînek hat hişê wî/ê. Her gerîlayekî/ê bi hêviyekê çavên wî/ê şil bûn. Û her gerîlayekî/ê bi evîneke nîvçemayî pişta xwe da wargehê, berê xwe da çiyayên warê azadiyê. Destê xwe danîn ser klêşên xwe yên li milê wan û gavên xwe xurt kirin. Ji dilê wan straneke evîndarî dihat ser zimanê wan û bi dizî di nava lêvên wan re tev li bayê nerme dibû.

Qasî bêhnekê ji wargehê dûr ketin şûn re li kêleka rê, li milê rastê, rastî çend pêşmergeyan hatin. Pêşmergeyan konekî kevin di bin berekî mezin de vedabûn û li derdorê çend kozikên wekî çalan kolandibûn. Silav li pêşmergeyan kirin û ew derbas kirin. Dema gîhiştin astenga derbazkirina milê din ê çiyê, li rastî hevalên xwe yên li vê herêmê kar dikirin hatin. Silav li wana kirin û pirsyara





pêşmergeyan kirin ku bizanibin hêzên kê ne. Hevalên wan gotin ku ew ên Yekîtiya Niştimanên Kurdistanê ne û ji ber bi Partiya Demokratê Kurdistanê re di nava alozî û pevçûnê de ne, xwe li nêzikê gerîlan diparêzin. Pişt re ji hevalên xwe, di derbarê rêveçûna xwe de çend pirsyarên din kirin.

- Heftanîn dûr e ji vir?

- Na, ku hûn xweş bimeşin hîn nebûye êvar hûnê bigîhêjin wir.

- Li ser rêka we Geliyê Pisaxa heye. Hûn dikarin li wir hevalan bibînin.

- Di rêveçûna bi roj de ti astengî nîne, ne wiha?

- Na, lê dema we dengê helikopterê bihist, tev negerin bes e. Car caran tên. Wekî din ax tev di bin çavdêriya me de ye.

Hinek gerîla nasên hev derketin. Li ser lingan dest bi sihbetê kirin. Qasî vexwarina çixareyê bêhna xwe vedan şûn re, xatirê xwe xwestin û rêka xwe domandin. Êdî wargeh bi tevahî li pişta Çiyayê Kêre, li dawiya wan mabû. Qasî nîv saetekê meşiyan şûn re dengê firokeyan li ezman peyda bû. Di cih de xwe ji rê avêtin bin daran û berê xwe ber bi ezmên ve kirin.

Firokeyên Artêşa Tirk di ser çiyayê Kêre re çend caran wekî çembereke fireh çêbikin firiyan û pişt re yek pey yek xwe bera aliyê deştê dan. Dema di ser navsera çiyê re bi sernişûvî ji ber çavan

winda bûn, dengê teqîna bombeyên qazanan bilind bû. Pişt re dengekî din, yekî din û yekî din....

Gerîlan di cihê xwe de wekî kevirekî bêdeng û cemidî mabûn. Pirr baş dizanûbûn ku firokeyên artêşa Tirk xwe berdabûn cihê berya saetekê jê veqetiyabûn û bombe û fîşengên xwe bi ser wir de dibarandin.

Konên penaberan, zarokên porzer û çavşîn, dayikên xemgîn, bavên dil bi keder, qîzên dilovan, keçên ciwan ên ew pêşwazî kirine û diyarî dane wan, tev di ber çavên wana re derbaz bûn. Klêşên xwe ji milê xwe danîn. Xwe berdan erdê. Qutiyên xwe yên tûtinê derxistin û çixare pêçan. Bi hêrs û neçarî dûmana wê kişandin û berdan.

Di wê bêhnê de ji astenga gaza Kêre dengê fîşengên doçkayê bilind bû.

- Heval bera firokeyan didin.

- Xwezî yek-dudok bianîna xwarê ku hişê wana bihata serê wan.

- Xwedê bike tiştek bi penaberan neyê. Înşalah tedbîrên xwe sitendine!

- Ma wê çi tedbîran bistînin, qey te rewşa wan nedît? Ewqas zarok, zilam, jin tu di rojekê de nikarî ji wargehê dûr bixî. Ger firoke li wargehê bidin wê qetliam çêbibe.

- Tişta tê xuyakirin, bi wî milî ve lê didin.





Hîn çixareyên wan bi dawî nebibûn, dengê firokeyan hêdî bi hêdî dûr bû û dawî qut bû. Gerîlan li çavên hev nêrîn û şîroveyên ji tecrubên xwe kirin.

- Dengê şeş qazanan hat, deh deqan jî gule reşandin.

- Ez dibêjim qazan zêdetir bûn. Ev tam nîv saet e lê didin.

- Ger evqas dem li wargehê dabin, niha kit ji wana sax nemaye.

- Ez bawer nakim li wargehê dabin. Ewqasî eşkere xwinxwariyê nikarin bikin.

- De Xwedê bike li wargehê nedabin.

- Ka em rabin, dema em xwe bigihînin hevalan emê karibin saloxeke rast bigrin, ku tiştek hebe wê ew zanibin. Rûniştina me ya li vir bê fêde ye.

- Rast e, ka em biçin.

Careke din rabûn û berê xwe dan armanca xwe. Lê vê carê gavên wan qasî ji wargehê derketin ne şidyayî û ne bi lez bûn. Ji dilê wan jî stran nedihatin ser zimanê wan. Serê wan di ber wan de û mejiyê wan tevlihev bûn. Bi sedan tişt dihat hişê wan û hemû diqewitandin. Lê li şûna wan dîsa bi sedan guman êrîşî mejiyê wan dikirin.

Li wargeha penaberên Kurd panîk û tevliheviyeke mezin dihat jiyîn. Dema firokeyên artêşa Tirk li ezmên peyda bibûn, her yekî/ê xwe bi milekî ve avêtibûn. Hinek bi daristanê ve reviyabûn.

Hinekan xwe avêtibûn pişta keviran. Hinek daketibûn çalan. Hinekan di nava bestên biçûk de, kêlekên axê ji xwe re kiribûn sîper. Hinek li nava konan, li zarokên xwe digeriyan ku bi xwe re hilgirin, ji wargehê dûr bibin. Hinek şaş mabûn, nezanîbûn bi kîjan alî ve biçin. Hinekan qîr didan gel ku ji wargehê bi lez dûr bikevin. Hinekan du zarokên xwe hemêz kiribûn, du-sêk jî dabûn pêşya xwe, ber bi daristanê ve direviyan. Hinek jî, çi zarokên dihatin pêşya wana, berê wan didan cihekî ewle.

Pîrekan zerik û çaydanên xwe li ser êgir jibîr kiribûn. Hinekan jî av bi ser agirê xwe dakiribûn û dûmaneke spî jê bilind dibû. Hinek hîn li nava konan gêj gêj digeriyan. Hinekan zarokên xwe yên di pêçekê de, di hemêza xwe de vedişartin û çavên xwe li zarokên xwe yên din digerandin.

Ev rewş derbazî pez, mirîşk û dawaran jî bibû. Qîje qîja mirîşkan ji ber lingên mirovan vir de, wir de baz didan. Pezê derneketiye çêreya dûr û nezikî konan maye, bi mire mirekê xwe komî serhev dikirin. Dawarên girêdayî, bi lingên xwe ax dikolan û didan xwe ku werîsê xwe biqetînin.

Bi ser van hemûyan de dengê firokeyên guhan kerr dikin û dengê bombeyên mêjiyan gêj dikin, yek pey yek ji ezmên dadiketin erdê û dîsa bilindî jorê dibûn. Car caran jî dengê doçkayan tev li wana dibûn.



Ev tofan qasî nîv saetê berdewam kir; toz, dûman, barût û xwîn tev li hev bûn. Ezman tarî bû. Bêhneke dijwar girt ser wargehê û ber bi deşta Zaxo ve herikî.

Pişt re, dengê firokeyan hêdî bi hêdî dûr ket û dawî qut bû. Penaber, ji cihên xwe tê de veşartine yek bi yek, kom bi kom derketin û ber bi konên xwe ve baz dan. Di hundirê çend deqeyan de, hemû li wargehê, li ser rêka ziftê kom bibûn. Her yekî pirsyara yê din dikir. Herkesî li konê xwe û yên derdora xwe dinêrî. Herkes di nava gêjbûnekê û dilbixemiyekê de bû. Kes li cihê xwe ranediwestiya. Ji vî seriyê wargehê diçûn wî seriyê wargehê, li cihên bombeyên qazanan, li darbeyên fîşengan, li cenazeyan û li birîndaran digeriyan û her ku li qayî hev dihatin, bi bêhnçikyayî ji hev dipirsîn:

- Firokeyan li ku derê dane? We tiştek dît?

- Nizam, her der di nava toz û dûmanê de maye.

- Ji milê jorê pirr bêhna barûtê tê.

- Bêhna xwînê jî tê.

- Ez ji wî alî têm, kon li cihê xwe ne, tiştek bi wana ne hatiye.

- Li jêrê jî tiştek ne xuya ye!

- Ma evqas bombe li ku derê dan?

- Ez dibêjim li hevalan dan!

- Bawer nakim, ji ber ku hevalan bi doçkayê bera wan didan.

- Min bi çavên xwe dîtin ku bi ser wargehê ve xwe berdan û gurminiya bombeyan bilind bû.

- Min jî dît lê tiştek ne xuya ye.

Dawî têgîhiştin ku guleyek û bombeyek tenê jî li wargehê neketiye û kes birîndar nebûye, jiyana xwe jî ji dest nedaye. Wê demê nuh hişê wana hat serê wan. Li nava çavên hev nêrîn û li bersiva pirsên xwe geriyan. Gelo xewnek bû dîtibûn? Gelo xeyalek bû hatibû ber çavê wan?

Lê ne herdu jî bûn. Dengê firokeyan û bombeyan hîn di guhê wan de lê dida. Bi çavên xwe firoke dîtibûn û toz û dûmana bombeyan hîn wekî ewrekî nû belav dibe, li ser wargehê bû.

Hîn penaber wiha şaş û gêj di nava mereq, xem û pirsyaran de bûn, ji dûmayika wargehê, ji qûntara çiyê saloxa rast hat. Gel tev bi wî alî ve

çelqiya. Pêşmergeyek bêhnçikyayî, bi qîrdayîneke bilind hawar dixwest û ber bi wargehê ve baz dida. Li xelaseka wargehê pêşmerge û gel gîhiştin hev. Pêşmerge ewqasî tirsiyabû ku çavên wî li nava serê wî mezin vebibûn: Xwîn ji rûçikê wî kişiyabû û wekî şimayê zer bibû. Cilên wî peritî bûn û peşkên xwînê li ser xuya dikirin.

- Kuştin, hemû kuştin! Hawar! Werin Hawarê!

Penaber tev jin, zilam, ciwan, keç, zarok pêk re wekî lehiyekê ber bi warê pêşmergeyan ve herikîn. Dema gîhiştin bin berê mezin, bêhna barût û xwînê bi dijwarî li pozê wan da. Konê pêşmergeyan di bin keviran û axê de bi kotekî diyar dikir.

Hin zilamên penaber, bi derxistina cenazeyan mijûl bûn. Ên din jî hêdî bi hêdî berê xwe dan wargehê û paş de zîvirin. Bi rê de nerehetiya dilê xwe ji hev re digotin.

- Kî çi dibêje bila bêje, ev firoke ne ji bo pêşmergeyan hatibûn.

- Ji bo me hatibûn, lê li me nedan.

- Xwestin çavên me bitirsînin.

- Wê dîsa bên.

- Vê carê rasterast wê li me bidin!...

- ...



## *Şerma Mirovahiyê*

Firokeyên Artêşa Tirk li bilindahiya ezamanan wekî refeke teyrên laşxwar ji Rojava ber bi Rojhilat ve diçûn. Li wir demekê diman û pişt re kit kit, cot cot vedigeriyan. Di vegerê de barên wan sivik bûn û bilindtir difiriyan. Gelek caran helîkopterekê ji wana re rêberî dikir û berya firokeyan dihat û berya wan jî vedigeriya.

Şerê di navbera gerîlan û pêşmergeyan de, nû destpê kiribû. Ji her alî dengê top û hawinan, fîşeng û guleyan dihat. Pêşmergeyan hawêrdora Wargeha Etrûş girtibûn û bandora xwe bi dijwarî danîbûn ser rêkên çûn û hatina wargehê.

Germahiya Tebaxê her roja diçû dijwartir dibû û tirêjên rojê wekî bistikên di nava êgir de sorbûyî çavên mirovan disotin û nedihiştin ku kes ber bi jor ve binêre.



Ev heft-heşt meh bûn penaberên Kurd li vê wargehê bi cih bibûn. Ji ber tengasiya cih, beşeke wargehê jî li Geliyê Qiyametê bi cih bibû û her du wargeh ji hevûdin zêde ne dûr bûn; lê ji aliyê, pêşmergeyan ve rêk û gir hatin girtin û têkiliya di navbera herdu wargehan de hat qutkirin.

Di vê rewşê de nûnerên Netewên Yekbûyî yên xwedîkirin û ewlekariya penaberan hilgirtibûn ser xwe, hatin wargehê. Penaberên Kurd bi hewandin û alikarîdayîna gerîlan tawanbar kirin û di navbera wan de gengeşiyeke kin derbas bû.

- Me wargeh ji bo penaberan ava kiriye, lê em dibihîsin ku gerîlayên PKKê di nava we de bi cih bûne.

- Ev ne rast e, tiştekî wiha nîne. Kê gotibe bêbextî kiriye û ne rast gotiye.

- Dibêjin, gerîlayên birîndar di nava we de tên hewandin û dermankirin.

- Ev jî ne rast e. Birîndar hene lê yên me ne. Li ser tixûb, li derdorê, yan pêlî mayinan kirine, yan jî bi guleyên hawin û tankên artêşa Tirk birîndar bûne. Derveyî wana ti kes nîne.

- Baş e, qey we sazî ava nekirine? Ma ev jî ne rast e?

- Me sazî ava kirine, rast e. Lê ev ne tiştekî sûc e! Em ne pez in ku bê rêxistin li vir bijîn. Ji bo jiyana me sererast bibe sazî pêwîst in.

- Ev rêbazeke PKKê ye. Ew vî aqilî dide we. Pêwist e hûn ne li gorî wan, li gorî me tevbigerin. Ger hûn li gorî me tevnegerin, em nikarin alîkariya mirovahî bidin we.

- Em ne leyistok in kî bixwaze were bi me bileyize. Em li gorî ti kesan jî tevnagerin, em li gorî zanabûna xwe û kevneşopiyên xwe tevdigerin. Hûn Netewên Yekbûyî çima erkên xwe pêk naynin? Em ne ji bo xwarinê ji welatê xwe koç bûne. Em penaberên ramyarî ne. Ji ber ku me hez ji welatê xwe kiriye, ji bo rizgariya welatê xwe kar û xebat kiriye, ji bo ku me jiyaneke azad xwestiye, em ji hêla dijmin ve hatine koçberkirin. Divê hûn jî li gorî vê rastiyê nêzikî me bibin. Pêşmergeyan derdora me tev girtine. Rêk tev asteng kirine. Her roj pezê me direvînin, guleyan bi ser mirovên me de dibarînin. Mirovên me digrin û direvînin, pişt re yan dikujin an sêrê wan difroşin dewleta Tirk. Hûn çima li ser van ranawestin? Hûn çima li hemberî vana ewlekariya me nagrin? Ma karê we alikarîdayina wan û Tirkan e, yan parastin û xwedîkirina me ye?

- Em nikarin alikariyê bidin kesên terorîst û PKK jî li gorî N.Y rêxistineke terorîst e. Divê hûn bi tevahî têkiliya xwe ji gerîlan qut bikin û li gorî me tevbigerin. Ger hûn wiha nekin, ji îroj û pê de em nema alîkariyê didin we. Baş bifikirin û wiha biryara xwe bidin.





- Ev helwesteke ne mirovî ye. Em ne terorîst in û gerîla jî ne terorîst in; ji ber ku em wana dinasin, di destê me de mezin bûne. Ew kesên derdora me û rêkên me digrin û bi tank, top û firokeyan, bombe û guleyan bi ser me de dibarînin ew terorîst in. Biçin hesap ji wana pirskin. Ma ne hûn dibêjin: "Em Ewropî ne, em demokrat in!" Kesên demokrat penaberan, zarok, jin û kalan bi terorîstî tawanbar nakin. Ev ne helwesteke mirovî ye.

- Me gotina xwe got: An hûnê em çi dibêjin wiha tevbigerin, têkiliyên xwe bi tevahî ji gerîlan qut bikin, an jî ji îroj û pê de em alîkarîdayîna xwe ji ser her du wargehan qut dikin.

Piştî vê devjengiyê nûnerên Netewên Yekbûyî li tirempêlên xwe swar bûn û ji wargehê veqetiyan. Penaber bi serê xwe man. Kes zêde neaxivî. Herkes ber bi konê xwe ve belav bû û ket nava xem û pirsyaran. Gelo nûnerên Netewên Yekbûyî rast diaxivtin? Bi rastî wê qûtê wana qut bikarana? Evqas mirov, evqas zarok wê çawa bê xwarin bijiyana?

Di mejiyê her penaberekî de bi sedan pirsên wiha, serê xwe danîn ser balgîfan, çavê wan di nava reşahiyê de li rastiya wan vekirî, bi xem û xeyalan ponijîn. Dawî xeweke giran avêt ser çavên wan û heta bangdayîna dîkê sibehê bi ser xwe ve nehatin.

Rojên zor û zahmet careke din perdeya xwe girt ser wargehê. Penaberên Kurd ji her alî ve hatibûn dorpêçkirin. Peşmergeyên

PDKê hivdeh qereqol li derdora wargehan ava kiribûn û bi vî awahî wargeh kiribûn wekî zindanên servekirî.

Çend rojên despêkê penaberan qutê di male de hebû xwarin. Lê roj bi roj, qutê wan yek bi yek xelas dibû. Jinên penaber her êvar dema serê xwe datanîn ser balgîfan, rewşa xwe bi zilamên xwe re şîrove dikirin.

- Piştî birincê, binê tenekeya rûn jî îroj xuya bû. Evarî min kevçiyekî rûn ji cem cîranên me anî, lê yê wan jî sibe-duzbe wê xelas be. Wê rewşa me çawa be?

- Nizanim wê çawa be, lê elbet wê Xwedê deriyekî xêrê veke. Wiha biçe pîr, kal û zarok wê tev ji dest biçin.

- Kurê Fatimê yê biçûk îroj birin ser textor, lê ji ber tinebûna derman tiştek pê nekirin. Textor gotibû ji kêmxwarinê xwîna wî zeyif ketiye, serûm pêwîst e, lê nîne.

- Ger wiha bidome, dermanên hene jî wê xelas bin.

- Nan nîne, ma emê çi bikin ji dermanan? Derman li zikê birçî nayê. Gelek mal ev du-sê roj in çavên wana ji nan qut bûne.

- Dîsa baş e, gel alîkarî dide hev. Ê heye, dide yê tine.

- Wê ew jî biqede. Ne avzê ye ku her tije bibe. Ku nekeve şûna wê elbet wê beqede.

- Ma emê ji ku bînin, bixin şûna wê? Tu ji wargehê gava xwe diavêjî, pêşmerge wekî gurên har tên pêşya te. Îşê me zor e.





Kêm zêde di hemû konan de mijarên wiha dibûn mijara axavtinan û bi xemgîniya vê diketin xew. Lê car caran malên heta sibehê xew nediket çavên wana jî hebûn. An li ser serê zarokekî, yan li ser serê kalekî malbat tev kom dibû û ji Xwedê re berger dikirin ku ji wana re bibexşîne. Lê gelek caran dengê wana nedigîhişt Xwedê û Xweda jî ew nedibexşandin. Dema dibû sibeh xebera reş li wargehê belav dibû. Çend zilaman tevr û bêr digirtin destê xwe û diketin ser rêka goristanê. Tirbeke din lê zêde dikirin û dihizirîn ku wê dor bê kê. Pişt re penaber tev kom bi kom diçûn taziyê. Li wir bergera xwe dixwendin, sersaxî ji yên mayî re dixwestin û radibûn ser xwe. Malbata taziye lê ye pir dixwest ku kevneşopiya xwe bişopîne; çayekê yan çixareyekê pêşkêşî yên hatine serdanê bike. Lê ji destê tinebûnê, êdî nedayîna tiştekî ji adetê dihat dîtin; ji ber ku herkesî rewşa yê din baş dizanîbû û rewşa tevan kêm zêde wekî hev bûn.

- Çixareya te nîne?

Zilamekî çel-pencî salî pişta xwe dabû latekê û li ber siya latê temaşeyî rêka di nava wargehê re derbaz dibû dikir. Ji zilamekî din ê ji konê xwe derdiket der ve dipirsî.

Zilam destê xwe avêt bêrîka xwe û ber bi wî ve meşiya. Dema nêzik bû silav lê kir û qutiya xwe ya tûtinê derxist, devê wê vekir û got:

- Du-sê çixare mane lê pel nînin. Ma li cem te pel hene?

- Rast e, kêmek pel hene, lê ev du roj in piça tûtinê bi min re nemaye.

- Ger wiha bidome, emê bi giyayên van çolan bikevin. Tûtin jî, pel jî êdî ava xwe dikêşîne. Ez doh çûm, min qutiyeke tûtin ji cem Mamê Silo anî. Tu dizanî ew bê tûtin debar nake. Lê çend rojên din wê ya wî jî xelas bibe. Wê çaxê wê dîn û har bibe û bi van çolan bikeve.

Zilamê din, bê deng çixareyek pêça, xist nava lêvên xwe, pêxist û dûmaneke girs kişand kûrahiya kezeba xwe. Pişt re yê din jî çixareyek pêça û dest bi sihebeta li ser rewşa wargehê kirin.

- Heval dibêjin ku pêşmergeyan doh êrîş birine ser wargeha din. Pêwist e mirov vê helwestê şermezar bike yan na wê pirr aloziyan derxin.

- Tê şermezariyê li hemberî kê bikî?

- Li hêmberî pêşmergeyan û helwesta wan!

- Li mala te be, tu dibêjî qey pêşmerge dewlet in. Ma ew çi ji şermezariyê têdigihêjin?

- Wele nizanim, heval dibêjin divê em bimeşin. Bi rastî hinek dibêjin ku hacet nîne mirov wana, cidî bigre, lê wekî din jî ku mirov acizbûna xwe diyar neke, wê bêhtir har bibin û xisarê bidin me.

- Wê kengî bimeşin?

- Sibê





- Ti daxuyanî nekirin, çima?

-Wê êvarî li ber têlevizyonê bikin.

Wargehên penaberên Kurd yek bi navê 'Etrûş-A', yek jî bi navê 'Etrûş-B' dihat binavkirin. Li ser herdu wargehan jî ambargoya qût (erzak) hebû. Her du wargeh jî ji hêla pêşmergeyan ve dihatin êşandin. Di meha Îlonê de êrîşeke pêşmergeyan li ser wargeha Etruş-A çêbû. Êdî pêşmergeyan rasterast êrîşî ser wargehan dikirin. Ji bo şermezarkirina vê êrîşê penaberên li Etrûş-B biryar sitendin ku meşeke protestoyî lidar bixin.

Serê sibehê penaberên Kurd ji konên xwe derketin û li ser rêka ji wargehê derdikeve kom bûn. Ji bo meşê çiqasî bi biryarbûn jî, di dilê wan de waswasek hebû. Baweriya wan qet li pêşmergeyan nedihat. Lê carekê biryar girtibûn û wê bimeşiyana.

Jinên penaber li pêşya girseya meşê cih girtin. Jin, zarok, zilam, keç, ciwan… herkes amade bûn. Digotin ku jin li pêşyê bin, di dilê pêşmergeyan de kirina xerabiyekê hebe jî wê nikaribin bikin; ji ber ku jin nîşana aştiyê ne wê kes newêre guleyan bi ser jinan de bibarîne.

Keçeke Kurd bi navê Jiyan serkêşiya meşê dikir. Wê jî nexwestibû li hemberî pêşmergeyan bimeşin; ji ber ku meş wê bihata wateya cidîgirtina wana. Digot:

- Ev ne mirovên wiha ne ku ji rêbazên demokratîkî û aştiyane

têbigihêjin. Ev tenê ji zorê û ji tirsê têdigihêjin, ji bo vê yekê heceta meşê nîne.

Lê hevalên wê cuda difikirîn û ew bi sabotekirina biryara meşê û tirsa ji wê tawanbar kirin. Ev yek jî pirr li zora wê çû. Derbasî pêşiya meşvanan bû û bi dengekî bilind dest bi qêrîna dirûşmeyan kir.

Meşvan di nava konan re, ber bi derketina wargehê ve meşiyan. Qêrîneke geş ji penaberan bilind bibû. Hêrs û qehra xwe bi dirûşmeyan dianîn ser ziman. Li deriyê derketina wargehê pêşmerge rêz bibûn û çekên wan di destê wana de amade bûn.

Meşvanan qet nedihizirîn ku wê pêşmerge çekan bikar bînin. Lê di derketina derî re hîn çend gav neavêtibûn, pêşmergeyan berê çekên xwe dan ser penaberan. Penaberên Kurd bi devê çekên pêşmergeyan re rû bi rû man. Divîbû yan teslîm bibana û paş de bizîvirîna, yan jî rêka xwe bidomandana û biryarîbûna xwe şanî bidana.

Jiyanê destê xwe bilind kir û bi qîrdayîna dirûşmeyan, berê xwe da benda pêşmergeyan. Meşvan tev bi pey re herikîn. Çend gavên din êdî ew û devê çekan sîng bi sîng gîhiştibûn hev.

Di wê bêhnê de tiliyên pêşmergeyan çûn ser lingên çekan û ji lûleyên sar pêtên agir derketin der. Tiştê ti kesî bawer nedikir, li devê deriyê wargehê pêk hatibû. Pêşmergeyan gule barandibûn ser keç û jinên bê çek!





Çavên penaberan li nava serê wana fireh vebûn. Her kes di cihê xwe de şaş mabû. Jiyan li ser rêkê dirêj bibû û cilên wê di nava xwinê de sor bibûn. Bi barîna guleyan çend keç û jinan qîr dan, hinekan dirûşme avêtin, hinekan bang kirin, hinek jî bi ser mirovên ketine erdê de çûn û li ber serê wan rûniştin, ew hemêz kirin ku ji guleyên din biparêzin.

...

- Pêwîst e wargeha 'Etruş-A' were ser wargeha 'Etrûş-B'. Wê demê emê careke din xwedî li we derkevin û qûtê we bînin, alîkariya mirovahî bidin we.

Nûnerên N.Y. yên piştî bûyera meşa şermezarkirinê hatibûn wargehê, wiha digotin. Sedema nedayîna alîkariyê niha jî wiha diyar dikirin. Piştî kuştin û birîndarkirina keç û jinan êdî nediwêrîyan qala terorîstiya penaberan bikin. Dixwestin rewş nerm bibe, lê dîsa ya xwe bi ser a penaberan bixin. Penaberan jî bûyerên bi serê wana de qewimîne yek bi yek vegotin û sûcê wan û sûcê Pêşmergeyan yek bi yek li ruyê wana xistin. Li ser vê vekê dîsa li hev nekirin û ambargoya li ser wargehan berdewam kir.

Cardin, pêşmergeyan bi şev, xwe nêzîkî wargehê dikirin û gule di ser konan re dibarandin. Zarok, zilam an jinên ku ji wargehê bi sedema çêrandina pez, an komkirina giya derdiketin, digirtin, lêdan

li wana dikirin û ger hebaya pereyên wan ji wana distendin, pezê wan ji xwe re dibirin. Roj ne dima ku bûyerek ji vana nediqewimî.

Rewş wiha giran bibû ku penaber pêwîst mabûn ji xwe re cihên binerd bikolin û dema gule bi ser wan de dihatin barandin, xwe û zarokên xwe di van cihan de diparastin.

Piştî veşartina cenazeya keça Kurd Jiyan, bi hefteyekê, li çiyayê derdora wargehê, şerekî giran, di navbera gerîlan û pêşmergeyan de derket. Pêşmergeyan bi hezaran hêza xwe herikandin wê derê. Heta nêzî wargehê hatin. Çend şivanên ku pezê wan girtin, tev li pez bi xwe re birin.

- Yadê, ez birçî me.

Zarokekî pênc-şeş salî êdi nedikarîbû li ber xwe bidaya. Bi wê zarokiya xwe rewşa ku tê de ne, têgîhiştibû û bi rojan dengê xwe dernexistibû. Lê îroj dema qeteke nan û seriyekî penêr di destê zarokekî cînarê xwe de dîtibû, birçîbûnê dabû nava dilê wî û ji dayika xwe nan dixwest. Ev demeke dirêj bû nan ji mala wana qut bibû. Car caran hinek sawar an nîskek dihat kelandin. Car caran, ji cem cînaran du-sê nan peyde dibûn, lê ev sê roj in êdî ew jî peyde nebibûn. Dayikê nizanîbû serî li ku derê bide, ji ber dizanîbû rewşa herkesî wekî ya wana ye.



- Baş e keça min, niha ezê te têr bikim.

Dayikê ev sê roj in dihizirî lê nekarîbû biryar bidaya. Mirîşkeke wê mabû û her roj an du rojan carekê hêkek dikir. Ev hêk dikeland, nêvî dida keça xwe û nêvî jî dida kurê xwe yê jê biçûktir. Dema qûtê wan ji binî ve xelas bû fikirîbû mirişka xwe serjêke û du-sê rojan pê bidebire. Lê ji ber hêkan nedigîhişt biryarê. Dema keça wê birçîbûna xwe eşkere diyar kir, êdî waswasa dilê wê derbas bû. Bi baskên mirîşka xwe girt û bir cem zilamê cînarê xwe.

Li malên din jî birçîbûn û bi birçîbûnê re nexweşiyan bandora xwe êdî heşkere kiribû. Zarokên jiyana xwe ji dest didan rehet dibûn, lê yên li ber xwe didan di nava êşan de digiriyan. Goştê di navbera çerm û hestiyên wan de dihiliya û hestiyên wan zor didan çermê wan ku derbikevin derve.

Pîr û kal êdî hêviya xwe ji vegera welêt qut kiribûn û li ser derbaskirina vê xelayê difikirîn. Zêde ji konan dernediketin. Lê ji birçîbûnê zêdetir tinebûna tûtinê ew diêşandin. Car caran kalên hîn kabên wan erdê digrin, gopalê xwe digirtin destê xwe û derdiketin derdora wargehê. Li nava şînatiyan digeriyan ku giyayekî bêhna tûtinê bide bibînin. Dema didîtin, dihatin konên xwe, ji defterên nebiyên xwe pel diqetandin û ev giyayê wekî pûş li navê dipêçan û dikêşandin. Kurmê çixarê bi vî awahî didan rawestandin.

- Xwişka Hacer ger hebe tu dikarî kêmek xwê bidî min?

- Te got xwê!? Bi Xwedê bi zêran be jî xwê peyde nabe. Ev çend roj in xwêya me nemaye. Ji xwe qût jî nîne, heta em pirsyara xwê bikin.

- Kavirekî me hebû, îroj ji mecbûrî me serjê kir. Ma em çawa bikin, zarok tev ji birçiyan re hiliyan. Lê goşt jî bê xwê nabe.

- Dibe ku li mala Fatimê hebe, wê rojê min sê-çar nan ji mala wan anî, nanê wan bi xwê bû. Tu dixwazî ji wir pirsyar bike.

- Wele kabên min nagrin ez heta wir biçim. Lê mecbûr im, goşt bê xwê nabe. De bi xatirê te.

- Ger te peyde kir hinekî ji bo min jî bîne.

-Baş e. Evarî jî wer cem me ji zarokan re hinek goşt bibe.

- Bila ezê bêm, wele me tiştek nîne bixwin. Em jî ji vir û wir hinekî didebirin. Ka bê Xwedê çi derî li pêşiya me veke!

- Te bihîst? Digotin N. Y. erzaq anîne, lê zilaman gotine, ‘em nagrin’ û cardin vegerandine!

- Belê kurê min jî wê çaxê li wir bû, hat ji min re got. Erzaq ji me re anîne, ji wargeha din re nebirine. Dixwazin bêtifaqiyê bixin navbera me ku wê wargeha din jî bînin ser vê.

- De bila bînin ma çi heye! Ha li wir, ha li vir; rewşa me her ev e. Bila ew jî bên vir, belkî wê demê vê ambargoyê ji ser me rakin. Yan na wê zarok tev bimrin.

- Ma zarok tenê? Kal û pîr jî wê bimrin. Pişt re wê dor bê ciwanan jî.

- Kî dimre ji xwe re ji vê dinyê xelas dibe. Ma ev jî hal e em tê de ne?

- ...



## *Xwelî Li Serê Min Be!*

- Derkevin, derkevin, lezkin!
- Pêşî bigrin, pêşî lê bigrin!
- Av, av, bila pîrek avê bikişînin!
- Axê biavêjin ser, axê biavêjin ser!.

Bayekî bi lez û bez ji seriyekî wargehê diket, di seriyê din re derdiket û pêtên agir, wekî keziyên porê berbabûyî, bi her milî ve, li ber xwe dibir. Agir ji konekî despê kiribû. Cînar û yên derdorê nizanîbûn çawa despê kiribû, lê bi dîtina pêtên êgir tevan ji cihê xwe, dest bi bazdanê kiribûn û di hawarê de hatibûn.

Jin û zarokên mala agir pê ketî, derketibûn der ve. Him tirsiyabûn, him şaş mabûn. Jina malê bi vî alî û wî alî de baz dida û hawar dikir ku cînar êgir bitefînin; lê agir wekî ketibe ser neftê bi lez dimeşiya û pêtên xwe dirêj û dijwar dikir ku kesî nedikarîbû xwe nêzîkê bikraya.



Yên dihatin, despêkê pirsyar dikirin ku agir çawa derketiye û pişt re ew jî tev li refa penaberên vir de, wir de bazdidin dibûn.

- Agir çawa derket?

- Wele nizanim, dibêjin ji tabaxê pêketiye.

- Ev tabax wê mala me tevan xera bikin.

- Ma em çi bikin tiştekî din nîne. Ne li gund e ku tu sobê deynî yan di tifikê de daran bişewitînî.

- Ma kor in ku roj nîvro agir bera tabaxê didin. Te dît agir pê ket, galoneke av berde ser, wê ji ber xwe ve bitemire.

- Belkî wê gavê av tine be!

- Ger av tine be çima tabaxê pê dixe? Na Wele heye. Ji xwe guh nadinê.

- Ma kî dizane wê agir gurr bibe. Ev tabax wiha ne. Hema te dît agirê wê geş bû.

- Bavo çadir ne wekî xaniyan e. Piçek agir digîhê miratê wekî barûtê lê diçe.

- Hemû zift e. Çadir şima kirine. Ji bo baranê derbas neke, şima dikin. Tu dizanî şima jî wekî neftê ye.

- Agir belav dibe! Şûna hûn biaxivin dest biavêjin alikariyê. Zû, lezkin!

Agir ji çadirekê avêt yeke din û pişt re xwe avêt a kêleka wê. Çadira agir diket ser êdî ne mumkin bû bihata vemirandin. Bayê xurt di cih de pêt gurr dikirin û li hevdu badidan. Heta te çavê xwe digirt û vedikir, nîvê çadirê dibû pîşo. Qîrên zilam, zarok, jin, ciwan û keçan tevlihev dibûn. Ji milekî ve mire mira pez, ji milekî ve qîje qîja mirîşkan û ji milekî ve guvîniya bayê dijwar wekî xume xuma çemekî, ji wargehê bilind dibû.

Bi sedan jin û zilam rêz bibûn, bi galon û metereyan av dikişandin. Car caran didan dest hev, car caran bi xwe dianîn. Lê hîn ava wana ne gîhiştiye çadirê, agir xwe diavêt ser yeke din û rêza avkêşan berê xwe dida wir.

...Gummm!...

- Ev çi bû?

- Tiştek teqiya.

- Qey bombe avêtin!

- Wê kî vê ro nîvro bombê biavêje? Ez dibêjim warîla neftê ye!

- Rast e, rast e. Wekî dengê wê bû.

- Te nedît çawa agir jê bilind bû?

- Ka em biçin binêrin çi bûye?

Pêtên ji warîla neftê bilind bibûn wekî teyrên sor her yek bi ser konekî ve xwe bera xwarê dan. Ji cihê agir lê despê kir bi dehan metre dûr, agirekî din despê kir. Nişteciyan bi qêrîn û hawar xwe ji konan avêtin der ve. Şaşbûna wan ji çavên wan dihat xuyakirin.





Ev çi agir bû wekî baranê bi ser wan de bariya bû.

- Zaroka min, zaroka min di hûndir de ma!

Dema pêta agir ji ezman bi ser çadirê de ketibû, ji lez û beza şaşmayinê zaroka şîr didayê di hemêza xwe de bi xwe re derxistibû der ve. Hîn pêsêra wê ya pê şir dida li der ve bû. Lê çawa gava xwe avêtibû der ve keça wê ya biçûk a di xew de hatibû bîra wê û dest bi hawarê kiribû. Ji ber ku ji jorê pêtên êgir dibariyan hundirê çadirê û ber bi derî ve baskên xwe dirêj dikirin, nedikarîbû xwe biavêta hundir û li ber derî weke gêjan diçû û dihat.

Keçeke gîhiştî bi lez hat cem û li dawiya çadirê bi milê ku ba jê tê ve zîvirî. Ba da paş xwe, keviya çadirê bilind kir û bi çavsorî xwe avêt hundirê çadirê. Di bêhneke kin de derket der ve. Keçikeke por kej a du-sê salî di hemêza wê de bû û wekî jiyana xwe ji dest dabû hîn di xew de bû. Lê dema da dest diya wê keçik hişyar bû û çavên wê li pêtên agirên direqisîn ketin. Dûmaneke dijwar êrîşî ser ruyê wê kir û di çav û bêvila wê re tije hundir bû. Zarokê dest bi girî kir. Dayika wê ji milekî ve hewl da ku wê haş bike, ji milekî ve spaziyên xwe şanî keça gîhiştî kir.

- Xwedê ji te razî be, Xwedê çi miradê te hebe bide. Ne ji te ba, wê keça min di nava êgir de bibaya xwelî. Ez nizanim çi bi serê me hat! Hema min dît li jora çadirê wekî tu çirayekê pêxî û wekî tu êgir berdî neftê di cih de, dor li xwe fireh kir. Ji tirsan re dilê min hat

ber devê min. Ez nizanim çawa rabûme ser xwe jî. Hema min dît ez li der ve me û pêtên êgir wekî sayên har bi pey min de êrîş dikin.

- Çi nabe, derbas bû. Bêhna xwe rehet bike. Ev ba nahêle agir bitemire. Tu xwe bide cihekî û bêhna xwe vede. Ezê biçim nav konên din, binêrim ka rewş çawa ye. Ku wiha bidome, yek çadir nafilite. Aqilê kesî naşixule. Her yekî konê xwe tije neft kiriye. Kesî hesabê rojeke wiha nekiriye.

Ne ba, ne agir nizanîbûn rawestin. Herdu wekî di navbera hev de yekîtiyekê ava bikin û sûnd bixwin ku penaberan bê cih û war bihêlin, bi hemû dijwariya xwe êrîşî ser konan dikirin û her tişt didan ber xwe. Agir wekî sayekî har, wekî gurekî birçî, wekî hûtekî xurek xwe di jorê re bera hundirê çadiran dida, dibû bi dehan, bi sedan dêvbiçûkên birçî û çi di hundirê çadirê de hebe diavêt devên xwe. Balgîf, nivîn, lihêf, cilên zarokan, betanî, kincên zilaman, ên pîrekan,





pêlavên lastîk, lalîkên xwarinê, buxçikên bûkan, sindoqên bûkaniyê, pereyên di quncikan, yan di bêrîkan de, gerdenzêrên di nava heft paçan de hatine veşartin û beştên çadiran... Kes nedigîha yekî ji vana rizgar bike. Hemû li ber çavên wan heta qurmiçîn û vekirina çav dibûn xwelî. Agir wiha har bibû û wiha êrîş dikir ku kî nêzikê bibaya wekî şûrên tûj, wekî bistikên sorkirî lêv û çavên wan dişewitand, porên wan dikizirand. Bêhna neftê, bêhna pîşo, bêhna pirça pez tevlihev, bi dûmaneke reş re bilind dibû û bi ber ba diket, li nava wargehê li hev dizîvirî.

- Ji wargeha din hatine hawarê!.

- Ma dikarin çi bikin, em li vir destgirêdayî ne, wê ew bikaribin çi bikin?

- Divê em çareyekê bibînin an na yek çadir namîne û emê perîşan bibin.

- Em biçin, li pêşiya êgir xwe rêz bikin. Tevr û bêr û avê bigrin destên xwe û li pêşiyê rawestin. Dema gîhişt me, em lê bidin. Dibe ku wê demê em wê rawestînin.

- Ka em biçin.

Zilaman, ciwanan, jinan, keçan tev her yekî çi bi dest ket, di navbera çadirên bûne pîşoyê reş re derbaz bûn, di nava pêtên êgir re pişta xwe dan bayê dijwar û baz dan. Çadirên hîn dişewitîn derbaz kirin û di navbera êgir û çadirên saxlem de dîwarekî yek rêz ji bedenên mirovan çêkirin. Pêtên êgir wekî zimanê maran ber bi wan ve dirêj dibûn û vedikişiyan, dirêj dibûn û vedikişiyan.

Her ku diçû marê har nêziktir dibû. Zimanê wî dirêjtir dibû û bêhna

xwe ya germ wekî bayekî ji hêtûnê derketibe diavêt ser ruyê penaberan. Wê çaxê bêrên di destên xwe de radikirin jorê û li zimanê wê didan ku paş de bikişîne. Lê agir ji wan hişyartir û bileztir tevdigeriya. Pêta xwe ya wekî zimanê mar bi jêr de dadixist, bi jor de bilind dikir, bi kêlekê de ba dida û dîsa rêyeke êrîşê ji xwe re didît.

Devê birçî rêza çadirên nêzikî rêza penaberan jî yek bi yek xwar; her ku pêt û baskên xwe xwest dirêjî çadirên din bike, zilam û ciwanan bi tevr û bêran lê dan û ew çavtirsandî kirin, westandin û bê taqat hiştin. Jin û keçan ax, xwelî û av avêtin ser çavên wê, ew kore û gêj kirin. Agir lawaz ket û ber bi tarîbûnekê ve çilmisî, lê hîn tam ruh û can nedabû. Hîn li ber xwe dida.

- Êdi wê raweste!

- Înşalah raweste. Ger ba hinekî rawestiyaya wê ew jî rawestiyaba.

- Ba ranaweste.

- Lê bawer nakim bikaribe me derbaz bike. Divê yan me tevan bide ber xwe û bişewitîne, yan jî em nahêlin me derbaz bike.

- Em nahêlin me bişewitîne, ma destên me girêdayî ne?!

- Agir bê dîn û bê îman e. Ku bêje “Ez hatim”, tiştek nikare xwe li ber bigre.

- Xwedê çi nivîsî be, wê ew bibe.

- Xwedê negotiye biçe konên penaberan talan bike! Bila biçe mala dijminan, mala dewlemendan bişewitîne.

Agire ber bi temirandinê ve diçû, wekî gotinên wan dibihîst, pêta xwe ya dawî xist ser galoneke neftê. Galon di cih de hiliya û neft jê bi pêtên sor herikî ber bir warîlê gazê ve. Neft li derdora





warîlê gol bû û pêtên har li derdorê zîvirîn.

- Xwe paş de bidin, xwe paş de bidin!

- Kuro werin em bitefînin an na wê mala me xera bike!

- Xwe nêzîkê nekin, hûnê bişewitin.

- Wê biteqe, parçe tev li we kevin, xwe paş de bidin.

Gumîniyeke din bi ser wargehê de bilind bû. Parçeyên hesinê sorbûyî wekî teyrên tu ji qefesê berdî, ber bi ezman ve bilind bûn. Komên nefta pêtgirtî bi derdorê ve pijiqîn. Hin penaberan xwe avêtin erdê. Hin penaberan vir de wir de baz dan. Hin penaberan agirê ketiye ser şalên wan bi lez temirandin. Hûtê birîndar, vê carê jî ji bo birînên xwe sax bike, xwe bera hundirê konan dabû û dest bi xwarinê kiribû. Çi dihat ber wî diavêt devê xwe û li dawiya xwe pîşo, xwelî û bêhneke nexweş dihişt, derbasî konekî din dibû.

- Bazdin, bazdin em pêşî lê bigrin.

- Tê pêşî li ku bigrî, li ku negrî! Ne ciheke û ne deh cih in.

- Avê bînin! Bêran bînin!

- Zarokan dûrxin! Zarokan dûrxin!.

- Pez şewitî! Pez şewitî!

- Dikan çû! Dikan çû! Mala min xera bû!

Vê carê seriyekî êgir gîhiştibû dikaneke wargehê û bi kêfxweşî li nava sindoqên çerez, şekir û şêraniyan digeriya. Gore, şeh, pênûs, gulikên porê keçan, gokên leyistokê, desmalkên xortan diavêt devê xwe; hinek dicût, hinek dihiland, hinek dikir xwelî. Dawî sindoqa pereyan daqurtand û berê xwe da konekî din.

- Vî agirî tiştek bi me ve nehişt!

- Pêşiya me jî serma ye emê çi bikin? Ne çadir man, ne nivîn man, ne kincil man! Ev çi bele bû yarebî te bi serê me de anî?

- Halê me ne besî me bû, ev ji me kêm bû.

- Xwezî min zanîba ev agir çawa derket û bes. Yekî neyarê xwe be jî, nikare wiha wargehekê bişewitîne.

Warîleke din di wê bêhnê de teqiya û pêtên êgir êdî bi dilê xwe li nava konan belav bûn. Bayê dijwar rawestin çi bû nizanîbû. Her ku agir dida ber xwe, germtir û xurtir dibû. Êdî penaberên Kurd tiştekî bikin nemabû. Agir berfireh û belav bibû. Êdî mabû li ser wicdanê bê û êgir. Ka wê li ku derê zikê wan û çavê wan têr bibaya? Ka bê li ku derê wê ji hal biketana û biwestiyana? Ka bê li ku derê wê dilê wan bi halê penaberan bişewitîna û dest ji talankirinê berdana? Ka bê li ku derê wê wargeh biterikandina?

Zilam, jin, keç, ciwan û zarok di nava neçariyekê de kom bi kom rawestiyabûn û temaşeyî êrîşa agirê xurek dikirin. Xemgînî û westandineke kûr ji çavên wan dibariya ku li hemberî neyaran jî wiha stûxwar nebibûn, wiha neçar nemabûn. Li hemberî dijmin





serî hil dabûn, li ber xwe dabûn û koç bibûn, lê teslîm nebibûn. Bes li hemberî êgir dikaribûn çi bikrana?

Malên agir pê neketibûn, hûr û mûrên xwe derxistibûn derveyî çadiran, li ser hev kom kiribûn û betaniyek avêtibûn ser. Lê ev jî ji birçîbûna agir re nebibû çareserî. Agir li derveyî çadiran jî pêtên xwe dibarandin ser wan hûr û mûran û ew jî dadiqurtandin. Dawî penaberan dev ji vê jî berdan. Zarokên xwe girtin ber dawa xwe û temaşeyî qedera xwe kirin. Bi reqsa pêtên êgir re jiyana wan hat ber çavên wan. Qey di vê cîhanê de ferman û trajedî tev para Kurdan bûn? Gelo Kurdan jî wê rojeke xêr û xweşî nedîtibana? Gelo xwestina jiyaneke azad sûc bû? Gelo guneh bû? Qey ev tev bihabûna azadiyê bûn? Wê hîn heta kengî ev êş bikişandana?

- Xwedayo, tu çima rewşa me Kurdan nabînî? Ma em ketin nava ziyanên te? Ma me mêj û rojî ji bo te negirt? Ma me rojê pênc caran ji te re berger nekir? Ma em nehatin secdeyê? Ma me çi guneh li hemberî te kir ku te ev ferman bi ser me de rakir? Qey hêza te digîhê me feqîran tenê? Ma tu çima bi ser zaliman de agirê xwe nabarînî? Ma Tirkan gundên me şewitandin, ne bes bû? Malên me şewitandin, ne bes bû? Daristanên me kirin xwelî, ne bes bû? Em ji cih û warên me koç kirin, ne bes bû? Top û gule û hawin bi ser me de barandin, ne bes bû? Mayinan em qir kirin, ne bes bû? Ma çavên te vana nabînin, Xwedayo!? Ma heta kengî emê vê rezaletê bikişînin? Kengî emê jî wekî mirovan

rojeke xweşî bibînin, yarebî!?

- Yadê agir bi konê me jî ket!

- Bila bikeve keça min, ma em dikarin çi bikin?

- Yadê êdi emê li ku derê rakevin?

- Ez nizam keça min, wê heval çarekê bibînin. Ka bila ev tofan derbas bibe!

- Cilên me jî tev şewitîn.

-Ez dizanim keça min. Ne yên me tenê şewitîn, tu nabînî, nivê wargehê bû xwelî.

- Yadê çima agir derket?

-...

Derketina agir incax piştî rawestina wî zelal û eşkere bû. Agir heta



besta di nava wargehê re derbaz dibû, bi dilê xwe meşiya. Di bestê de çadir tinebûn û di navbera çadirên vî milê bestê û wî milê bestê de penaberan dîwarekî stûr ji bedenên xwe çêkiribûn. Bi tevr û bêran, bi ax û avê, bi sîng û bedenên xwe li pêşiya êgir rawestiyan û nehiştin ku bestê derbaz bike. Agir her xwest ku pêtên xwe dirêj bike, penaberan lê dan heta ku ew westandin, bê hal hiştin û bê nefes kirin. Piştî binketina êgir, ba jî westiya û leza xwe kêm kir, hêdî bi hêdî xwe kişand nava lat û zinarên çiyê û li wê derê bêhna xwe veda.


Zilam, jin û zarok li derdora mala agir jê despêkiriye kom bibûn û her kesî pirsyariya sedema derkêtina êgir dikir.

Jina agir derxistiye bê zar û sûcdar mabû. Digot:

- Xwelî li serê min be. Ma min çi dizanibû wê wiha ev agira belav bibe û bi wargehê bikeve. Dema agir girt tebaxê, min rahişt galonê avê û bi ser dakir ku ez bitemirînim. Lê min dit ku agir bi carekê re xwe avêt bin zikê çadirê û girt her derê. Tu nabêjî ji lez û tirsê re, şûna ez rahêjim galonê avê, min rahiştiye galonê neftê û min galonek tije neft bi ser êgir dakiriye. Wey xwelî li serê min be!

Yên guhdarî lê dikirin, ti gotin nedidîtin ku jê re bêjin. Serê xwe dixistin ber xwe û ber bi konên xwe ve diçûn ku binêrin ka tiştek ji ber pêtên êgir filitiye yan na!





## Koçberiya Di Koçberiyê De

*Ji Nînova ber bi Nehdaran ve*

Ev çend roj in xebereke nexweş li nava wargehê belav bibû. Gundên li derdora wargehê saloxek rêkiribûn ku artêşa Tirk û pêşmerge bi hev re amadekariyên dorpêçkirina wargehê dikin. Ev salox gîhiştibû destê rêvebirên wargehê û li nava penaberan jî belav bibû. Baş dizanibûn ku wê dawiya vê dorpêçkirinê ji wana re rewşeke pirr nebaş biafiranda. Li ser paralela sîh û şeşemîn, xaka di bin ewlekariya Netewên Yekbûyî de bi cih bibûn, lê ewlekariya wan tinebû. Ji ber tinebûna ewlekariyê koçberî li ser koçberiyê jiyabûn. Di hundirê xaka di bin ewlekariya Netewên Yekbûyî de her ber bi Başûr ve koç bibûn û dawî hatibûn xelaseka paralela sîh û şeşemîn. Lê li vir jî rehetî tinebû. Penaber kom bi kom dihatin cem hev û li ser rêyeke çareseriyê bi aqilên hevdu dişêwirîn.

- Gelo tu çi difikirî? Vê carê cihê em pê de biçin jî nema!

- Wele nizanim. Aqilê min rawestiyaye. Em ji Etrûş rabûn hatin vir, me got qey emê rehet bikin. Lê xuya ye li ve cîhanê, ji me re rehetî nîne.



- Bi rastî em li vir baş bi cih bibûn. Ger me rehet berdin, mirov dikare li vir bijî.

- Ma rehetî heye? Sed caran hevalan got bila ti kes bi serê xwe vir de, wir de neçe. Lê kesên xwe nenas guhdarî li vê yekê nekirin. Çûn xwe xistin nava destên pêşmergeyan. Qey tu nizanî pêşmerge firsendê bibînin avê li te venaxwin?

Pêşmerge bûne bela serê me. Ne pez bi me ve hiştin, ne pere, ne ewlekariya can û mal hiştin. Tu dizanî dilê min bi çi diêşe? Dema '91ê ji ber leşkerên Sedam reviyan û hemû tî, birçî û tazî li ser tixûb, li navsera çiyan di nava berfê de reben û perîşan bûn. Me got: "Ev birayê me ne, em li wana xwedî derkevin!" û me hemû derfetên xwe pêşkêşî wan kir. Me mal bi mal, gund bi gund pere kom kir û qût û cil ji wan re bir ber lingên wan. Leşkerên Tirkan ji bo ew sînor derbas nekin gule dibarandin ser wan, lê me ji wana re xwarin û cil dikirîn. Îroj Tirk ji xwe re kirine dost û dijminatiya me dikin. De wer neteq, nebehic, dîn û har nebe!

- Em ne dibehicin, ne jî xwe dîn û har dikin. Me erka xwe ya kurdinî, erka xwe ya mirovahî bi cih anî. Me qencî kir. Em ne poşman in. Bila ew xerabiyê bikin. Wê rojêk bê, ev xerabiya wan

bi serê wana de biteqe. Dawiya xerabiyê nîne.

- Nîne, rast e. Lê dîsa jî dilê mirov nagre. Ma qey piçekî pozê wan naşewite? Ma yekî bi namûs ji wana re nabêje; "Ev jî Kurd in, ti zirara wana negîhiştiye we."

Namûs nîne, heta ku wiha bêjin. Cihê rûmet lê tinebe, namûs jî jê çênabe. Yekî kete ser rêka xerabiyê, ne rûmet pê re dimîne, ne jî namûs. Xerabî çavan kor dike, mejiyan gêj dike, dilan reş dike!.. Rabe em biçin ber nûçeyan, tam dem e. Dev ji wana berde. Beytuşe em zimanê xwe diwestînin. Carekê nanê der tev li xwîna wana bûye, êdî nikarin bêyi wê bijîn.

Penaber rabûn ser xwe û berê xwe dan kolika temaşekirina televizvonê. Ji hêla partiyê ve jeneratorên mezin hatibûn kirîn û satileyt hatibûn danîn. Dema dibû êvar, jin, zilam û zarok tev li ber televizyonan kom dibûn û li nûçeyên Kurdî yên MED TV temaşe dikirin. Berya bigîhêjin cihê televizyonê di ber saziya çapemeniyê re derbas bûn. Ronahiya wan pêketî bû û serê wan di ber wana de, xebatkarên saziyê karê nivisandinê dikirin. Dengê çiteçita deqtîloyekê hişkehişk derdiket û tev li bayê hênik ê evarî dibû.

- Xwedê quwetê bide heval!

- Sax bin. Sax bin. Keremkin, rûnên, çayekê vexwin.

- Hûn sax bin. Em nikarin rûnên, emê biçin ber nûçeyan.





- Ma dem e?

- Wele Çarîkek maye, incax em bigîhênê. Ma hûn jî nayên?

- Belê Wele emê bên. Ka rawestin em pêk re biçin.

Du endamên çapemeniyê derketin der ve. Silav li penaberan kirin, destên hev hejandin û li kêleka hev meşiyan.

Xuya ye vê pêlê karê we pirr e.

- Kar ti caran naqede!

- Wele em bi van saziyan xenê bûne. Dema li welêt, me tiştekî wiha nizanîbû. Niha her kar bi saziyan dimeşe.

- Mirovê bê rêxistin heşa wekî pez e. Mirov berê wî bi ku derê de biajo wê bi wir de biçe. Li welêt, neyar bi zanebûn gel xeşîm û bê rêxistin dihişt ku li gorî xwe bikaribe rêve bibe.

- Rêxistinên hebûn jî yên wan bûn. Muxtarî ji bo wan kar dikir. Reîsê Belediyê ji bo wana bû. Dibistanan zimanê wan didan fêrkirin. Ji xwe qereqol jî ji bo xurtbûniya wana bûn.

- Rast e, her tişt li gorî berjewendiya xwe saz kiribûn. Ger wiha nekiribana wê çawa Kurdistan di bin destan de bigirtana? Dagirkerî wiha ye; bi saziyên xwe, bi siyaseta xwe, bi perwerda xwe gelan dixe bin destê xwe.

- Û bi qereqol û leşkerên xwe.

- Rast e. Bêyi vana nikare tiştên din biparêze. Lê yên me ne wiha ne, va ye me asayîş ava kiriye, ji bo çi? Ne ji bo çavtirsandin an lêdana gel e. Ji bo pêşî li tevliheviyê bigre û ewlekariya gel bigre. Hemû ji gel in û di xizmeta gel de ne. Yekî dernekeve derveyî berjewendiya gel, bi asayişê re rû bi rû namîne.

- Ew ji xwe wiha ye. Wele em ji saziyên xwe dilxweş in.

- Belediye jî wiha ye. Li welêt kî dibû reîs wey li wî be ji vir û wir pereyan biçelpîne, eşîrtiyê li pêş bixe, malbata xwe bike xwediyê kar û milk. Lê li vir ne wiha ye. Tevî van bê derfetiyan, dîsa jî çi ji dest tê, dixe bin xizmeta gel.

- Heval a baş jî vekirina van dibistanan e. Zarokên me bi zimanê dayika xwe dixwînin û dinivîsînin. Ma ji vê xweştir tiştek heye?

- Pirr xweş e, belê. Zarok wekî me li gorî mejiyê dijmin mezin nabin. Bi zimanê dayika xwe dîroka xwe çanda xwe, têkoşîna xwe fêr dibin. Ên ku li Kurdistanê xwedî derkevin, wê ew bin.

- Bi Xwedê ev tev dana Xwedê ye. Lê ji me re nahêlin. Niha sibê em ji vir rabin, dîsa wê hemû xera bibin û her tişt li bin guhê hevkeve.

- Penabertî wiha ye. Ger penabertî rehet baya kes li ser xaka xwe nedima. Em jî, her cihê em biçinê, emê careke din dest bi avakirinê bikin. Hey serîdanîn û devjêberdan nîne.

- Wele em dev jê bernadin. Êdi em fêr bûne.





Dema gîhiştin cihê televizyonê, dev ji axavtina xwe berdan û bi rêzê derbasî hundir bûn. Hundir mişt tije bû. Li milekî zilam, zarok û ciwan rûniştibûn. Li milê di jin û keç rûniştibûn. Bi rûniştina wan re mûzîka despêkirina nûçeyên MED TV lê da.

- Ev mûzîk pirr li xweşiya min diçe. Dema lê dide wekî tiştek di hundirê min de tê coşê û baz dide.

- Belê, mûzîkeke xweş e. Hema tiştên Kurdinî hemû xweş in.

Nûçeyan despê kir. Axavtinêr bi Kurdî çend sernûçe pêşkêş kirin. Pişt re derbazî berfirehiya nûçeyan bû.

Li hundir bêdengiyeke balkêş hebû. Bi sedan çavên şîn, kesk qehweyi û reş rasterast awirên xwe dirêjî lêvên axavtinêr kiribûn. Guhê wan bel, nedixwestin yek peyv tenê jî bifilite. Ji ber vê, kes nediaxivî û li ti derên din temaşe nedikir. Dengê axavtinêr wekî pêlên behrê ji televizvonê derdiket, dil û ruhê penaberan dorpêç dikir û di derî û kulekanan re derdiket kolanan, tevli bayê êvarî dibû, ber bi çiyayên ser spi ve diherikî.

Piştî guhdarîkirina nûçeyan, zêdeyê temaşevanan belav bûn û kêmek li ber televizvonê man. Pirahî çûn malên xwe. Hinek çûn mêvandariyê û li rêvebiriya wargehê civîna li ser rewşa dawî despê kir.

- Em çawa bikin? Vî gelî bi ku derê ve bibin? Nûnerên Netewên Yekbûyî daxuyanî dan me ku ew li hemberî balefirên Tirkan nikarin me biparêzin. Ev tê wateya êrîşkirina Tirkan.

- Ger Tirk êrîş bikin wê pêşmerge jî alîkariyê bidin wana.

- Ew, ji xwe wiha ye! Lê ya girîng, ka emê çi bikin?

- Em derbasî Iraqê bibin. Ji wir bêhtir ji me re cih nemaye.

- Iraq rê nade me.

- Em biçin herêma Soran!

- Bawer nakim Yekîtî cih bide.

- Bila heval li her du milan jî pirsyarkin. Em nikarin li vir bimînin. Bi vebûna rêka çiyan re wê artêşa Tirk Başûr dagir bike û me tevan dorpêç bike. Ger bi destkeve, yekî ji me sax nahêle. Pêwist e em rêyeke çareseriyê bibînin.

Di konê civînê de bêdengiyekê bandora xwe danî ser penaberan. Serê xwe berdan ber xwe, destê xwe xistin bin çena xwe û dest bi ponijandinê kirin...

Civîn heta derengiya şevê domiya. Pişt re bê encam belav bû, ji ber ku encam ne bi wana ve girêdayî bû.





Bayekî sar xwe li bin guhê konan dixist. Ji navsera çiyan heta binê çiyan xwezayê cilên xwe yên bûkaniyê yên spi li xwe kiribû. Demeke din wê dest bidaya biharê. Lê hîn gelek rojên sar û seqem di paşla xwe de vedişart û ev yek bi yek wê derxistiba pêşiya penaberên Kurd.

Penaber ketin çadirên xwe û di nava zarokên xwe de cihekî vala ji xwe re dîtin û xwe dirêj kirin. Hundirê çadiran reş-tarî bû. Hinekan çavê xwe girtin û westandina rojê xwestin bi xewê têk bibin. Lê hinek ji wana kirin û nekirin xew neket çavên wana. Jiyana wan her dihat ber çavê wan û ew di nava xeyalekê de, li nava rûpelên dîrokê digerandin.

Gelo teyr di xewna xwe de didîtin an ew bi xwe bibûn teyr! Gelo xeyal dikirin an xewn didîtin an dijiyan? Lat, zinar, teht, daristan, keviyên berfê, mêrg, çîmen, robar, kanî, keriyên berazan, keriyên guran, keriyên pezê spî, pezê reş, hespên kiêl, ên boz, kewarên mêşên hingiv, darên fêkî, baxçe, bistan, zozanên bê ser û ber, navsera zozanan, kozikên leşkeran, çirayên qereqolan ên ronahiya wan dijwar. Dengê fîşengan, gurminiya topan, fişîniya hawinan. Bêhna xwînê, ya barûdê. Hatina gerîlan... Egîd hate ber çavê wan. Çend hevalên wî pê re bûn. Du al di destê wan de bûn. Her yek bi darekê vekiribûn û li jorê berba dibûn. Li kêleka Besta Hincê, li kêleka Besta Meryemê, li derdora Geliyê Basret, li nav darên fisteqên Çaçê, li Daristanên Beşa, li navsera Pîro, li ber pezî,

li nava bistanan, li daristana... Her yekî dev ji karê xwe berdan û temaşeyî van teyrên baz kirin...

Refek teyrê baz di ber çavê wan re firiya. Di navsera Pîro re qulipî Daristanên Besta. Teyrên baz di kêleka çiyayê Filehan re ber bi Kêla Memê ve zîvirîn. Heta navsera Kêlê bilind bûn. Pişt re bi carekê re xwe berdan kûrahiya geliyê Hêzil. Demekê ji ber çavan qut bûn. Pişt re di navsera Girê Rijdê re berê xwe dan Kato. Di ser darên qaçê re nizim firiyan û beriya bigîhên Kato berê xwe dan Herekolê û rast û rast firiyan. Li navsera Herekolê careke din ji ber çavan winda bûn. Herekol seranser derbaz kirin û li bilindahiya Çaçê xwe li ser lateke sor bi cih kirin. Awirên xwe dirêjî ronahiyên ji dûr ve diçirisîn kirin...

- Rabe em biçin, dereng e!

- De rabe, heval li hêviya te ne!

- Çavê xwe vekir, li derdora xwe nêrî. Demekê wate neda rewşa têde ye. Gelo li serê çiyê bû, yan di hundir de bû. Pişt re çavên wî fêrî ronahiya hundir bûn. Belê, di konê penabertiyê de bû.

- Emê biçin ku derê.

- Karê me heye, rabe. Ezê li der ve ji te re bêjim.

- Baş e, niha ezê rabim.

- Ez li der ve li hêviya te me.

Yek bi yek li konên hevdu geriyan, hevdu hişyar kirin û pişt re li derveyî konan gîhiştin hev.

- Xêr e, çi heye?

- Nizanim hevalan em xwestine.





- Ka em biçin.

Derketin ser rêka di navbera konan re diçe rêvebiriya wargehê. Tav hîn nû derketibû, lê dîsa jî bayê cemidî yê ji şevê mabû poz û guhê mirovan wekî bi kêrê were birîn dişewitand. Destên xwe xistin berikên xwe, serê xwe berdan ber xwe û meşiyan. Dema gîhiştin rêvebiriyê dîtin ku yên hatine, ne ew tenê ne. Derbasî hundir bûn û li hêviya daxuyaniya rêvebiriyê man.

- Sedema kombûna me ya li vir ev e. Bila herkes ji her tevgerê re amade be. Êrîşa dijmin kengî were, ne diyar e. Bila ti kes bê destûr ji wargehê dûr nekeve. Bila pezê xwe dûr nebin, li cihên nêzîk biçêrînin û hişyariya xwe bikin. Bila di nava wargehê de jî hişyarî hebe. Li gorî agahiyên gîhiştine destê me, wê bixwazin êrîşekê bînin ser me. Ji bo vê bila her kes hay ji her tiştî û û ji herkesî hebe. Tembiyê li hemû malbatan bikin. Bila ti kes bi serê xwe tevnegere.

Ber bi nîvro ve li wargehê dengê dîlan û stranan bilind bû. Gelek kes ji konan derketin û yên li der ve jî berê xwe dan cihê deng jê bilind dibe. Hin kes agahdar bûn, lê gelek kes jî ji dawetê ne agahdar bûn.

- Daweta kê ye.

- Bi Xwedê nizanim. Di vê heynê re dest bi dawetê kirine!

- Bila bikin, ma çi xerabî tê de heye? Jiyan her berdewam e û rewşa me kêm zêde her ev rewş e.

Li cihê dawatê, di valatiya di navbera konan de birek zilam, keç jin û ciwan kom bibûn. Derdora wan tije zarok bûn û bi dilbijandineke kûr li mezinan temaşe dikirin. Mezin tev rêz bibûn. Ketibûn milên hevdu, gavên xwe pêş de, paş de diavêtin, milên xwe dihejandin, xwe hildidan û li erdê dixistin. Ne tenbûr, ne def, ne bilûr, ne jî ribab hebû. Mûzîka xwe bi xwe digotin û reqsa xwe bi xwe dikirin. Yekî serkêşiya govend û gotinê dikir, ên din tev ew dişopandin.

- W'ez Xelef im, Xelef im, hey hawar e mîr hewar.
- W'ez Xelef im, Xelef im, hey hawar e mîr hewar.
- Xwediyê şûrê sedef im, Yezdîn Şêr Begê Bo-tan e...

Dawet heta piştî esir berdewam kir. Ber bi êvarî ve çend teqsiyên li wargehê hene, bûka xemilandî ji konê wê derxistin, mirov û hevalên wê li kêlekê swar bûn û li pey hev rêz bûn. Di hundirê wargehê re seranser carekê zîvirîn û hatin ber konê zave. Li wir, ji teqsiyan peya bûn û dawet bi dawî bû.

- Ma ev jî dawet e. Xwezî em niha li gundê xwe bana. Me yê sê roj û sê şevan govend bigirta.

- Di koçberiyê de ev ji zêdeyî serê me ye. Her roj cenazeyekî me li erdê ye. Ma dilê kê digre kêfxweşiyê bike.

- Rast e. Cihê şînkişandinê cuda ye, cihê dawetan cuda ye.

- Mirov ne azad be, xêra dawetan jî nîne.





- ...
- Çi bûye? Çi bûye?
- Wele nizanim. Ji ser rêkê dengê fîşekan hat.
- Min jî bihîst, birek fişek berdan.
- Gelo girtin ser wargehê?
- Nizanim. Ka lez bike em bigîhêjinê. Xwedê bike tiştekî xerab neqewimî be!

Zilam, zarok, jin keç, pîr, ciwan ên li derve, yên di hûndiran de, yên li ser kar, ên di ser xwarinê de, yên betal, ên nivistî, herkes ji cihê xwe rabûn, dev ji kar û xebata xwe berdan û ber bi cihê dengê fîşekan jê hatiye ve baz dan.

- Gelo çi bûye, çi qewimiye?
- Nizanim. Tiştê min dît erebeyeke pêşmergeyan bi lez derbaz bû.
- Fîşek berya wê teqiyan, an piştî wê
- Berya wê.
- Xwedê xêr bike, înşalah!

Ji her milî ve penaber ber bi cihê bûyerê ve diherikîn. Di hundirê bêhnekê de du-sê hezar penaber li wir kom bibûn û hîn wekî lehiyê dihatin.

- Xwe paş de bidin! Xwe paş de bidin!
- Bila teqsiyek bê! Zû teqsiyekê bînin!
- Teqsî dereng e bê, em bi milan bibin...

Li cihê bûyerê, rêka di nîvê wargehê re derbaz dibe ji xwînê sor bibû. Pênc kes li erdê dirêjkirî bûn û zilam li ser serê wana kom bibûn. Hinek ji wana dikirin nalîn, hinekan dikirin qêrin û hinek bê deng bûn.

- Çi ye? Çi bûye?

- Tiştek bi kesî hatiye?

- ...

- Na Wele!

- Belê Wele. Mihemedê Şirnexî, Nerîmana Nêrwehî û Sebiheya Hilalî jî birindar in, ew rakirin nexweşxaneyê.

- Xwedê ji kiryaran re nehêle! Ma çi ji mê dixwazin?

- Sersala me li me kirin jehr!

Gel hêdi hêdî belav bû. Wê êvarê axavtin û sihbet tev li ser vê bûyêrê bûn.

- Ji erebê gule barandine.

- Dema erebeya wan ket wargehê, min dît. Min dizanibû xezebek jê dibare. Di şibakeyên wê re li derdora xwe dinerîn û awirên wan pirr pîs bûn.

- Dixwazin çav li me bitirsînin ku em teslimê wan bibin.

- Pişt re jî berê me bidin Tirkiyê, me bifroşin dewletê.

- Ji bo çend qirûş pere û çend çewal ard!

- Ma hindik firotin? Em bi dest wan bikevin, avê li me venaxwin...





- De Xwedê rehetiyê bide. Ka em binêrin wê sibê çi biqewime!

- Şev baş.

Roja din bi hezaran penaber bi alên rengên Kurdinî her du tabût danîn ser milê xwe û ji camiya wargehê ber bi avahiya Netewên Yekbûyî ve meşiyan. Penaber wekî zarokên dibistanan ref bi ref rêz bibûn. Jin li pêş, zilam li paş, her semt beş bi beş li pey hev rêz girtibûn. Heta awaza wan derdiket diruşmeyên şermezarkirinê diavêtin.

- Bimre xiyanet, bijî berxwedan!

- Şehîd namirin!

Milê meşê di ber avahiva Netewên Yekbûyî re derbas bû. Girseyê dirûşme zêdetir, dengê xwe bilindtir kir. Avahiya Netewên Yekbûyî wekî ti kes lê najî derî û şibakeyên wê tev hatibûn dadan. Milê meşa penaberan berê xwe da goristanê. Li wir bi bergeran cenazeyên xwe binax kirin û bi dilekî şikestî vegeriyan çadirên xwe...

- Te şevê din li nûçeyan temaşe kir?

- Na, ez li zêrevaniyê bûm. Qey tiştek hebû?

- Belê, Serok daxuyanî dabû û ev bûyer şermezar kiribû. Digot; "Ew şehîdên me ne û emê tola wana bistînin!"

- Serok çavê min e. Li wir jî li ser rewşa me radiweste û me ji bîr nake.

- Em pirr bi sûd in ku Serokekî me yê wiha heye. Ger ew jî nebaya wê van serokên sexte helaka me biribana.

- BBC jî di nûçeyan de qala vê bûyerê kir.

- Wê qalê bike. Roj nîvro di wargehê de guleyan dibarînin ser jin û mêrên penaberên bê çek û bê guneh. Ma kî dikare vê hovitiyê veşêre?

- Gelek caran vedişêrin. Lê vê carê çawa be qalê kirin. Ew jî, ez dibêjim li Ewropa heval li ser rawestiyane, ji bo wê BBC qalê kiriye.

- Serok bi xwe li ser radiweste. Elbet wê qalê bikin…

...

Rojeke din a sar û seqem li wargehê despê kiribû. Penaber di konan de dihatin cem hev, li derdora sobeyên 'Eladîn' kom dibûn û li ser rewşa xwe, li ser jiyana xwe ya nû û ya kevin diaxivîn. Car caran jî hestên xwe û xeyalên xwe dianîn ser zimên.

- Gelo tu dibêjî wê rojek bê, emê dîsa vegerin gundên xwe?

- Ax, axx! Min pirr bêriya zozanan kiriye. Bêhna helizê li ber difina min difûre.

- Niha zozan tev berf e. Bager li derdora hevdu dizîvire. Cîlo, Çareçêla niha tofan û qiyamet e.

- Emê jî biharî vegeriyaban ser xaka xwe. Me yê careke din pezê xwe biriba serê wan çiyan! Bêhna henik wê li sînga me xistiba. Ava sar wê dilê me hênik kiriba!

- Zahmet e, em careke din wan rojan bibînin!

- Vê carê em vegerin, ezê têr li Oramarê bigerim. Dakevim ber Avaşîn. Dakevim Geliyê Basya. Ewqas sal em li wir man, me têr masî jê nexwarin.

- Ger ew roj bê, emê qiymetê wan deran zanibin.





- Xwedê bê erê, zû ne dereng, emê dîsa vegerin cih û warê xwe.

- Zahmet e Tirk rêka vegerê vekin. Incax têk biçin wiha rê ji me re vebe!

- Wiha ne hêsan e. Amerîkî hene, Ewropî hene, Ingilîz hene... Ma dihêlin tu wiha zora Tirkan bibî. Ne ji piştgiriya wana baya, me niha deh caran Kurdistan ava kiribû. Lê nahêlin, dinya tev li pişta wan e û em tenê ne, kes dostê me nîne.

- Wele tiştek di wan de nemaye. Heval çend derbên xweş deynin wana, ev mesele çareser dibe.

- Neyartiya Kurdan li berjewendiya tevan tê, ji ber ku dema Komara Tirkiyê ava kirin, li ser tinebûna Kurdan saz kirin. Ger îroj Kurdan bipejirînin, divê wê tifa xwe bialêsin. Ev jî li hesabê wana nayê.

- Ji ber vê jî karê me zahmet e.

- Dengê erebeya gazê tê. Ka em rabin, Kes Li malê nîne û gaza me jî ber bi dawî bûye.

- A me jî ber bi dawî bûye. Em vê carê jî bigrin, ka bê Xwedê çi rêkê dide pêşiya me.

- Erebeyên qût belav dikin jî divê îroj bên.

- Qûtê wan serê wan bixwe. Ji aliyekî ve, çav li kuştina me digrin, ji alivekî ve ji me re qût tînin.

- De bi xatirê te, ezê biçim.

- Oxir be. Car caran seriyan li me bide.

- Baş e.


Dema derket der ve dît ku berfeke hûre hûr dibare. Gavên xwe şidand û ber bi konê xwe ve herikî...

Li wargehê roj bi vî awahî derbas bûn. Meha Çile bi dawî bû. Meha Sibatê bi sar û sermeyeke hîn dijwartir bi ser penaberan de hat û rojên xwe yek pey yek bi ser wan de qulipand.

Penaberan rojên xwe pirahî di konan de derbas dikirin. Konên wan saxlem bûn. Hin malbatên dîwar lêkiribûn û kon avêtibûn ser, cihê wan germtir bû. Lê yên konên xwe li halê xwe vedabûn jî li ber sobeyên Eladîn zêde serma nedixwarin. Jiyan ji gelek aliyan ve runiştibû. Zêde birçî nediman. Ji xwe re dibistan vekiribûn û perwerdeya xwe bi zimanê dayika xwe didîtin. Ji bo kombûn û civînan cihên wan ên sergirtî hebûn. Ji bo rêxistiniya jiyana xwe gelek sazî ava kiribûn û baş bi rê ve diçûn. Heta tenûrên pijandina nên jî çêkiribûn. Elektrîka wan ji bo dibistanan û kolikên temaşekirina televizvonê hebû. Ava wan ji xwe kêm nedibû. Ji her alî ve ji rewşa xwe dilxweş bûn, ger ne penaberbûna.

Lê ji ber ku penaber bûn her dem dilê wan di waswasekê de, bi xemgînî lê dida. Her êvara radizan û her sibeha hişyar dibûn digotin:





"Gelo we îroj kî jiyana xwe ji dest bide?" "Gelo wê Tirk kengî êrîşê bînin ser wargehê?" "Gelo emê bikaribin cihekî din ê jiyanê ji xwe re bibînin? "

Dawî mayîna li wargehê ket xetereyê û pêwîst man ji wir barkin. Careke din di koçberiyê de koçberî wê bijiyana. Sibatê her çawa be ewrên xwe bi ser navsera çiyan de rêkiribû û tîrêjên rojê şanî wan dabû. Rojek wekî mizgîniya biharê germ û xweş bû. Penaberên Kurd careke din konên xwe li pişta xwe kirin û berê xwe dan koçberiyeke din.

Êdî di tixûbên paralela sîh û şeşan de, li cihên di bin ewlekariya Netewên Yekbûyî de, ji penaberên Kurd re bihustek xaka ewle nemabû . Dema saloxa nexêr gihişt wan, dem, ber bi êvarî ve bû. Rêvebiriya wargehê gel tev kom kir û bi wana re wiha axift.

- Rawestina me ya li vir, di xeterê de ye. Tirk û pêşmerge lez û bez dane amadekariyên xwe yên êrîşê. Li ser xaka Başûr cihekî em pê ve biçin nemaye. Yek rê tenê li pêşya me maye. Êmê xwe li sînor bixin û derbasî xaka Iraqê bibin. Dewleta Iraqê divê cih bide

me, me bihewîne. Evqas mirov bi mirinê re rû bi rû ne. Pêwist e em îşev barkirina xwe, koçkirina xwe pêk bînin. Ji bo vê, em nikarin tiştên giran bibin. Zarokên xwe, çadir û naylonen xwe û kêmek hûr û mûr û xwarina hûn bikaribin rakin. Ên nikaribin bila kufletê xwe tenê bînin, tiştên din tevan di cih de bihêlin. Lê ji bo ku nekevin destê neyaran, emê tevan bidin ber êgir û bişevitînin!

Penaber tev belav bûn û rêka konên xwe girtin. Bêdilî û xemxwariyeke sar girtibû ser rûçikên wan. Neçarî wekî şûrekî tûj kabên wan, milên wan, awirên wan dibirîn û di hundirê konan de belav dikirin. Kabên yekî li cem nivînên wî man, dilê yekî li cem konê wî ma. Awirên yekî li cem dayika wî ya nexweş ma. Milên yekî li cem pirtûkên wî man.

- Yadê tu li vir bimîne! Ez çawa van hûr û mûran digîhênim wî milê sînor, vedigerim, têm te li pişta xwe dikim û dibim. Qet metirse û xeman nexwe, ezê zû bêm.

- Biçe kurê min tu guh mede min. Ji xwe lingekî min li vê dinyê ye, lingekî min di gorê de ye. Hûn bi saxlemî xwe bigihênin wî milî, ez li vir bimînim jî çi nabe.

- Na, na, ezê zû vegerim.





Bi destê dayika xwe girt. Hişk û cemidî bû. Bir lêvên xwe yen diricifîn, du caran maç kir. Pişt re ew hemêz kir. Hinarkên rûyê wê yên di nava qermîçokan de wekî du sêvên sor maç kir. Her yek dilopeke rondik hat ber mijankên çavên wan. Li wir, di dilê xwe de, her yekî/ê bendek li ber ava kir. Rondik hatin û li ber bendê bûn gol.

- Dayê bi xatirê te.

- Oxir be kurê min. Xwedê quwetê bide te.

Xort ji devê kon derket û rondikên dayikê bendên li ber mijankan li ber xwe bir!

Di hemû konan de amadekariyan destpê kiribû. Jin, zarok, zilam, ciwan, pîr, keç... kî çi jê dihat, dixwest rabike. Herkes li gorî quweta xwe!

- Ma ev çêl wê çima vala were? Tu ka wan betanî û lihêfan bide min.

- Tê çi bikî?

- Ezê li ser pişta çêlê girê bidim. Bila vala neçe. Lingên wê jî henê ji me saxlemtir e.

- Ma wê karibe di binê wan de bimeşe?

- Belê belê, tu ka bîne.

Jina malê sê-çar betanî, lihêfek û doşekeke zarokan anî. Zilam ew tev li ser pişta çêlê rast kir û bi çarşefekê, hişk girê da.

Li gelek konên din jî her kesî mejiyê xwe dixebitand. Ji bo zêdetir bikaribin, pêdiviyên xwe hilgirin li çareseriyan digeriyan û rêbazên ecêb diafirandin.

- Bigir kurê min, her bizinekê betaniyekê li ser piştê girê bide. Yên nêrî bila du betanî bin, ew xurt in.

- Baş e bavo.

- Ka keça min tu jî wan her du şîşên çadiran û sobeyên eladîn ji min re bîne.

- Bavo, ezê rahêjim wana.

- Na keça min em ranahêjinê, ji min re wekî din divên.

Keçê du sobeyên Eladîn û du şîşên dirêj anîn, danîn ber bavê xwe û bi awarên şaşmayî li ser serê wî rawestiya, ka bê wê çi bike!

Zilam sobeyên Eladîn li erdê dirêj kirin, ji xwe ser û binê sobeyan girover bûn û her yek wekî du tekerên ku bi boriyeke stûr bi hev ve hatibin girêdayî bûn. Bi şîşan her du sobe bi hev ve girê dan û bûn weke erebeyeke xwediyê çar tekeran. Navbera şîşan bi tayê naylon baş şidand û wekî torê lê anî. Betaniyek tê de raxist û benekî stûr û dirêj bi pêşiyê ve girê da. Rabû ser xwe û bi pey xwe ve kişand. Erebeya wî meşiya. Ken hat devê wî, kêfa wî xweş bû. Deng li zarokên şaşmayî kir.





- Ka hûr û mûrên mane tev bînin deynin ser.

Serkê ben da destê kurê xwe yê deh-duwazdeh salî û baş ew tembî kir:

- Divê tu hêdî bi hêdî bikişînî û ji rê dernekevî. Ger cihên çal an kort bên pêşiya te, xwe lê nede, di derdorê re bizîvire. Baldar be, bila xera nebe.

- Baş e bavo.

Kur bi leyistoka xwe ya nû îcatbûyî pirr kêfxweş bû. Benê wê girt destê xwe û li hêviya barkirina wê, bi kêfxweşî rawestiya.

Ji milê dawiya wargehê pêta agir bilind bû. Malên tiştên xwe û konên xwe li pişta xwe kiribûn û bar kiribûn, tiştên li pey xwe hiştibûn nefta heye tev bi ser dadikirin û agir bera didanê. Bi dûmaneke reş, pêtên agir qasî sipîndaran bilind dibûn û taveroka ber bi ava ve diçe, ronahî dikirin.

Roja di navbera ewrên tenik de tîrêjên xwe dabû ser wargehê, hêdî bi hêdî ber bi navsera çiyan ve vekişiya. Li wir wekî xwest cara dawî li rewşa penaberan temaşe bike, bêhnekê rawestiya. Bayê kur gilokek ewr anî, li ber danî. Dawî, tîrêjên xwe yen li ser wargehê mane kişand paşla xwe û derbasî pişta çiyê bû, cihê xwe ji heyvê re berda. Perdeyeke tenikî

gewre ket ser wargehê û hêdî bi hêdî tarî bû. Niha agirê li wargehê pêketibû geştir û bilindtir xuya dikir.

Karwanê penaberan kom bi kom, mal bi mal bi rê ketibûn. Ji mirovan zêdetir tişt û mişt xuya dikirin. Wekî lehiyek bide ser wargehê û hemû firax û hûr û mûrên wan bide ber pêlên xwe û di rêka ziftê re, ber bi xaka Iraqê ve biherikîne!...

Zilaman konên xwe li pişta xwe girê dabûn. Zarokên xwe yên biçûk danîbûn ser milê xwe û her yekî tiştek dabûn destên wan; an lalîkek, an çaydanek, an tûrikek. Di destê wan bi xwe de jî kîs, torbe yan tûrik hebûn û ew jî tije tişt bûn. Hinekan du mirîşk an elokek ku lingên wan girê dabûn, ew jî bi barê xwe ve daliqandibûn. Her ku gava xwe diavêtin, mirîşk li bedena wan diketin û dikirin qîje qîj. Bi sedan qîje qîj bi vê lehiyê re bi rê ve diçûn. Lê li ber dengê gire gira warîlan kêm dihatin bihîstin.

Warîlên gazê ji serî û binî qul kiribûn, du darên stur û dirêj tê re derbas kiribûn, bi têl û benan bi hev ve şidandibûn û bi vî awahî kiribûn erebeyek ku bi dest her kesî nakeve. Sînga xwe dabûn werîsê li pêş, pişta xwe dabûn erebê û li ser rêka ziftê dikişandin. Warilên hesin li ser





zifta hişk dengêk wekî palêtên tankan derdixistin. Wiha bi sedan palêt jî bi vê lehiyê re ber bi xaka Iraqê ve diherikîn.

Ji zarokên piyê wan erdê digrin, heta kalên destê wan gopal digrin, jin û pîrên xwe li ser ling girtî, her kes barkirî bûn. Di nava bar de bes çavên wan dixuya. Çavên reş, hişîn; çavên kesk, çavên qehweyî, çavên zere... Bîst hezar çav rêz bibûn, bi vê lehiyê re diherikîn: Çavên xemgîn, çavên dilketî, çavên bi hêvî, çavên westiyayî, çavên bi evîn û hisret, çavên li rêkan, çavên li pêşeroja nediyar!...

- Xêr e, çi bûye?

- Tekerê erebeya min jê filitî.

- Qey te saxlem girê nedabû.

- Min girê dabû, lê qula wê fireh bûye, şîş jê derketiye. Ezê çêkim û bigîhêm we.

- Lezke. Ger derfet hebe, emê careke din vegerin.

- Vegerê ji hişê xwe biavêje. Tu vegerî jî ji pîşo bêhtir tiştekî nabinî. Hevalan tev dan ber êgir.

- Dayika min li wir maye, divê ez vegerim.

Dawiya penaberan hîn ji wargehê qut nebibû, lê serî gîhiştibû bin dara neh çiqil. Di deşteke bê ser û ber de darek tenê hebû!

Dara bi neh çiqil! Dara tûyê ya bi neh çiqil!

Yekî barê xwe li binê darê danî û her ê hat barê xwe li binê darê danî. Her ku bar hatin danîn, hijmara mirovan zêdêtir bû û dengê wan bilindtir bû. Qereqolên pêşmergeyan li paş xwe hiştibûn, lê niha qereqolên leşkerên Iraqê li pêşiya wana bûn û her diçû nêzikî wana dibûn.

Çend leşker derketin der ve û qîr dan nava reşahiyê.

- Roh, Roh!

Leşker ji mêj ve bi hatina penaberan hisiyabûn. Têlefon û bêtêlên xwe xistibûn tevgerê û ji rayedarên xwe pirsyîbûn ka çi helwestê şanî bidin. Ji bo wê digotin: "Roh, Roh, ma tehsin tiskunû hone!"

- Çi dibêjin?

- Dibêjin biçin, hûn nikarin li vir bi cih bibin.

- Emê bi ku derê ve biçin?

- Me bikujin jî, em ji vir naçin.

- Bila me tevan bikujin, em ji vir gavekê paş de naçin."

- Ka wê Sedam cih bidaya me?

- Ka emê derbasî xaka Soran bibana?

- Tirkan çavê hemûyan tirsandiye. Kes cih nade me. Emê li vir bimînin û li ber xwe bidin.





Leşkerên artêşa Iraqê berê çekên xwe dan ser penaberan. Luleyên wan bilind kirin û pêlî lingê wan kirin. Baqên fîşengên kesk, sor, zer, şîn di ser penaberan re firiyan. Di nava reşahiyê de, li aliyê paralela sîh û şeşê winda bûn. Pişt re baqek fîşengên din hatin berdan û dengê fîşengan heta sibehê qut nebû.

Şeva biharê ku xwe ji sibatê vedizîbû, di berbanga sibehê de radestî xwezaya sibatê bû. Bayê kur ewrên ji navsera çiyan kom dikir, da pêşiya xwe û li ser deştê komî ser hev kir. Pişt re xwe paş de kişand û ewran şilahiya xwe ber bi jêrê ve barand. Bayê li deştê maye peşkên barana qerisî, li nava çavê penaberên li ser barên xwe rûniştine xist. Penaber ricifîn. Çavên wan ên li xew, vebûn. Rabûn ser xwe û dest bi vedana konan kirin. Deh hezar penaber tev ketin tevgerê.

Bapeşkê ew di cihekî teng de zept kiribûn. Bi dilê xwe sermaya xwe berdida nawa dilê wan.

- Yadê, min sar e.

- Betaniyê li xwe bipêçe keça min. Niha wê bavê te naylonê vede. Emê bikevin binê.

Zilaman dest bi vedana naylon û çadiran kirin. Lê herkes ne xwedî naylon û çadir bû. Hinek ji wan wiha fikirîbûn ku dema derbasî xaka Iraqê bibin wê di bajarekî de bi cih bibin û ji ber vê yekê çadira xwe bi xwe re neanîbûn. Hinek ji wan ji ber ku zarokên biçûk zêde bûn, tenê ew rakiribûn û çadir li cih hiştibûn. Hinek ji wan ji ber ku nexweş, seqet û pîrên wana hebûn, li şûna çadiran, ew li pişta xwe kiribûn û bê çadir, bê naylon hatibûn.

Ên bê çadir û bê naylon, alikarî dan ên xwedî çadir û naylon. Dest bi avakirina wan kirin. Lê ji milekî ve ava dikirin, ji milekî ve bê ew xera dikir. Dawî erd şil bû. Penaber tev şil bûn. Tiştên wan hemû şil bûn, lê çadir û naylonên xwe jî vedan. Ketin hundirê wan û yên bê kon jî hewandin cem xwe. Pirr westiyabûn û xew ji çavên wana dibariya. Sermayê dabû nava dilê wan. Zarok li ser lingan di xew re diçûn. Pîrek û zilam jî ne kêmî wan bûn. Her konekî du-sê malbat ketin hundirê wê. Rê û rêwanî di konan de nema. Jin, zilam, zarok, pîr, kal, ciwan, keç xwe li ser betaniyan di nava hev de dirêj kirin. Dest û ling û laş û serî hemû tev li hev bûn. Hundirê her çadirekê wekî gilokek ji mirovan mişt bibe lê hat. Serê xwe danîn ser milên hev, lingên xwe kişandin zikê xwe. Betaniyek avêtin ser neh-deh kesan û xewê zora çavên wan bir.





Dema ronahiya sibehê serê xwe şanî da, berfê erd spî kiribû û bi pelên mezin dibariya.

- Yadê, Yadê rabe. Sibeh e.

- ...

- Yadê rabe!

- ...

Dema deng ji dayika wî nehat, betanî ji ser ruyê wê kişand. Ruyê dayika wî wekî gilokeke şimayê derket holê. Wekî di xew de be, çavên xwe girtibû. Keziyeke zer û zêdetir spî, di ser çavên wê re hatibû heta kêleka lêvên wê. Lêvên wê bi pembehiyeke tenik çilmisî bûn. Dema ew ji ber pêtên agir bi revî revî anîbû hat ber çavên wî. Dayika wî wiha hizirîbû ku qey ew bi zanabûn li wê derê hiştibû û xwîn di ruyê wê de nemabû, lê dema çav li kurê xwe ketibû, xwîn hatibû ser ruyê wê û lêvkeniyeke ricifokî di nava lêvên wê de liviyabû.

Destê xwe li ser stuyê wê gerand; ti lebitîn tê de nedît. Destê xwe bir ser dilê wê, ew jî bê liv bû. Guhê xwe danî ser lêvên wê; ti bêhn lê nedixist. Betanî careke din kişand ser çavên wê. Li ber serê wê rûnişt û rondikan êrişî ber mijankên wî kirin.

Derdor zû pê hisiya, lê kes nikaribû derketa der ve. Berf bi qerpalan dibariya; ji niha ve çadir di binê xwe de daqûl kiribûn. Ji

hundir ve zilaman kulmên xwe lê dixistin û berf dianîn xwarê.

Cenaze di nava qeteke naylon de pêçan û danîn kêlekeke ji ber çavên zarokan dûr. Lê zarok di jiyana penabertiyê de bi hiş û fêhm bibûn û zû têdigîhiştin bûyeran.

- Yadê, qey pîrka min miriye?

- Hiş be!

Qîrek ji konekî din bilind bû û axavtina wan birî, bala wan kişand ser wî milî. Jinikekê bi girî û qêrîn hewar dikir. Li der ve dengê çend zilaman hat. Çend kes di derdora konê wana re derbas bûn. Pişt re bû bêdengî.

Li konê qîr jê bilind bibû, çend penaberên zora berfê birine kom bibûn. Jinika qîr dabû zaroka xwe ya biçûk hemêz kiribû, him dihejand, him bi ser de diponijî û him jî digiriya.

Zilamekî zarok ji hemêza wê kişand û danî ser nivînan. Qetek perde bi ser zarokê da kir û bi jinika xwe de xeyidî.

- Şerm e, mede girî! Te cînar tev li ser serê me kom kirin.

- Şevê din sax bû. Vêzbê rabûm ku bê ruh e.



- Zarokê xwe li ber sermayê negirtiye. Qedera Xwedê ye, em çi bikin! Ka bê hîn wê çend ji me jiyana xwe ji dest bidin!? Ne kon heye, ne sobe hene, ne jî xwarin heye. Berf bejnekê ketiye. Halê me ne besî me ye, giriyê te ji me kêm e! Mir, ji xwe re ji vê dinyê xelas bû. Qe ne li wê dinyê mihacirtî nîne, koçberî nîne, rezîltî nîne; wê ji xwe re rehet bike.

- Xwezî ez bimrama û ne ew bûya!

- Xwezî em tev bimrana! Lê bi ya dilê me nabe. Hiş be! Derdê herkesî besî wî ye. Bi giriyê xwe dilê kesî neşewitîne.

Berfa li ser çadirê kom bûye, ji giraniya xwe bi xwe herikî xwarê. Pişt re cenazeyê zarokê jî li nava qeteke naylon pêçan û danîn kêlekekê.

Berfê sê rojan û sê şevan rê neda ku cenazeyê xwe veşêrin. Roj û şevên xwe di konan de, kabên wan di zikê wan de derbas kirin. Car caran ji bo pêdiviyên xwe derdiketin nêzikî konên xwe, yan heta konê cînarên xwe diçûn û bi lez vedigeriyan bin betaniyan. Dilopeke gaz tinebû ku pê sobeyên xwe pêxin; ji ber ku bargiranî bû neanîbûn. Gaza heye tev bi ser tiştên li pey wana mane dakiribûn û tev li jeneratorên mezin hemû tişt şewitandibûn.

Piştî sê rojan berfê vekir û li wargeha nû ya Nehdaran tevgera penaberan dest pê kir. Ser û derdora konan paqij kirin. Hinekan bi bêran berf ji erdê avêtin û li ser erda şil, konên nû vedan. Ber bi êvarî ve salox hat ku pêsmergeyan girtine ser wargeha jê hatine û tiştên li pey xwe hiştine, yên ji ber pêtên agir filitîne, talan kirine. Lê di parvekirinê de li hev nekirine û di navbera wana de şer derketiye, kuştî û birîndarên wana hene!

Nexweşiyan perdeya xwe girtibû ser wargehê. Pîr, kal, û zarokên biçûk ji bin betaniyan dernediketin û bi kuxtekuxtê ji tavekê derdiketin, diketin nava taveke din. Zilam, jin û ciwan ketibûn heyra wana. Ji dara tûya bi neh çiqil bêhtir ti dar li ber çavan tinebûn ku bînin bişewitînin. Baş bû ku hatibûn bîra Netewên Yekbûyî; çend qet nan û hinek xwarin ji wana re anîbûn. Pezê wan jî ji bêçêrebûnê dihiliyan û ji pêwîstî diçûn ber devê kêran.

Dewleta Iraqê hîn serlêdana wanî penabertiyê nepejirandibû. Lê serleşker û rayedarên wan hatibûn wargehê; rewşa penaberan

ditibûn û tegîhiştibûn ku alikarî bi wana re neyê kirin, yek ji wana nafilite. Ji bo vê hinek gaz û pêdivî wekî alîkariya mirovahî anîn û li ser penaberan belav kirin. Lê ne nûnerên Netewên Yekbûyî, ne jî nûnerên dewleta Iraqê biryara bicihkirina wan nedipejirandin û digotin: "Pêwist e hûn ji vir biçin!"

Çûn baş bû, lê wê bi ku derê ve biçûna?

Di vê rewşê de ji Xaça Sor heyetek hat wergehê. Parlamenterên Swêdî, nûnerek ji Cenewrê û nûnerên Netewên Yekbûyî, Nûnerên dewleta Iraqê jî hatibûn. Rêvebiriya wargehê pirsgirêkên xwe yek bi yek ji wana re vegotin.

Heyeta hatiye wiha bersiv da:

- Ne YNK, ne jî Iraq we napejirîne. Pêwist e hûn paş de bizîvirin.

Penaberan jî bi yek devî biryara xwe ya dawî heşkere kirin.

- Cihekî ku bandora PDKê û Tirkiyê lê tinebe ku der be, em amade ne biçinê. Lê hûn me tevan bikujin jî, em ji serma û birçîbûnê bimirin jî, em venagerin cihên di bin bandora wana de. Hûn dizanin ku çi bi serê me anîne.

- Wê çaxê hûnê bi qedera xwe razî bibin. Cihekî din ku em we lê bi cih bikin nîne.

Heyet rabû çû û penaber li ser tixûbê di navbera Iraqê û Başûrê Kurdistanê de pêncsed metre di hundirê xaka Iraqê de, di deşta bê dar û ber de û di nava berfê de, di serme û seqema Sibatê de bi qedera xwe re rû bi rû û bi tena serê xwe man. Hemû hêviyên wan şikestibûn, lê hêviyeke wan hebû ku ew li ser lingan digirtin.

- Wê heval ji me re çareseriyekê bibînin.

- Partî mezin e, helbet wê rêyekê ji me re veke.

- Bila Serok sax be. Me bê çareserî nahêle.

- Hêviya me ew e.

- Ji partiyê bêhtir ti kesî me nîne. Wê me ji vî halî rizgar ke!



## *Warê Dûpişkan: Mexmûr*

- Saloxeke xêrê hatiye!

- Dewleta Iraqê pejirandiye ku me bi cih bike. Ma min negot, `wê heval ji me re cihekî bibînin?`

- Îroj qemyon tên. Emê vê carê bi qemyonan biçin.

- Cihê em biçinê çawa ye?

- Nizanim, lê ji vir geleki dûr e.

Piştî sê heyvên bi zor û zahmet, koçberiyeke din derket pêşiya penaberên Kurd. Lê vê carê kêfxweş bûn, wê li cihekî ewle bi cih bibûna û wê ne bi lingan, bi erebeyan biçûna. Rojên zahmet ên zivistanî li dawî hiştibûn û bihara rengîn germahiya xwe û hişînahiya xwe şanî wana dabû. Meha Gulanê bû û bêhna kulîlkan ji navsera çiyan heta deştê pêl bi pêl dihat. Çiyan cilên spî ji xwe kiribûn û bi rengên kesk û sor û zer xwe xemilandibûn. Çend rojên din wê gav biavêtana nava havînê û ji ber vê yekê germahî roj bi roj zêdetir dibû. Lê her ku roja



ji Nînowa hatibûn Nehdaran dianîn ber çavên xwe, germahî bi xwe xweş dianîn û lanet li wê şeva serme û seqemê dibarandin.

Penaber kom bi kom dihatin cem hev û saloxa nû ya xêrê digîhandin hev.

- Emê îroj bi rê kevin.

- Em hemû di rojekê de nikarin biçin.

- Bila be, emê jî beş bi beş biçin.

- Vê carê em tiştekî xwe li erdê nahêlin.

- Emê pezê xwe çawa bibin?

- Ji xwe, me ti pez nemaye. Lê tiştê maye jî, emê li qemyonan swar bikin.

- Dibêjin ji vir pirr dûr e. Li kêleka bajarê Mûsilê ye. Bi lingan mirov deh şevan jî nagihêjeyê.

- Min Mûsil dîtiye, pirr xweş e. Ava Mezin di navê re diçe.

- Ku li kêleka Dîjle wargehekê bidin me, emê xenê bibin.

- Nizanim, dibêjin cihê em biçinê pir xweş e.

- We bihîst?

- Xêr e, çi ye?

- Netewên Yekbûyî ev çûna me nepejirandiye. Gotiye, "Li ser xaka Iraqê em nikarin alikariyê bidin we."

- Qey li derveyî xaka Iraqê pirr alikarî dida me, ku li wir êdî nede me! Ger nade, bila nede. Emê jî bi rûnê xwe bikizirin. Bila ewlekariya me hebe, me alikariya wana navê.

- Ew ji xwe wiha dibêjin ku em neçin, bê bawer bibin û xwe biavêjin bextê wana û radestî wana bikin. Ew jî bi vê yekê têkevin çavê Tirkan.

- Dixwazin dîsa leyistokan li serê me bileyizin. Me ji hevdu bifeşilînin.

Dema serê qemyonan ketin wargehê, axaftin hatin birîn û penaber li derdora qemyonan civiyan. Di hundirê nîv saetê de bi dehan qemyon herikîn wargehê û penaberan dest bi barkirina kon, pez û hûr û mûrên xwe kirin.

Qemyon di hundirê saetekê di ji jin, zilam, zarok, ciwan, keç, pez û hûr û mûran tije bibûn. Ji penaberên wargehê tenê beşekî biçûk xwe bar kiribû, bi dehan qemyonên hatine tenê têra wan kiribûn. Ji ber ku rêka pê de biçin dûr bû, rêvebirên wargehê ji penaberên mayî re gotin:

- Hûn xwe ji bo sibê amade bikin. Niha emê biçin xaka ji me re şanî dane û emê li cihekî avakirina wargehê bigerin. Dema me cihekî xweş dît, emê li wir deynin û vegerin ku beşekî din ji we bibin. Bi xatirê we û bimînin di xweşiyê de.





Karwanê qemyonan li pey hev rêz bûn û di nava xaka Iraqê de berê xwe dan bajarê Mûsilê.

Taveke germ li penaberên li ser barên di qemyonan de rûniştine dida û ew di nava xwêhdanê de dihiştin. Lê pê re bi leza qemyonan re, bayekî germ bi ser wana de fûriya û xwêhdana wana da ber xwe. Lê pirahî, vî bayê germ tozeke tenik bi xwe re dianî û xwêhdana wan li laşê wana dikir herî û pê ve dikir. Dema tiliya xwe di ser laşê xwe re dibirin, herî wekî şehriyan jê radibû.

Ev çar saetên wan bi rê de bûn. Gelek gund, bajar, çem, daristan û çol derbas kiribûn. Dawî bajarê Mûsilê jî li kêleka xwe hiştibûn û ji xaka Iraqê ketibûn xaka Kurdistana di bin deshilatdariya Iraqê de.

Qasî saeteke din çûn şûn re, xwezaya tê re diçûn bi carekê re hat guhertin. Xaka sor û bi hişînayî wekî tu bi kêrê jêbikî, ji ber çavan winda bû û xakeke têr ber û kils derket ber çavan. Hemû xulûle, girên biçûk ên têr ber û teht û deştên bê binî xwe şanî dan. Qasî çend deqeyên din gîhiştin bajarekî biçûk. Rêk di bajêr re derbas bû. Li her du milên rêkê dikanên fêkî, hunerên destan, dikanên caw û dikanên hûr û mûran rêz dibûn. Bi sedan mirov li ber devê deriyê dikanan diçûn û dihatin.

Her yekî çav li qemyonên barkirî diket dev ji karê xwe berdida û bi awirên ecêb li vê lehiya qemyonên barkirî û penaberên li ser baran di nava tozê de perîşan bûne, temaşe dikir.

Qemyon yek bi yek ji bajêr derketin. Bajar li pey xwe hiştin. Goristana bajêr derbas kirin û careke din deşteke bê ser û ber derket pêşiya wana. Li milê rojhilatê wan çiyayekî ne zêde bilind lê têr ber û bê dar dirêj dibû. Rêka ziftê li dawî, ber bi kurahiya deştê û dirêjahiya çiyê ve mabû. Qemyonên ketin ser rêka axê, pêlî gazê kirin. Dûmaneke reşî bi toz li pey xwe hiştin û leza xwe zêde kirin. Niha tav ji rojavayê wan ve germahiya xwe dibarand ser wana. Deşt ji axê zêdetir wekî behreke sor diçirisî û çavê wan digirt. Car caran bablîsok hildibû û wekî stûneke helezonîk ber bi ezmên ve bilind dibû û rê ve diçû.

Qasî du saetên din qemyonan leza xwe kêm kirin û rawestiyan. Hin kes ji qemyonan daketin. Ev pirahî zilam bûn. Li pêşiya qemyonan tevan landgrosa ku heval û rayedarên Iraqi tê de bûn, hebû. Ew berya wan gîhiştibû wir û li ser rêkê li hêviya wana rawestiyabû. Bi rawestina qemyonan re, penaber kom bi kom daketin erdê û ber bi landgrosê ve hatin. Hemû di nava xema dîtina cihê wargeha nû de bûn. Bi awirên şaşmayî li derdora xwe dinêrîn û dixwestin wateyekê bidin vê xwezayê. Di vê navberê de penaberên di rêvehatinê de tengav bûne jî li çolê belav bibûn û di navbera keviran de li cihekî destavê digeriyan. Penaberên gîhiştibûn cem hevalan dest bi pirsyaran kirin:





- Heval, qey emê li vir bi cih bibin?

- Ma qey ev der şanî me kirine!?

- Li vir av nîne!?

- Wê avê bikişînin bînin?

- Heval, ne darek, ne hişînahiyek heye û pirr germ e.

- Her der ber in. Emê di nava van beran de çawa bi cih bibin?

- Her tişt li aliyekî, ger av tine be, emê li vê çolê bifetisin.

- Hacet nîne em ji têhna bifetisin, we toz û bablîsok tenê me bifetisîne.

Rêvebirên wargehê û rayedarên Iraqê li hemberî van nerazîbûn û pirsên penaberan bê bersiv û neçar man. Qey dikarîbûn çi bigotina? Nerazibûnên wan rast bûn û di cih de bûn. Çoleke bê serî û bê binî; ne hişînahî, ne av! Germ û toz û ber...

Di vê navberê de penaberan li derdorê belav bibûn jî hêdî bi hêdî li dora wan diciviyan û ew jî tev li pirsîn û şanîdana nerazîbûnan dibûn.

- Heval vir ne cihê jiyanê ye. Mişk û mar jî nikarin li vir bijîn, emê çawa bi cih bibin?

- Mişk û mar nikarin, lê dûpişk dijîn. Heval vir warê dûpişkan e. Ez derketim destavê li keriyê dûpişkan rast hatim.

- Min jî çend dûpişk dîtin.

- Min ji dîtin.

-Heval tu li vî dûpişkî temaşe bike! Emê zarokên xwe çawa li vir deynin?

Zilamekî derdora sîh salî dûpişkek kuştî danîbû ser berekî pehn û şanî rêvebirên wargehê dikir. Dûvê dûpişk hîn bilindkirî bû û wekî libên tizbiyê, şeş libên li pey hev rêzkirî jê re dibûn dûvik û di dawiya wan girêkan de jî derziyeke stûr hebû. Derzî ber bi pişta wê ve wekî nikila teyrê qertel xwar bû. Dûpişk rengekî sore yê ber bi reş ve bû û cih bi cih bi pirç bû. Taybetî pirça dûvikê wê dirêj bû. Serê wê ji ber hatibû perçiqandin ne diyar bû. Lê her du meqesên wê yên pêşîn wekî xwe ji nêçîra xwe re amade kirine vekirî bûn. Rêvebirên penaberan xwestin rewşê hinekî nerm bikin.

- Te dûpişkek dîtiye, tu dibêjî qey dinya hemû bûye dûpişk. Ma wê çi ji dûpişkekî bê. Li welêt jî dûpişk hebûn.

- Na, heval. Vê derê çol e û germ e. Tam li gorî dûpişkan e. Ji cihê min ev dûpişk lê kuşt heta ez hatim vir ez li qayî deh dûpişkên din hatim. Di bin her berekî de quleke dûpişkan heye.

- Rast dibêje, min jî dîtin.





- Rast e, rast e.
- Wê bi zarokên me tevan vedin, jehra vana jî pirr dijwar e.
- Agahiyê bidin qemyonan, bila zarokan daneynin.
- Heval em nikarin li vir bi cih bibin.

Dawiyê rêvebirên penaberan çend penaber girtin cem xwe û lêgerînek li derdorê kirin. Bi çavên xwe dîtin ku bi sedan û bi hezaran qulên dûpişkan yek pey yek rêz dibûn. Çend berên biçûk bi lingê xwe gêr kirin û ditin ku bi rastî di bin her berekî de dûpişkek dijî. Di wê bêhnê de ji ser rêkê, kêleka qemyonan qîrek bilind bû. Jinekê bi awazeke bilind bang li textor dikir û digot:

- Zû textor bînin dûpişkê bi keça min veda!

Rêvebirên wargehê bi lez û bez xwe gihandin cem keça dûpişk pê vedaye. Dûpişka bi keçê vedayî, hîn li wê erdê dirêjkirî bû. Yek ji rêvebiran pihîna xwe li dûpişkê xist, avêt kêlekekê û got:

- Ev dûpişkê zer e, zêde jehra wê ne dijwar e û çar girêkên wê hene, mirov pê namire.

Pişt re ji dayika keçikê pirsî ku dûpişkê bi ku derê ve vedaye. Dayika keçê devdelingê derpiyê keçê heta kabê kişand. Li binya kabê, li ser goştê nerme xaleke sor û derdora wê reş derket holê. Rêvebirê pihîna xwe li dûpişkê xistiye, ji bêrîka xwe kêrek derxist û li ber kaba keçê rûnişt. Bi devkenî got:

- Metirse!

Kêr avêt cihê reşbûyî. Xwîn bi ser cihê jêbûyî ket. Rêvebir devê xwe da ser. Mêt û tif kir. Ev mêtin û tifkirin sê çar caran li ser hev pêkanî. Pişt re destmalka xwe ji bêrîka xwe derxist û li ser girê da, baş şidand û rabû ser xwe, got:

- Rast e, ev çol, ne cihê jiyanê ye. Bêavbûn, germahî û dûpişk wê helaka vî gelî bînin. Qet nebe em li cihekî bi av bigerin. Li cihê bi av û hişînahî, dûpişk jî kêm dijîn.

Pişt re rêvebirên wargehê di navbera xwe de li ser lingan civiyan û hemû gîhiştin vê biryarê ku penaber nikarin li vir bi cih bibin. Ev nêrîn û biryara xwe ji rêvebirên Iraqê re jî gotin. Ji xwe rêvebirên Iraqî berê dizanîbûn ku kes nikare di nava van ber û dûpişkan de bijî. Ji xwe di hundirê vê nîv saeta dawî de tiştên jiyabûn, hişê wan ji serê wana biribû. Ew jî tev li biryarê bûn û li derdorê ji bo ku li cihekî bi av bigerin careke din li qemyonan siwar hatin.

Landgros li pêş, qemyonên tije penaber li pey wê rêzkirî li çola bê serî û bê binî li kaniyeke avê geriyan. Çavên herkesî fireh vebibûn û li dilopeke av an li tayeke hişînahî digeriyan. Lê ji xaka gewr û berê gewr bêhtir tiştek diyar nedikir. Cih bi cih li tûmên giyayên bi sitirî rast dihatin, lê dizanîbûn ku ew sitiriyên çolê ne û rehên xwe bi dehan metre bera binê erdê didin heta ku bigîhên avê.





Bêhnekê çûn şûn re, landgrosê ji ser rê, berê xwe da deştê, xelekeke fireh zîvirî û careke din derket ser rê. Gîhişt qemyona despêkê û bang li ajokarê wê kir ku tev bizîvirin û pey wê re werin. Qemyon tev yek bi yek ji rê derketin, zîvironekeke fireh dan xwe û di rêka hatine re dest bi vegerê kirin.

Roj hêdî bi hêdî di kûrahiya deştê de ber bi avabûnê ve diçû. Vê carê çiyayê rût li milê wanî rastê bû û siyekê tarî ketibû berpalên wê. Dema rojê tirêjên xwe yên dawî kişand hemêza xwe û di xelasêka deştê de ji ber çavan winda bû, ji dûr ve ronahiya lempeyên bajarê ku piştî nivro derbas kiribûn diyar bû. Her ku çûn, bajar nêzîktir dibû û dawî landgros li nêzikê goristana bajêr rawestiya. Rêvebirê penaberan zîvirî ser ajoker û got:

- Li jorê çend dar diyar dikirin. Dema em di vir re derbas bûn, bala min kişandibû. Em biçin li wir binêrin. Cihê dar lê hene, niha divê av jî hebe. Pişt re vegeriya ser hevalekî xwe û got:

- Tu li vir peya bibe. Qemyonên hatin bila rawestin. Lê bila kes jê peya nebe û li hêviya me rawestin.

Hevalê wî peya bû û landgros ji rê derket, berê xwe da çiyayê rût. Lempeyên xwe pêxist û ber bi cihê dar lê dîtine ve texmînî rê ve herikî. Qederekê bi jorê ve çû şûn re çaleke fireh derket pêşiya wan. Darên ku dîtibûn ne diyar bûn, lê çala fireh jî rêka wan dibirî.

Rêvebirê penaberan landgros rawestand û jê peya bû. Fenera xwe ya dest derxist û ber bi keviya çalê ve meşiya. Dema gîhişt keviya çalê, ronahiya fenerê da hundirê çalê, Ronahî çû û li zelaliyekê rawestiya. Ji kêfan re rêvebir hindik mabû xwe berdaba çalê û biavêta nava avê. Lê dem dereng bû û dixwest vê mizgîniyê bi penaberan re par veke. Bi lez vegeriya landgrosê û ji ajoker re got:

- Zû, veger! Min ne got li van deran av heye? Him jî aveke diherike. Têra hemûyan heye. Emê konên xwe li vir deynin û vir ji xwe re bikin wargeh!

Landgros vegeriya cem qemyonan û mizgîniya xêrê di nava penaberan de belav bû. Qemyonan berê xwe dan rasta çalê û bêhnekê çûn şûn re yek bi yek rawestiyan. Penaber jê daketin û dest bi valakirina barên xwe kirin.

Ber bi nîvê şevê ve qemyon tev vala bûn û bi landgrosê ve berê xwe dan bajêr ku biçin wargeha kevin, beşeke din a penaberan bînin. Penaberên barên xwe danîne jî, dest bi vedana konan kirin. Edî wargeheke nû ava dibû.

Ji ber ku derengiya şevê bayekî hênik rabibû û dinya cemidî bû, vexwarina avê zêde nedihat bîra kesekî. Ji xwe penaberan ne çal, ne jî av dîtibûn. Çend kesên metere xistin destê xwe û li avê geriyan, nedîtin û ji ber westandina rêvehatinê dev ji lêgera avê berdan. Hatin konên xwe û xwe li ser betaniyan dirêj kirin. Di qemyonan de gêj bibûn û hal di bedenên wana de nemabû. Zû di xew re çûn û heta derengiya sibehê bi xwe nehisiyan.





Dema hişyar bûn tav bi ser serê çiyê ketibû û tirêjên xwe heta kûrahiya deştê direj kiribû.

Her penaberê hişyar dibû despêkê li derdora xwe temaşe dikir. Ji ber ku bi şev hatibûn, nizanîbûn li cihekî çawa bi cih bûne. Her yekî ji nivê şevê heta sibehê bi xeyalekî raza bû. Lê niha perdeya xeyalan bi tîrêjên tavê re belav dibû û rastiyê bi hemû tazîbûna xwe, xwe li ber çavan radixist.

Tavê bi derketina xwe re germahiya xwe dabû ser penaberan û penaber him ji bo destavê, him ji bo naskirina derdorê, him jî ji bo lêgerîna avê li derdorê belav bibûn.

- Kuro ev çi bêhn e ji vê çalê te? Tu dibêjî qey mirar tê de ne, ka em biçin lê binêrin.

Du penaberên derketine destavê ber bi çalê ve meşiyan. Dema gîhiştin keviya çalê, çav li avê ketin û ji kêfan qîr dan û bêhn ji bîr kirin.

- Av! Av! Va ye Av!

- Li pişt xwe vegeriyan û heta dengê wan derket, bang li penaberan kirin.

- Me av dit! Va ye av li vir e! Werin vir!

Penaberên dengên wan bihîstin, rahiştin galon û metereyên xwe û ber bi wan ve beziyan. Di hundirê bîstikekê de bi sedan zilam, ciwan, jin, keç û zarok li ser serê çalê kom bibûn. Lê her yekê nezikî avê dibû

bi bêvila xwe digirt, medê xwe tirş dikir û di cih de kêfa wî lê dişkest.

- Wey dayê ev çi bêhn e?

- Tu dibêjî qey mirar tê de ne!

- Na, na, dayê ev ava kifrîtê ye, heçê vexwe wê pê req bibe.

- Ev bû, ava digotin heye? Emê çawa vê avê vexwin?

- Kî vê avê vexwe, wê pê bimire!

- Ji bo vexwarinê divê mirov bikelîne. Ger tu bikelînî, tê vexwarin.

- Wey xwelî li sero! Ma emê bi çi bikelînin?

- Na yadê, emê li vê çolê, ji têhna re bimrin.

- Zarokan ji navê derxin, wê hemû ji bêhnê bimrin.

Tevî van nerazîbûnan dîsa jî herkesî xwe bera çalê dida û dixwest ku xwe bigîhêne serê kaniyê, metereyeke av tije bike. Çend keç û ciwan jî pêlavên xwe dişuştin û digotin:

- Ne ji vê bêhnê be mirov dikare vexwe. Pirr zelal diyar dike!

Di wê kêlîkê de kalekî penaber li kêleka ava ji kaniya diherike, avzêyeke ku diçe ser dîtibû û cudabûna di navbera herdu avan de bi tecrubeyên awirên xwe ferq kiribû. Çû ser avzê yê, çenga xwe tê dakir û bêhn kir. Wekî dihizirî derket. Bêhn ji vê avê nedihat. Ava di nava tiliyên wî re xwe berda xwarê, ji ya din spîtir xuya dikir. Careke din çenga xwe tê dakir û vê carê, bir nava lêvên xwe. Ji kêfan re rabû ser xwe û qîr da.

- Werin, werin va ye ava şêrîn!

Penaberên dengê wî bihîstin tev li ser serê wî civiyan. Yê ku rê





didît, daqûlî avzêyê dibû û çengek jê vedixwar. Dema av diçû ser zimanê kê, bi dilrehetbûnekê lêvên xwe ji hev vedikir û digot:

- Rast e, rast e, wele şêrîn e!

Penaber êdî gîhiştibûn ava vexwarinê! Av her çiqasî kêm bû jî ji tinebûnê pirr baştir bû. Ava kifrîtê wê bi kêrî şuştina serî û cilên wana bihata. Ava avzêyê jî wê vexwaribana û bi vî awahî dest bi jiyaneke nû bikrana, heta ku Xwedê deriyekî xêrê ji wana re vedikir.

Her yekî/ê metereyek an galonek ava pak û şêrîn dagirt, berê xwe da cihê tiştên xwe lê danîne û pirahî dest bi jiyana rojane kirin.Hinekan firaxê xwe birin ser avê ku bişon. Hinekan dest bi çêkirina xwarinê kirin. Hinekan pezê xwe daxistin ser avê, hinekan berên li derdora xwe hilkirin û dan kêlekekê ku konê xwe lê vedin. Hinek derketin derdorê ku binasin û cihekî xweştir ji konvedanê re bibînin. Zarok, bi sedan li berpala çiyê belav bibûn û li vî cihê nû, ji xwe re, li rêkên leyistokan digeriyan. Di vê bêhnê de germahiyê jî her diçû bandora xwe zêdetir dikir.

Qemyonên çûbûn Nehdaran, piştî nîvro vegeriyan û beşekî din ên pênaberan anîn wargeha nû. Penaberên hatin barên xwe danîn û tev li yên din bûn. Qemyon careke din vegeriyan ku beşekî din ên penaberan bînin.

- Hûn li vir bi cih bûne?
- Rast e.
- Av heye.
- Heye, lê kêm e.
- Ma ne digotin diherike?
- Ew ava kifritê derket. Me avzêyeke şêrîn dît, lê kêm e.
- Çi nabe, bila hebe, bila kem be.

Penaber hêdî bi hêdî li wargeha nû bi cih bûn. Ji ber ku wargeh nêzikî bajarê Mexmûr bû, navê wê kirin 'Wargeha Mexmûr'. Ên ku pereyên wan hebûn, daketin bajêr û hinek tiştên xwarinê kirîn. Gelê li bajêr pêşwazîkirina xwe germtir kir.

Cihê wargehê hemû kevir bûn û li vir jî di bin her kevirekî de quleke dûpişkan hebû. Lê cihekî din ku penaber biçinê tinebû. Pêwîst bûn li vir jiyanê ava bikin. Ji bo vê, kevir ji erdê hilkirin û pê dîwar lêkirin. Konên xwe avêtin ser van dîwaran û tê de bi cih bûn.

Her roj dûpişkan bi dehan kesan vedidan. Gelek zarokan ji sedema vê, jiyana xwe ji dest dan. Penaberan dest bi şerê li hemberî dûpişkan kirin. Bi sedan penaber rêz bûn, misînên avê û tevr û şîş xistin destê xwe û bi ser qulên dûpişkan ve meşiyan. Av bera qulên wan dan. Dûpişk derketin ber deriyê qula xwe. Tevir lê dan û derxistin der ve, pêlî serê wê kirin. Ji hinek qulan bi dehan dûpişk, bi vî awahî derdixistin û dikuştin. Ev têkoşîn a li hemberî dûpişkan bi rojan û bi mehan domiya.





Di vê navberê de, Netewên Yekbûyî destê xwe yê alikariyê, ji wargehê kişand û ew bi qedera xwe re rû bi rû hiştin. Erkdarên Dewleta Iraqê roj bi roj bi tankêran av dianîn û li ser penaberan ji bo her kesekî/ê tenekeyeke av belav dikirin. Penaber car caran nîvê şevê, car caran kelkela germa nîvro rêz dibûn, ji bo tenekeyeke av bistînin. Av jî xwezî av ba ya! Germ û weke heriyê! Ji ber ku ji çem dadigirtin û dianîn. Lê dîsa jî, ji tinebûnê baştir bû. Dema te qeşa diavêt navê dihat vexwarin, lê bi vê sedemê li bajêr jî qeşa ji pêncsed dînaran firiyabû pênc hezar dînaran.

Tîbûn, birçîbûn, germa dijwar, bablîsoka bi toz û dûman, xaka rût, dûpişkên bêbext... Lê dîsa jî jiyan didomiya û her roj berek li ser berekî ava dibû. Penaber xwediyê bîr û baweriyeke xurt bûn û mirovên kedkar bûn.

Herî valakirin qaliban, li ber tavê ziwa kirin, bûn kerpîç û pê xanî lêkirin. Di hindurê salekê de him pişta dûpişkan şikandibûn, him bibûn xwediyê xaniyan. Pêk re dest bi avakirina saziyan û dibistanan jî kiribûn. Zarokên wan azad diçûn dibistanan û bi zimanê dayika xwe dest bi perwerdeyê kiribûn. Jiyan hêdî bi hêdî rûdinişt.

Rojekê zilamekî li ber deriyê xwe ax dikola, tevrê wî çû valatiyê. Kola û şikefteke binerd derket holê. Dît ku hundirê wê tije av e û av diherike! Çenga xwe dirêj kir û jê vexwar, hebekî şor bû lê xweş

bû. Penaber têgîhiştin ku di vê çolê de avê xwe berdaye binê erdê. Dest bi kolana bîran kirin. Hinekan di çar metreyan de, hinekan di çardeh metreyan de, tevrê xwe gihandin avê. Hêdî hi hêdî dest bi çêkirina bexçeyan û dorgirtina hewşan kirin.

Netewên Yekbûyî di vê pêvajovê de bi çavên xwe ev pêşveçûn tev dîtin û baş têgîhişt ku ti leyistok an çavtirsandin, ti zor û zahmetî nikare vîna penaberên Kurd bişkîne. Dawî pêwîst ma ku careke din dest bi dayîna alîkariya mirovahî bike.

Piştî du salan wargeh bi hemû saziyên xwe ava bû. Dibistanên ji seretayî hêta lîseyê, dest bi perwerdeya Kurdî kirin. Bi boriyan av, bi têlan elektrîk hat wargehê. Hilbijartinên Şaredariyê çêbûn.

Niha penaber li hêviva rojên vegera walat in, lê jiyana xwe û avakirina jiyana nû didomînin. Cih û warê dûpişkan ji wan sitendin û kirin cih û warê jiyana nû. Serkeftin bi dest xwe xistin, lê bi evîn û hisreta welatê xaka bav û kalan a pîroz dişewitin.



## Ber Bi Yekîtiya Azad Ve...

Rojekê ez li malekê bûm mêvan. Êvarî piştî şîvê çend cînarên malê hatin bixêrhatinê. Me bi hev re çay vexwar û dest bi axavtinê kir. Gotin û sihbet zîvirî û axavtin hat ser xweşikbûnên xaka Botanê. Wê demê zilamekî ji serî ve bêdeng mabû û bes guhdarî dikir, kesereke kûr veda û got:

-Ax heval, ax! Xwezî ez niha li çiyayê Gabarê, li ber ava Basret ba ma û bila ez bimrama!

Min lê nêrî, şêst an heftê salî hebû. Ji pîrbûniyê yan ji feqîriyê pişta wî qlûz bibû. Zêde qermîçok neketibûn ruyê wî lê porê wî nîve nîv spî bibû û kêmekî riha wî dirêj bibû. Keserek wiha veda ku hemû kul û kedera dilê xwe anî ser zimên. Li kêleka wî yekî ciwan rûniştibû. Berya du mehan jê re dawet çêkiribûn û serê wî girê dabûn. Hinekî bi ken got:



- Mamo, ku tu li ber ava Basret ba ya, tê çi bikraya? Gelo tê masî bigirtana yan tirî bixwara?

Zilêm awirên xwe tûj kir û nerazîbûna xwe da der. Zîvirî ser ê ciwan û got:

- Ew karê te ye! Yê min, hesreta min welat e. Xaka bav û kalan e.

Dîsa keserek veda û kela girî ket qirika wî. Çavên wî tije bûn ku bi peyveke din dikare wekî lehiyekê biherike.

Yê ciwan kesera zilam fêhm kir, ket nava şermê û got:

- Heval, bi destûra we be. Dem hat, ezê biçim ber nûçeyan, binêrim ka çi heye, çi nîne.

Rabû ser xwe, yek bi yek destê me hejand û derket der ve. Dema derket, cînarên pê re hatibûn jî yek bi yek destûra xwe xwestin û derketin. Ez, zilam û xwediyê malê tenê man.

Me her yekî çixareyek pêçandî kişand û li ruyê hevûdu nêrî. Ji bo ku zilam nede girî, min cesaret nekir biaxivim. Bawerkim xwediyê malê jî di wê rewşê de bû.

Piştî me çend hilm ji çixarê kişandin, zilam bi mofika tiliya xwe ya şahadetê rondikên çavên xwe bi paş ve dehfand û dest bi axavtinê kir.

- Xwezî me ev jî rêkiriba serê çiyê, nava hevalan. Lê partiyê rê neda. Digot: "Şehîdên we pirr in û kesî ji bo we kar bike nîne." Lê

bi ya min baya, bila ew jî biçaya, şehîd biketa û biba yê çaran. Wê demê emê serbilindtir bibana. Ev şer rawestiya, ew jî pê sebibî. Ne kurekî xerab e, lê hîn xav e. Ger çûba nava hevalan we bihata strandin. Dilpak e, lê nezan e.

- Ez bawer dikim, ne ji xerabî re wiha got. Dibe ku wî bêriya masî û tirî kiribe.

- Bila ew hemû ji wî re bin. Rast e, ma ew a di dilê min de çi dizane? Dema gundê me ava bû, baxçên me hişîn û xaniyên me li ser piyan bûn, li kolanan qîre qîra zarokan, li derxanê sihbeta pîremêran, li ber deriyan fesadiyên pîrekan... Axx! Axx! Min bêrya wan kiriye heval! Berya ez bimrim, min dîtiba gundê me dîsa ava ye, gundên derdorê ava ne û hemû gundên Kurdistanê li ser piyan in...

Dîsa çavên wî tije bûn û axavtina xwe birî. Xwediyê malê dest bi axavtinê kir û got:

- Belê, belê Mamê Mihemed, bila baweriya te hebe, Tirko nahêle tu careke din vegerî nava wê xêr û xweşiyê.

- Tirko kî ye? Got, Mihemed û dîsa bi mofika tiliya xwe rondikên xwe paş de rêkirin. Dîsa hêrs bû. Tirko çi ye Silêman? Ma qey Tirko hişt, em li Kurdiniya xwe xwedî derkevin? Ma gelo Tirko rê da ku em panzdeh salan şerê rizgariyê bikin? Qey Tirko her çar parçeyên Kurdistanê, di serhildanan de kirin yek? Na, Silêman, na! Serokê me ev tişt ji me re pêkanîn. Ev tev bi keda Serok û şehîdan pêk hatin. Dilê min xwîn digrî. Serokê me îroj di zindanê de ye. Hêsir ê! Lê baweriya te





hebe, di dilê me de, di mejiyê me de her dijî û wê her bijî. Serok dibêje: "Vegerin ser gundên xwe." Bila tu bizanibî ku serok çi bêje, ew rast e. Ji bo vê pêwîst e em vegerin ser gundên xwe. Em careke din Kurdistanê ava bikin. Baxçeyan hişîn bikin û robaran biherikînin. Ji bo ku dilê serok şad bibe. Lê ne rehet e, ne hêsan e. Ev jî sebrê dixwaze, kar û xebatê dixwaze...

Silêman gotina wî birî û got:

- Rast e, ji bo vê Serok ev projeya demokrasî û aştiyê despê kir. Em wê rojê di perwerdê de bûn. Nameya serokatiyê hatibû, li ser vê mijarê bû.

- Ez dizanim. Ma tê aqil bidî min? Serok çi dibêje ez têdigîhêjim. Ger Xwedê bêje "erê", zû û ne dereng emê tev bi hev re vegerin ser xaka xwe!

- Tê bîra te, em bi çi lez û bezê ji gund derketibûn? Her tiştê malê me di cih de hiştibû. Dijmin firsend neda ku em şîva xwe bixwin. Bi Xwedê tê bîra min, hevala min sawareke xweş çêkiribû û li ber jî zeleteya şor hebû....

- Erê, erê... Ka fêkiyên geliyê Basret, ka fêkiyên vê axa pak ? Di navberê de qasî çiyayê Gabarê ferq heye.

- Te got çiyayê Gabarê, te hevalê Egîd anî bîra min. Roja ez biçim welêt, min sûnd xwariye ku biçim serdana cihê lê şehîd ketiye.

- Ew hêja ye! Gabar niha pîroz e. Li her bihust xaka wê, li ser her lat û zinarên wê hevalan şer kirine û şehîd ketine. Pêwîst e ber bi ber, mirov bibîne. Wekî hecê her bihust xaka wê mirov tewaf bike.

- Emê bikin. Vê carê baş baweriya min rûniştiye ku emê Kurdistanê bi destxin û ji nû ve ava bikin.


- Û emê serokê xwe pêşwazî bikin!

- Belê, belê. Bê serok emê çi bikin ji jiyanê? Emê çi bikin ji gundan?

- Rast e.

Piştî sihbeteke dûvdirêj di navbera her du pîremêran de, Silêman bang li hevala xwe kir ku çayeke din deyne ser êgir. Di wê navberê de min jî derfet dît ku ez bi mamê Mihemed re hinek sihbet bikim. Min çend pirsyar jê kirin. Qala hevalên ku li Gabarê dihatin mala wî kir û got:





- Heval, dema em vegerin welatê xwe, hûnê dîsa wekî berê bên malên me?

Min got:

- Haceta serdanan nîne.

Mamê Mihemed wate neda vê gotinê û matmayî pirsyarî.

- Ew çawa dibe? Qey hûnê me ji bîr bikin?

Ez keniyam û min got:

- Na, ew ji xwe ne mumkun e. Ger Xwedê bêje “Erê”, emê tev bi hev re bijîn. Emê her roj li gel hev bin. Ji ber vê yekê haceta serdanan nake.

Bi vê gotina min pir kêfxweş bû. Xortê malê çay anî û li ber me danî. Me çaya xwe vexwar û sihbeta xwe berdewam kir. Ez têgîhiştim ku hesreta welat çiqasî kûr e û gel wekî li ser êgir be, li hêviya vegera ser xaka bav û kalan e. Ji bo vê, hemû zor û zahmetî, koçberî û penabertî hemêz kirine. Jiyana bi hêvî pirr tiştekî baş e. Serok digot: “Hêvî ji serkeftinê bi rûmetir e!” Rast e, serkeftin ku ji dest biçe, mirov dikare dîsa bi dest bixe. Lê ku hêvî ji dest biçe, ti caran bi dest nakeve!

Hêviya Mamê Mihemed qasî çiyayê Gabarê mezin, bilind û

dewlemend bû. Ev jî ji serkeftinê bi nirxtir bû.

Derengiya şevê ez rabûm ser xwe û min xatir ji wana xwest. Ez hatim cihê xwe û min serê xwe danî ser balgîfê, lê xewa min nehat. Çiyayê Gabarê her li ber çavê min bû û ji Ewropa heta Qafqasya, ji Tirkiyê heta Wargeha Mexmûr gel ref bi ref ber bi Kurdistanê ve dimeşiya...



## *Jana Dilê Min*

Rojeke toz û dûman, xubar û bahoz. Rojek ku nefesa mirov teng dibe, bêhna mirov diçike. Tu nikarî çavên xwe vekî. Tu nikarî bêhnekê bistînî. Tu nikarî çixarekê bi rehetî bikêşînî. Ba her bilind dibe. Toz her hil dibe û xwe li nava çavên te dixe. Têhnîbûn xwe dide pêş, dev û lêvên te bi hev ve dizeliqin. Guhên te kerr dibin. Sînga te teng dibe. Çavên te li rêka dûpişkan in ka gelo wê derbikevin an na...

Bê dilê xwe be jî, ez derketim ser rê. Ma ku ez li malê bimama, minê çi bikraya? Yan min dikaribû çi bikraya? Derî girtî ye, şibake tev girtî ne. Hundir germ e. Ne dilê te nivîsandinê dixwaze, ne xwendinê dixwaze. Tu ne dikarî têkevî nava xeyalan, ne jî dikarî binivî. Ez pêwîst mam, min xwe avêt der ve û derketim ser rê, meşiyam.



Komeke zarok li kolanê bûn, di wê bagerê de ji xwe re dileyistin. Yek-dudok hatin pêşya min, destê xwe dirêj kirin û gotin:

- Heval merheba, heval merheba!

Zarokên sê-çar an pênc salî bûn. Por zer û çav hişîn bûn. Wekî kulîlkên zozanan bûn. Qet ne di xema toz, xubar û tavê de bûn. Lê çavên wan qurmiçandî û rûçikên wan tozgirtî bûn. Min destê wan yek bi yek girt, silava wan vegerand û kêfa xwe ji wana re anî. Ew jî pirr kêfxweş bûn û li derdora min kom bûn ku bi min re bimeşin. Çend gavan bi min re meşiyan şûn re rawestiyam û min ji wana re got:

- De bese, êdî vegerin mala xwe!

Zarokan, kêfa xwe anîn û bi ken paş de vegeriyan, wekî çalakiyek bi ser xistibûn dikeniyan.

Min rêka xwe domand. Kaniya li ser rêkê li ber çavê min ket. Jin, keç û zarok li derdorê kom bibûn. Teneke û galonên xwe dadigirtin: Baş bû ku kesî li ser avê pevnediçinî. Bawerkin, di jiyana kevin de ba, wê rojê deh jinan serî li hev bipelixanda. Lê ji ber ku çand û edeba partiyê girtibûn û bi hev re yek êş û yek hezkirin parvekiribûn, alikariya hev dikirin. Di vê çola bê serî û bê binî de ev, tiştekî xweş bû. Ez di ber

wana re derbas bûm. Min bi dengekî nizim merhebayek da wana. Çendekan merhebaya min zîvirandin û yên hişê wan li ser dagirtina tenekên wana jî qet dengê min nebihîstin.

Av, ji çeşmeyê diçû ser bexçeyên li hewşan çêkiribûn. Ava di ber dagirtinê re diherikî erdê jî, bi vî awahî bikar dianîn. Dema tu li xerîbiyê bî, di nava feqîriyê de bî pêwîst e tu sitiriyekî tenê jî binirxînî, vala bernedî.

Ez di ber çend hewşan re derbas bûm. Hewşa dawiyê bala min kişand. Çend teneke yên tê de kulîlk û rihan çandine, li ber çavê min ketin. Min ji xwe re got:

"Ev baş e. Ezê rihanekê bigrim, bibim saziya xwe." Ji ber ku saziya me nû ava bibû, bê hişînatî bû.

Zilamekî di nava baxçeyê xwe de avdanî dikir. Zilam silava min vegerand, bêra xwe di erdê de çikand. Ji avê re rê vekir ku biçe ser mişara pîvazan. Min li baxçe nêrî. Li kêleka pîvazan nîvmişareke bexdenûsê hebû. Pîvaz sê-çar tiliyan bilind bibûn û boq dabûn. Çend derxên zeytûnan li pey hevûdu rêz dibûn û li kêlekê jî, li ser dîwarê kêleka cerê avê, çar teneke û du qutiyên kulîlk û rihanan hebûn. Cer jî, li kêleka erdê çementokirî bû. Xaniyê wana wekî tevahiya malên din, bi lez û bez hatibû avakirin. Xuya ye du ode û salonek bû. Ser pişta xanî





bi dar û hesîran hatibû girtin. Binê dîwaran sê rêz kevir danîbûn, lê rêzên din heta bigîhê banê wê bi kerpîçan lêkiribûn. Erdê çementokirî nû şuştibûn û hîn bi rewa bû.

Zilam çel an pêncî salî bû. Ji feqîrî û zor û zahmetiyê qermîçokên dirêj ketibûn ruyê wî. Bi bêra xwe karê xwe domand û got:

- Keremke heval, were derbas be, çayeke me vexwe.

Ji xwe ez jî li hêviya bangkirineke wiha bûm, ji ber ku çavê min li rihan û çiçekan bû. Ez li dîwarê hewşê zîvirîm û di deriyê ji text û tenekeyan hatiye çêkirin re derbasî hewşê bûm. Zilam dema dît ku ez hatim hewşê, dest ji karê xwe berda û hat, ez pêşwazî kirim. Me destê hevûdu hejand. Zilam Bang li hundir kir û got:

- Qîza min, ka doşekekê bîne, bila heval rûnê û çayekê jî deyne ser êgir.

Qîza wî ji hundir bersiv da û pêk re di destê wê de mînderek, hat der ve. Qîzeke çardeh yan panzdeh salî bû. Por zer û bejin zirav bû. Min ji zilêm re got:

- Heval, tu karê xwe bidomîne. Zilam keniya û got:

- Karê min çi ye? Her û wer çar gav erda hişk û hola ye. Ew jî ji betalî me çend serî pîvaz çandin. Ma te got qey axa Mijîn e ku bi xêr û bêr be. Min deh teneke zibil lê kiriye, hîn jî gava av ji ser

qut dibe wekî keviran req dibe.

Dev ji bêrê berda û hat li kêleka min rûnişt. Min got:

- Xuya ye tu Mijînî yî?

Got:

-Rast e.

Min got:

- Xwezî niha çengek ava ji serkaniya Mijîn li vir ba û bila...

Zilam gotina min birî û nehişt ku ez temam bikim. Kesereke kûr veda û got:

-Axx, axxxx....Tu çi dibêjî heval!? Ka Mijîn, ka Mexmûr?! Qasî çiyayê Kêlê ferq di navberê de heye.

Pişt re berê xwe zîvirand ser min û pirsyar kir.


- Qey tu çûyî Mijîn?

Ez keniyam û min bersiv dayê ku ez neçûme, lê min serkaniya wê bihîstiye.

Zilêm got:

- Wele bihîstin û vexwarin nabe wek hev. Ger te ji ava Mijîn venexwariba, te niha nedianî bîra xwe.





Di wê navberê de, qîza wî, sêniya çayê anî û li ber me danî. Şekir avêt şûşeyan û da destê me. Me di ber vexwarina çayê re dest bi sihbetê kir. Sihbeta me ewqasî xweş û bi coş bû ku pîreka wî û qîza vî jî hatin li cem me rûniştin. Ew jî tev li sihbetê bûn. Me qala Mijîn, Hilal û bexçeyên wan û bi taybetî qala avên sar kir. Me qala xêr û bêra Geliyê Mijîn kir. Pişt re em ber bi zozanên wê ve hilkişayan. Em hatin Kavlê Kulekan, Kavlê Memê Şivan. Şansteyrê, Xankê û em di seranseriya navsera Kêlê re meşiyan. Li dola Şuminiyê me çayeke din vexwar. Em çûn, li Kêlbiçûkê geriyan. Me xwe berda Qeplanê. Ji Qeplanê em daketin Gelî Tirşkê. Li bin siya darên gwîzan em hinekî rûniştin û me çend gwîzên hîn ne sitewiyayî bi kêrê ji qalikên wana derxist û xwar. Em ji wir rabûn, jêretir daketin, di ber Dêra Hozê ya di tehtê de çêkirine re derbas bûn. Me Ava Mêhrê derbas kir û bêhnekê temaşeyî

Dêra Mêhrê kir. Pişt re di ber Girê Rijdê re em daketin ber Ava Hêzil, em heta Xwarê Şêro, meşiyan. Ji pişta Xwarê Şêro me careke din berê xwe da Kêlê û em hilkişiyan. Li ser rêka xwe me çend şivikên Dara Marsîz jêkir ku em bibin ji hevalan re, ji xwe re bikin darçixare. Di Zomên Hilaliyan re me xwe berda Gelî û em daketin gundê Hilal. Li wir em li mala dostekî rûniştin. Xwarina nîvro me li wir xwar. Mast, penêrê bi sîrik, hêkên qelandî û her cureyên fêkî.

Ber bi êvarî re em daketin ser Geliyê Mijîn. Bayekî pirr hênik dihat ku hênkahî dixist nava dil û xwîna mirov. Bêhna dar û şînatiyê, mirov serxweş dikir. Sî ketibû ser gelî û xuşe xuşa ava berfînî weke mûzîka lorîkên dayikan mirov dikişand xewê. Çavên min dihatin ser hev û ger em ne li ser rêkêbana, li nava wê şinatiyê me dikaribû xwe biavêta erdê û têr xewa bin siya daran bikraya.

Bi rê de em pêrgî keriyeke pez hatin. Şivan ji dûr ve silav li me kir û pezê xwe ber bi warê mexelkirinê ve bir.

Li ezmanan çend stêrk derketin. Gelî tarîtir bû. Mijankên min wekî tu hesin bi wana ve girê bidî, dadiketin xwarê. Lê bayê dihat jî, her ez hişyar dihiştim...

Sihbeta me wiha xweş bibû ku destê me jê nedibû. Ji rûyê wana xuya bû ku em tev bi hev re çûbûn Mijîn, Kêlê, Hilal û Geliyê Mijîn. Çaya xwe wiha bi kêfxwşî vedixwarin ku te di got qey li serkaniya Mijîn



bi çengan ava ji zozanan tê vedixwin...

Min şûşeya çayê bilind kir ku gulpa dawî vexwim, lê di wê bêhnê de toz û xubarek li ser rê bilind bû û xwe avêt hundirê hewşê, li ser rû û guhê me belav bû. Me bi lez çavê xwe girt, lê çi fêde! Sênî, şûşe, çaydan, şekir û em tev di nava tozê de man. Êdî tama vexwarina çayê jî, sihbetê jî nema. Toz û xubara Mexmûr ew jî li ber me herimand. Nehişt ku em di sihbet û xeyala xwe de jî vegerin ser xaka bav û kalan. Min dev ji çayê berda. Şûşeya xwe, gêrkirî danî ser binkê wê û min destûr xwest ku rabim.

Mazûvan rabûn ser lingan. Me xatir ji hevûdu xwest û bi lez derketim ser rêkê. Bi gavên fireh min xwest xwe bigîhênim cihê xwe. Ji xwe ji toz û tirabêlkê çav çavan nedidît. Dema ez di ber kaniyê re derbas bûm, hat bîra min ku ez çûbûm wê malê, ji bo ez rihaneke di tenekeyê de ji xwe re bînim. Lê toz û tirabêlka Mexmûr ew jî bi min jibîrkirin dabû. Êdî bêhtir têdigihiştim ku temenek ji koçberî û penabertiyê ne qasî saetek jiyana li welatê mirov e.

Rast e, evder jî parçeyek ji xaka welat bû. Lê tişta ku vî parçeyê xaka welat nexweş û nejiyanî dikir bindestî, koçberî û penabertî bû. Ez hatim cihê xwe û rûniştim. Lê bal û hişê min hê jî ne li serê min bû. Min radyoya xwe derxist û pêlî qulpikên wê kir. Çi ecêb e! Dengê Kurdistana Serbixwe îroj wekî zengil lê dida. Qala projeya aştî ku Konseya Serokatiya PKKê pêşkêşî rayedarên Tirkiyê û raya giştî kiriye dikir. Digot: "Pêwîst e herkesê ji gund û bajarên xwe koçber bûne, vegerin cih û warên xwe û gundên xwe ji nû ve ava bikin. Dewlet jî alîkariyê bide wana. Ger di vî warî de Tirkiye gavê biavêje, gerîlayên me jî amade ne alikariyê bikin û ev yek daxwaza Serok Apo ye. Lê ji bo pêkhatina vê, pêwîst e Tirkiye di rêka demokrasî de gavan biavêje, mafên gelê Kurd û nasnameya Kurdî binase. Ji bo Kurd û Tirk di nava aştî de wekhev û azad bijîn ev projeya ji Îmralî bilind bûye, ev destê li wir dirêj bûye, divê bi cidiyet û hurmet were girtin...."

Êdî xewê zora mijankên çavên min bir û dema careke din çavên min vebûn, laşê min tev di nava xwêhdanê de mabû, ji xuşe xuşa radyoyê bêhtir ti deng nedihat. Ez çûm serşokê û min avek bi ser laşê xwe de dakir... Tevî her tiştî, jiyan didomiya; dil bi êş û jan be jî berdewam dikir.



## *Ez Bimrim!*

Germahiya havînê nû despê kiribû. Deşta Mexmûr geh dişewitî, geh di nava tozê de dima. Car caran ba dilebitî û hênkahiyek bi xwe re dianî. Lê pirahiya rojê bi germahiya tavê derbas dibû. Ji xwe dema mirov ji hundir derdiket, tîrêjên tavê yên li erde diketin, radibûn jorê û rûçik û çavê mirov dişewitandin. Tavê ewqasî diçirisand ku te nikaribû çavê xwe vekiribaya.

Ev çend roj bûn, rojiya birçîbûnê despê kiribû. Gel diçû serdana rojîgiran û bi hev re dîlan digirtin, şevbêrk dikirin.

Ji bajarê Mûsilê komek leyistikvanên gogê hatibûn. Xortên wargehê, yên ji Kurdistanê penaber bûne, bi wana re leyistibûn û bi ser ketibûn. Ji ber vê, kêfa wana li cih bû û gel jî bi wana kêfxweş bibû.



Ji cihê leyistokê em tev bi hev re hatin cihê rojiya birçîbûnê. Ji ber ku rojîgir tev çûbûn temaşekirina leyistokê, gel bi wan re hat û bi meş û dirûşmeyan vegeriyan cihê xwe yên li pêşiya Şarederiya Mexmûr a Wargehê. Li ber avahiya Şaredariyê bi dar û hesîran kolikek çêkiribûn û berya rojî despê bike, ji ber ava mezin, katên darên hişîn anîbûn û ev kolik firehtir û mezintir kiribûn. Rojîgir di bin siya vê de rojî digirtin.

Di nava rojîgiran de xort, qîz, zilam û jin hebûn. Ciwan û pîr tev bi hev re bûn. Lê pîrejinek ji wana bala min kişand, ez çûm cem ku hinekî em bi hev re biaxivin. Ez li kêleka wê rûniştim û min silav lê kir:

- Dayê merheba.

- Merheba kurê min. Tu çawa yî?

- Tu sax bî. Ger tu baş bî, ez jî baş im.

Wê gavê dayê kesereke kûr veda û çavên wê rawestiyan, awirên wê ber bi cihekî dûr ve herikîn û li wir daliqandî man. Çavên wê bi rondikan şil bûn, lê rondik ne bariyan, wekî bendek li ber lehiyekê raweste, rondik li ber mijankan gol bûn. Rûçikê wê qermiçî bû lê hinarkên ruyê wê diçirisîn. Pora wê ya spî bibû, xuya bû ku demekê zerê zêrînî bû. Kiraseke rengê sade li xwe kiribû û çariyeke reş dabû serê xwe.

Piştî vedana kesera kûr, hinekî bêdeng ma û li derdora xwe temaşe kir. Rojîgir tev li cihê xwe rûniştibûn û bi kesên hatine serdanê re sihbet dikirin. Hinek ji wana şerîteke reş li eniya xwe pêçabûn û rojeke zer li ser neqişandibûn. Ev şerît û roj li ser eniya dayê jî hebû. Piştî temaşekirina derdora xwe, dayê dest bi axavtinê kir û got:

Ma ezê çawa baş bim kurê min? Ma qey ji bo me Kurdan başî heye?

Ez çi bersivê bidimê ya rebî! Ez bêjim; “Başî heye,” ne rast e. Ez bêjim; “Nîne,” nabe. Bêdengî ji her du bersivan jî çêtir bû. Dema dît ku ez bêdeng mam, êdî bisteh axivî.

- Başî ji bo me Kurdan nîne, kurê min. Başiya çi, halê çi? Rojek tenê xweşî me ne dîtiye. A niha jî kul û kederên min bûne qasî çiyayê Cûdî.

- Çi nabe dayê, dilê xwe megre. Wê roj bê, her tişt baş bibe.

- Belê, rast e. Lê gelo ezê wê rojê bibînim?! Xwezî min bidîta Serokê me ji heps û zindanan azad bûye û bila ez bimrama.

- Wê ew roj jî bê.

- Na, kurê min, na! Dijminên me pirr in. Xayinên me pirr in. Cîhan tev li ser serê me bûye yek. Ma wê ew roj çawa were?





- Bi kar û xebatê! Bi meşandina rêka serokatiyê wê were.

- Ew rast e. Ma ne em jî karê xwe dikin. Êdî hêviya me ma Xwedê. Belkî Xwedê deriyekî xêrê ji me Kurdan re veke, Serokê me azad bike ku em jî ji vê rezaletiyê rizgar bibin.

Min nêrî ku kul û kedara dayê pirr e. Her ku diaxive jî pirtir û kûrtir dibe, lê ez çi bêjim ku dayê kêfxweş be, dil rehet be. Min devê xwe vekir ku ez biaxivim, lê dayê berya min axivî û got:

- Gelo ev bêbavên Tirkan wê efûyekê derbixin an na?

Min got:

- Wele ez nizanim. Ma ne dibêjin; "Emê derxin." Lê tu dewleta Tirkan dizanî. Tiştên li hesabê wana neyê, nakin.

- Ew rast e, kurê min. Tirk her li ber a xwe ne. Ger tu sed salan ji wana re kar û xizmetê bikî, roja tu dev jê berdî, nabêjin "spas" wê bêjin "haydê, eşekoglî eşek".

Ez keniyam û min bi mereq pirsyar kir.

- Dayê, tu vana ji ku dizanî?

- Ooo...kurê min; Tu dibêjî qey dayê ev por beytuşe spî kiriye. Ma ne ev panzdeh salên min, ez jî di nava vê partiyê de me? Bi

Xwedê roja ku cara yekem heval hatine çiyayê me û heta îroj deryê me ji hevalan re her vekirî maye. Ne xayintî ketiye dilê min, ne sarbûn û bi izna Xwedê nakeviyê jî.

- Ez jî bawer im ku nakeviyê. Ti sedem nînin ku mirov xerab an sar bibe.

Dema min wiha got, dayê dîsa keserek veda û vê carê derdora çavên wê bêhtir şil bû. Rondik hatin binê mijankan ku xwe berdin ser rûçikan. Çavên wê dîsa awirên xwe dirêjî dûrahiyê kirin û got:

- Çawa sedem nînin? Ku sedem tinebin, çima her tişt li gorî dilê me nameşe? Ger sedem tinebin çima Serokê me ne li cem me ye û em tev bi hev re ne li Kurdistanê ne? Ma qey ev ne sedem in?

- Belê.

Dayê serê xwe berda ber xwe. Rondikekê ji nava mijankên wê xwe berda xwarê. Bi hinarka ruyê wê ve herikî, hat, li nava qermîçokên jêrê zîvironek da xwe û li binê algûşka wê kom bû. Berya ji wir bikeve ser kirasê wê, bi destê xwe çav û ruyê xwe paqij kir û bi zorê axift:

- Axx kurê min, bila ez bimrim. Ez bimrim ku van rojan nebînim. Dihat bîra kê ku Serokê me dîl bikeve destê dijmin û wî bibin giraveke di nava behrê de, li wir tî û birçî bihêlin, cîhanê lê dadin?

Êdî ez têgîhiştim ku kul û kedara dayê pirr bilind e.





Di rojiya birçîbûnê de, dilê min negirt ku pirr zahmetiyê bidimê. Êşa wê, jana dilê min jî bû. Bi ser halê xwe de, ji welêt koçber bibû; di jiyana penabertî de li heft cih û wargehan geriyabû. Dawî ew jî wekî hemwelatiyên xwe yên penaber li vî cih û warê dûpişk û maran bi cih bibû. Her sê zarokên wê jî ne li cem bûn; du Şehîd û yek jî gerîla bûn.

Min dît ku ez sihbetê bidomînim wê jana dilê dayê bilindtir bibe û êdî nikare rondikên çavên xwe rawestîne. Ya baş rabûn bû. Min xatir jê xwest û çûm cem welatparêzên din ên di rojiya birçîbûnê de...



## *Şehîd Ewlekarên Pêşerojê ne*

Rojek ku germahiya deşta Mexmûr ji erd û ezmanan dibariya, gelek mirov di nava tevgerekê de diçûn û dihatin. Ji rûçikên mirovan keder û xemginî dihat xwendin.

Mirov tev ji her çar aliyên wargehê dihatin û ber bi cihekî ve diçûn. Ji ber ku min dizanîbû bi ku derê ve diçûn, min nekir xem û ez jî ber bi aliyê pê de diçûn ve meşiyam.

Bi rê de ez li qayî dostekî hatim. Me silav li hev kir û destê hev hejand. Em bi hev re meşiyan û yê dost dest bi axavtinê kir.

- Heval, îroj bi rastî ji bo me rojeke taybetî ye. Hinek ji me bi mehan , hinek ji me bi salan e, em li hêviya vê rojê bûn. Tiştên me bihîstibûn û dizanîbûn jî, hevalan ji me vedişartin û ji me re nedigotin. Çend caran min ji hevalan pirsî ka bê rast e yan ne rast



e, lê her carê hevalan digot; "Tiştekî wiha nîne!" Min jî ji pêwîstî bawer dikir û maliyên xwe qanix dikir ku tiştekî wiha nîne. Lê îroj derket holê ku tiştekî wiha heye.

Min di kêleka çavan re nîv bi dizî li ruyê wî nêrî. Dil bi keser û xemgîn bû. Hinek rehetbûn ji çavên wî dihat xwendin, lê ne tam bû. Hinarkên ruyê wî yên di bin tavê de şewitîne, diçilmisîn û vedibûn. Awirên wî car caran teng dibûn, car caran dirêj dibûn. Min got:

- Hacet nîne ku tu xwe xemgîn bikî. Ne acizî pêwîst e, ne jî xwe êşandin. Ger heta niha hevalan rastî ji we re negotibin, pêwîst e tu bizanibî fikarek wana heye. Partî gelek hesaban dike, pir tiştan tîne ber çavan û li gorî wê yekê gavan diavêje. Her tişt wiha bi germahî û di cih de çênabe. Car caran, ji bo tu hinek biryaran bistinî, divê tu bi mehan û bi salan amadekariyê bikî. Her tişt wiha ne hêsan e. Dibe ku ji bo mirovekî hêsan be, lê ji bo partiyekê qet ne hêsan e.

Bi kotekî keniya û got:

- Ji xwe ew tiştên tu dibêjî rast in. Ez ji bo vê yekê tiştekî nabêjim. Xema min jî ne ew e. Helbet partî çi baş e, çi nebaş e ji me bêhtir dizane. Ez ji bo vê qet tiştekî nabêjim. Lê gazindên min

ji hevalan in. Bi şev û roj tên cem min, ez diçim cem wana, em sihbet û şevbêrkê dikin; li ser tevahiya cîhanê nirxandinan dikin, lê dema tê ser vê meselê heval nezan, nedîtî û bêxeber dibin!...

- Ev tiştek xwezayî ye. Heta ku partî heşkere neke, gotina wê ne rast e.

Yê dost, nîv gazindokî, nîv qanixbûyî bersiv da û got:

- Baş e, baş e. Ji xwe ez çi bibêjim, hûnê ya xwe her bi ser a min bixin.

- Mesele ne ew e ku gotina yêkî bi ser a yekî din bikevê. Çi rast be, bila ew bi serkeve.

- Ev, ji xwe wiha ye. Ez ji bo vê yekê tiştekî nabêjim. Lê bawer im tu ya di dilê min de, têdigîhêjî!?

- Belê, belê; ez têdigîhêjim...

Ji ber ku em nêzikê saziya em biçinê bibûn, min axavtina xwe nîvçe birî. Li ber deriyê saziyê gelek mirov kom bibûn û dudu dudu, sisê sisê, çar çar, komik komik bi hev re diaxiftin. Me silav li wana kir û em derbasî hundir bûn.

Saziya em çûne, di wargehê de saziya herî bi nirx û pak bû. Tevahî ji betonê hatibû avakirin û fireh û dirêj bû. Di derî re em ketin salona biçûk û me pêlavên xwe derxistin şûn re, em ketin hundir. Li erdê terş û xalî raxistibûn. Çend kes bi rêzê rûniştibûn. Me silav li tevan kir, yek bi yek destê wan hejand û em jî derbas bûn, li cihê vala rûniştin. Me pişta xwe da dîwêr û li derdora xwe temaşe kir.

Li dîwarê pêşberî derî di nêvî de wêneyekî Serok Apo daliqandî






bû. Li derdora wê jî alên Kurdistanê pêve kiribûn Li jora diwêr seranser, yek pey yek wêneyên şehîdên di şerê pazdeh salan de jiyana xwe ji dest dabûn rêz kiribûn. Cih bi cih jî, neqş û xemlên kesk, sor, zer bi ser wêneyan de daliqandibûn.

Destpêkê, li ser wate û girîngiya rojê axavtin hat çêkirin. Pişt re saziyên li wargehê hene, rêz bi rêz hatin sersaxiyê. Me jî sersaxiya malbatên şehîdan kir û em derketin. Ez û yê dost, hinekî em bi hev re meşiyan. Pişt re me xatir ji hev xwest û em ji hev veqetiyan.

Bi rastî germahiyê dikir ku mirov li der ve negerin û birevin ber siyan an jî birevin hundiran. Lê li ber siyan jî, di hundiran de jî kesî debar nedikir. Pel nedilebitîn û ji bo dermanê çavan be jî ba, ji ti deveran nediherikî. Min berê xwe da cîgehê xwe û ji bo êvarî bikaribim biçim çend sersaxiyan, di dilê xwe de gîhiştim biryarê. Dema ez gîhiştim cîgehê xwe, min karê xwe plan kir ku bikaribim evarî vala bimînim.

Ber bi êvarî ve hinekî ba lebitî û pelên daran dest bi hejandinê kirin. Baş bû ku toz û xubar pê re ranebû. Derdor hinekî hênik bû, sî ket erdê. Piştî şîvê ez û hevalek em derketin der ve. Taziye hîn fermî despê nekiribû. Lê şehîd hatibûn heşkerekirin. Em li sê-çar

malan geriyan. Pişt re derengiya şevê em çûn mala dawiyê. Çend kes li hewşê, li ser terşan rûniştibûn û pişta xwe dabûn balgîfan.


Dema çav li me ketin, rabûn ser xwe. Me silav li wana kir, destê wana bi rêzê hejand û li cihê şanî me kirin, em rûniştin. Ji me re çay anîn, çixare dirêj kirin.

Me bi kurtahî sersaxî xwest û li ser giringî û wateya şehadetan dest bi axavtinê kir.

Bav û dayikên şehîdan, xwişk û birayên wan û kesên hatibûn sersaxiyê tev bi rêzê rûniştibûn. Bavê şehîd kesereke kin veda û got:

- Bila serê Serok Apo ji me re sax be! Bila serokê me ji destê zaliman derbikeve, em hemû canê xwe bidin jî, ji bo me giran nayê. Ji me re serê partiyê, serê hevalan û yê gel sax be. Ji xwe zêde para me tê de tinebû; ew êdî zarokê partiyê bû. Dema ji malê çûbû, bi rastî jî zarokek bû. Partiyê ew mezin kir, zane kir; bi çek û bi cesaret kir. Serokatî bi rojan û bi salan ew perwerde kir. Ji ber vê yekê ew destpêkê zarokê partiyê û yê Serok Apo bû.

Dayika şehîdî axaftin ji mêrê xwe girt û got:





- Ji xwe em hemû yên partiyê û yên serokatiyê ne. Serok Apo em tev ji nû ve afirandin. Çav da me, guh da me, ziman da me, mejî, hiş û jiyan da me. Em tev deyndarê Serokê xwe ne. Bila Serokê me ji heps û zindanan derkeve, bila canê me tevan feda be. Niha ger partî bixwaze, çend zarokên min ên hene, ezê tevan gorî vê dozê bikim.

Bavê şehîd wekî awirên xwe dirêjî kûrahiya dîrokê bike, li dûr nerî û got:

- Em ne ji ber xwe di van çolan re derketine. Em, ji bo namûs û şerefa xwe, ji bo azadiya xwe, ji bo ku zilma dijmin li ser serê xwe nepejirînin hatine. Ev rêk jî, Serokê me û şehîdên me şanî me kirin û em bi vê rêkê pirr serbilind in.

Xortekî şazdeh, hivdeh salî, bi dengekî şermokî ket nava axavtinê û pişt re em têgîhiştin ku ew jî birayê şehîdî ye. Xortê por zer û çav şîn li ser rewşa penabertiyê, zahmetiyên kişandine axivî û got:

- Heval, ez bawer im, emê rojekê dîsa vegerin ser xaka welatê xwe û dest bi jiyana nû bikin. Min ev yek di xewna xwe de dît.

Min didît ku em li bajarekî pirr mezin bûn. Bi sedan, bi hezaran mirov wekî lehiya avê ber bi vî bajarî ve diherikîn. Em tev li qadekê kom bûn. Wekî em di xewnekê de bûn û mijeke tenik pêşiya rojê girtibû. Lê pişt re min dît ku ronahiyeke pirr xurt xwe da ser nîvê çavê min. Derdor tev ronahî bû. Min li derdora xwe nêrî ku mirovan tev çavên xwe ber bi ronahiyê ve kirine. Min jî eniya xwe bilind kir û lê nêrî. Wê demê di navbera erd û ezmanan

de Serok Apo bi rûkeniyekê dest bi axavtinê kir. Gel tev ket nava coşeke mezin. Lîlandin û qîrdayîna dirûşmeyan wiha bilind bûn ku ez veciniqîm û min dît ku xewn e. Ez pirr êşiyam. Lê ez bawer im, ev xewna min wê rojekê bibe rastî.

Bêdengiyek ket ser civatê. Heşkere bû ku herkes ketibû nava xeyalan û çûbûn bajarê serok lê diaxivî...

Hîn çend malbatên din hebûn. Divîbû em biçûna sersaxiya wana jî. Ji ber vê yekê me destûr xwest û em rabûn. Careke din me yek bi yek destê hev hejand û em derketin.

Li der ve bayekî hênik dihat. Şevê, perdeya xwe ya gewr raxistibû binê stêrkan. Em kolan bi kolan, meşiyan. Bi rê de, em li gelek kom û girseyên gel rast hatin. Ji her semtê diçûn her semtê; mal bi mal li sersaxiyê digeriyan. Dilê wergeha Mexmûriyan tev bi hev re diavêt. Heşt – neh hezar kes bibûn yek malbat ku êşa wan hevpar, qedera wan hevpar, hezkirinên wan û kêfxweşiyên wan hevpar. Roj û pêşeroja wan, hêvî û baweriya wan jî hevpar...

Bayê hênik car caran bilind, car caran nizim dibû. Hênkayî û germahî gav bi gav dihat guhertin. Stêrk pey stêrkan diherikîn. Derengiya şevê careke din bayekî hênik lebitî, lê vê carê xuya bû ku ev ne bayê çolê bû! Te digot qey ji navsera çiyan, ji firehiya behran, ji şînatiya daristanan xwe veqetandiye û bi dizî xwe gihandiye nava van mirovên çiyayî û daristanî ku hesreta wan biborîne. Ki dizane?

Dibe ku vî bayî ji navsera Cûdi û Gabar, ji daristanên Bestan û Oramar, ji Behra Wanê û Îmranlî silaveke dilxweşî û sersaxiyê bi xwe re anîbe...



## *Germahiya Li Ber Keviya Berfê*

Ev çend roj in Çilê Havînê despê kiribû. Germahî ji erd û ezmanan dibariya. Car caran bayê diherikî, bi xwe re wekî pêtên agir bîne, derdora xwe disot û derbas dibû. Çend dar û çiçekên li wargehê hebûn, pelçîmên wan dimirin û diçûn.

Zarokên di pêçekê de, heta ber destê sibehê digiriyan û xew, ne diket çavê wan ne jî diket çavê dayikên wan. Laşê wan ji serî heta binî, ji pizikên sore tije dibûn û laşê wan di nava xwêhdanê de diman. Bi şev, wekî tu terman dirêj bikî, li ber deriyan, li binê kolikan zarok, jin, zilam xwe diavêtin erdê û bi hêviya bayekî hênik, li stêrkan dinêrîn ku piçeke xew bikeve çavên wan û rehetiya canê xwe bistînin.

Bi roj, bi derketina tavê re, ji xwe germahiyê. bandora xwe datanî ser wargehê. Hîn ku roj bilind nebûye, zilam û xort bi lez



û bez dadiketin bajarê Mexmûr, ji bo pêdiviyên xwe pêk bînin. Dîsa bi wê lez û bezê vedigeriyan û xwe diavêtin ber bextê germahiyê. Ewqas xwêhdan ji wana diçû ku bi tasan av vedixwarin dîsa jî têhna wana nediçikiya.

Nîvro, ji çend zarokên şûm bêhtir ti kes li kolanan diyar nedibû. Zarokên ji şeş-heft heta sêzdeh-çardeh salî her li kolanan bûn. Wekî li binê germahiya li ber keviya berfê bin, qet ne xema wan bû. Leyistokên xwe dileyistin, bi lingên tazî li ser xaka dikele baz didan, gogên paçikî, firfirokên naylon û kaxezî ber ba dikirin. Xwêhdanê di pehniyên wan re diavêt, serê wan wekî seriyê di beroşê de bikele, germ dibû, ruyê wan ji toz û xwêhdanê dibû herî lê dîsa jî leyistoka xwe didomandin.

- Yalah Mate, Mate, Grîmastîî...

Zarokên ji Botanê, ji Zagrosê ji nava keviyên berfê hatine, niha selikên spî di destê wan de, parçeyên qeşaya şerbetkirî difrotin. Ew berfa bê serî û bê binî, ew a cemidî û xweş, ew a bê pere, bê kirîn û firotin niha li wargeha Mexmûrê bûye wekî qeteke zêr!

Zarokek ku bi girî û delaliyan, bi nazdarî û xapînokan bîst û pênc dînaran ji dayik û bavê xwe veqetîne û girîmastekî bikire, wekî çengek berf ji navsera Kêlê, ji keviyên li Herekolê, ji berpalên Cûdî, ji kevandeyên Cîlo û Çarçêlan rahêje, bimije û her bimije... Wiha kêfxweş dibû, wiha dilhênik dibû. Lê hebûna girîmastiyên li Mexmûr, ew deqe, ew saniye bû. Dema ji nava lêvên te qut dibû, wekî tu bixapî, germahiyê bandora xwe bêhtir diavêt ser te. Lê berfa çiyayên Kurdistanê, hîn te nexwariye, dema tu nuh çav lê dikevî, têhnîbûna te dişikê; tu hênik û dilxeş dibî.

- Tisss...

- Av hat, ka, zu tenekeyên xwe bînin, av tê!

Pîrek, keçên ciwan û zarok tev; êdî kes li germahiyê nanêre. Metere, galon, satil, teneke di destê wan de, dibezin ber çeşmeyan. Berê navê wan kahnî bûn, niha bûne çeşme. Berê bîst û çar saetan bi guşînî û xûmînî diherikîn, niha rojê saetekê bi tisînî û fişînî diherikin. Berê giya û tûzik li derdorê şîn dihat, niha qazên ji têhna





devê wan ji hev vebûyî, wekî ji Xwedê re berger bikin, li binê çeşmeyan, li hêviya hatina avê dikilkilîn.

Ewqas av ji ber çeşmeyan diherike, rojekê ji bo Xwedê tayek giya şîn nabe. Ka kahnî û robarên zozan û warên Botanê, Zagrosê, ka çeşmeyên wargeha Mexmûra germînî?...

Hin pîrek firaxên xwe bi lez li ber avê dişon. Hin zilamên, eyalên wan nesax bi şermokî be jî, satilên xwe datanîn ber çeşmeyê ku jin ji wana re dagrin.. Dema satilên wan tije dibin, bi lez diçin malê, vala dikin û careke din bi awayekî stûxwar û çavberger vedigerin, tên li ber çeşmeyê radiwestin ku dilê pîrekan bi wana bişewite, satil an tenekeyên wan bidin ber avê û tije bikin.

Qaz, mirîşk û elokên li ber çeşmê li hêviya rehma avê jî, ji kêfan re xwe di coka avê de digevizînin û têr şil dikin.

Herikîna avê, dilê herkesî xweş kiriye. Bi qehr û bi hêrs bin jî, dev bi ken û rû şêrîn in.. Lê dema av qut dibe çend zarok û qîzên satilên wan vala mane, bê dilê xwe be jî, rêka malê digrin. Êdî li malê xebata paqijiyê û çêkirina xwarinê dest pê dike.

Dema roj ber bi êvarî ve diçe, xort ber bi topanê ve diherikin.

Ger taximek ji der ve hatibe, qîz, xort, zarok tev li topanê kom dibin û temaşe dikin.

Lê pîremêr di wan saetan de pirahî li ber siya dîwarekî nêzîkî cadê rûdinên û dest bi qise û şîroveyan dikin. Hinek rewşa rêzanî ya cîhanê dinirxînin, hinek nûçeyên Medya TV şîrove dikin. Hinek li ser projeya aştî û helwesta Tirkiyê nêrînên xwe dibêjin. Hinek jî ji kesên ji wargehê baz didin re xeberan dibêjin. Hinek ji germahiyê gazindan dikin û hinek jî awirên xwe dirêjî welêt dikin û rojên kevin tînin rojeva civatê...

- Erê, erê. Bi Xwedê her sal, di vê mehê de, keviya berfê li pişta mala me hîn bejnekê bilind dima. Heta meh û nîveke din jî berf nedihiliya!

- Ma me dizanîbû germe çi ye? Bêavbûn çi ye? Em ji vî serê gund diketinê, heta dawiya gund diçûn, di binê siya daran re dimeşiyan û her du rexên me jî tije av û kahnî bûn.

- Tu jî her fêr bûyî bin siya daran! Bila hinek tav li ruyê te bixe! Ma wê dinya xera bibe?

Bi hev re, bi qiseyên xwe dikeniyan kêfxweşiya welat bi hisret û evînî bi bîr dianîn û sihbeta xwe didomandin.





- Ev segbavên Tirkan gavekê navêjin ku rê ji me re vebe. Hema her mijûlkirin didin.

- Ew jî hesaban dikin. Baş dizanin ku gavekê tenê jî biavêjin, wê dawiya wê were.

- Serok dibêje; "Hêviva xwe qut nekin. Pêşketin bi carekê re, çênabe, hêdî bi hêdî wê çêbibe".

- Lazim e mirov bêhnfireh be. Karê dewletan ne hêsan e.

- Belê, belê. Ger hêsan ba, pêwîstî bi şerê pazdeh salan nedikir, wê bav û kalên me tiştek bikrana. Em jî di van deran re dernediketin.

- Tu lê binêre! Tu dibêjî qey xortekî pazdeh salî diaxive û ji bav û kalên xwe gazindan dike. Ew bav û kal tu yî, tu ne kêmî heftê salî yî!

- Ê me, di dema me de tiştekî wiha tine bû. Bes me dizanîbû em Kurd in, li serê çiyan dijîn û şivan in. Kê dizanîbû şoreş çi ye, azadî çi ye, dijmin çi ye?... Dema digotin 'dijmin', mêrkuj û xwîniyên dijberî me dihatin ber çavan. Ji xwe me nizanîbû Tirk hene, tinene. Me nizanîbû em bindest in an serdest in. Me digot; 'Ji xwe em li serê van çiyan in,

heliza xwe didirûn, pezê xwe diçêrînin, bi eşîran re jî şerê xwe dikin!' Aha jiyana me tev ev bû.

- Rast e, rast e; lê piştî re Kurdînî derket, PKK derket, heval hatin û çûn...

- Aha wê demê, ez jî bûm PKKyî û heta îroj jî ez PKKyî me. Ma ne baş e?

- Baş e, lê xort dikarin gazindan ji te bikin, bes tu nikarî gazindan ji bapîrên xwe bikî.

- Ma ku ez gazindan bikim çi ye, nekim çi ye? Bapîrên min niha di Semta Pênc a di Geliyê Hêzil de, hestiyên wan jî nemane. Hema wiha hat ber devê min, min jî got.

Pîremêr tev dîsa keniyan ji topaneya wargehê qîr û çepikên mezin û bi coş bilind bûn. Xuya ye taximê netewî yê wargeha penaberan, golek avêtin taximê netewî yê mêvan. Ger mirov temaşe neke jî, ji coş û çepikên wan diyar e.

Di nava kolanan de, di navbera hewşan de cih bi cih, dûman bilind dibe. Hinek pîrek li ser tenûran kom bûne. Hinek tenûrên xwe nû dadidin. Hinekan dest bi nanpijandinê kirine. Hinekan jî nanê xwe pijandine, teşta wan li ser serê wan, ber bi malê ve diçin.





Li wargehê ard bi kîloyan tê belavkirin. Ji ber vê pêwîst e herkes qiymeta ardê xwe bizanibe. Nanê xwe têra xwe bipêje, baş bipêje û neşewitîne!

Firne jî heye, lê tenûr xweştir û baştir e. Darên hişk ji ber ava mezin tînin û bi xwe dadidin.

Niha anîna daran jî qedexe kirine. Pîrekek li ser tenûrê vê yekê ji pîrekeke din re dibêje. Pîreka din bersiv dide:

- Belê, min bihîst. Lê wê çawa be? Gelo wê evqas mirov tenûrên xwe bi çi dadin?

- Baş e ku wê rojê yên me çûn pîqabeke dar anîn. Têra me heta demekê heye. Heta wê demê Xwedê mezin e.

- Wê vebe, wê vebe, xwe bê hêvî neke. Serok dibêje; "Hêvî ji sêrkevtinê bi rûmetir e. Mirovê bê serkeftin bimîne, dikare bijî; lê ku bê hêvî bimîne, nikare bijî".

- Ez bi qurbana Serok bim. De bila serokê me berdin, bila ez, li rûyê dinyê nemînim. Belê wele hêviya min heye; hêviya min, serokê min e.

Giriyê zarokekî axavtina pîrekên li ser tenûrê birî. Zarokek sê-çar salî li erdê dirêj bibû û bi hemû awaza xwe digiriya. Zarokekî

din li ber serê wî wekî sûçdar rawestiyabû. Dayika wî ji ser tenûrê hat û bi hêrs ew ji erdê rakir.

- Sed caran min ji te re got vê germê pêxwas dernekeve der ve!

Zaroka din axavtina dayika xwe birî û got:

- Yadê, yadê, lingê wî li vî berî qelibî û ket erdê.

- Tu hişş be! Min ne got, ji hundir dernekevin? Tu nizanî ji germahiya zêde çavê deh kesan kore bûne? Qey tu dixwazî çavên te jî kore bibin? Bi destê birayê xwe bigre û biçin malê. Zû! Ez jî nan xelas bikim, ez têm.

Zarok rêkirin malê û dîsa vegeriya ser tenûrê.

Ava Germavê bi bêhndayineke nexweş û genî di binya tenûrê re diherikî. Çend qaz di navê de xwe hênik dikirin. Li ser kaniya germavê zarokan xwe dixistin avê. Keçên ciwan ji aliyekî ve karê xwe dimeşandin, ji aliyekî ve xwe hênik dikirin. Car caran jî tasek av diavêtin ser hev, henek bi hev dikirin, qerf di ber hev re diavêtin û kêfxweşiya ciwanbûna xwe bi ken û neşe dijiyan.

Dema reşahiya êvarî perdeya xwe hêdî bi hêdî berdide ser wargehê, endamên malbatê li ser sifreya penabertiyê kom dibin. Wê şevê çi ji wan qediya be... ew tê xwarin. Ger mirîşkên wan wê rojê hêk kiribin û du-sê hêk firotibin, dibe ku kîloyek tirî, yan gindorek li ser sifreya wan hebe. Yan şorbeya birincê, yan nîsk, yan jî halê wan hinekî xweş be, zeleteyek, tirşikek dibe xwarina êvarê.

Ger dewekî cemidî jî li ber hebe û nanê tenûrê yê germ, wekî li zozanan li ber çiraya gov û zoman bin, wiha kêfxweş dibin.

Piştî xwarinê wê biçin temaşekirina nûçeyan. Wê guhê wan li ser be, ka li ser xaka welat çi pêşketin hene... Kurdên berbayê cîhanê bûne, ji bo azadiya xwe çi tevdigerin, li ser Mexmûr çi nûçe hene?

Derengiya şevê wê vegerin malên xwe, lê hêviya wan, vegera welat e. Bes naxwazin vegerin welatekî wekî berê, dixwazin vegerin welatekî wekhev, azad, demokratîk ku tê de bi serokê xwe re bijîn.

Ji bo vê, hemû zor û zahmetî dane ber çavan. Ji bo vê li hember germê, bêavbûnê, tinebûnê li ber xwe didin. Têgîhiştine ku azadî ji hemû tiştên li ser ruyê cîhanê birûmetir e. Hêviya wan azadiya welat e. Azadiya welat jî girêdayî azadiya Serokê wan e.

Şev zû reşahiya xwe dipêçe ser wargehê. Penaber xwe, li ser nivînên xwe dirêj dikin. Car caran stêrkan dijmêrin, car caran bi stêrkên diherikin re, xeyalên xwe diherikînin ezmanên Kurdistanê. Di nava kulavên şivantiyê de, li ser heliz û rêwazan dirêjkirî, bêhna sosin, beybûn û nêrgizan dihat pozê wan. Xuşe xuşa kaniyeke zozanan weke lorîka dayikan diket guhê wan. Tama şîrê pezê spî hê jî di binê zimanê wan de bû.

Stêrkeke din ji ezmanan herikî. Xeyalên wan bêhtir dirêjî Kurdistanê bûn. Kenekî şêrin û nerme hat ser lêvên wan. Mijankên çavên wan wekî evindarên bi hezarên salan ji hev dûr mane, hev hemêz kirin. Êdî ne xeyalê wan tenê, ruhê wan jî li çiya û zozanên Kurdistanê bû.



## Rojek Ji Rojan

Li wargehê rojên germ ber bi dawî dibûn; bi roj nebe jî, bi şev êdî bayê hênik xwe şanî dida. Êvarî penaberên xwe li ser nivînan dirêj dikirin, êdî her gav destê xwe dirêjî ava qeşayê nedikirin. Heta hinek malbatan êdî qet qeşa nedikirîn, ava den, têhna wan dişikand. Ber destê sibehê hewa wiha hênik dibû ku, betanî nekişandibana ser xwe, nikarîbûn razana.

Bi vî awahî ev çend meh in nû xew li wana xweş dibû. Seranseriya mehên Havînê têr xew nekiribûn; her toz û xwêhdan li ser laşê wan dibû herî û ava wana hênik bike jî tinebû. Lê bi hatina dawiya Havînê



re, bayê Payizê bêhna xwe şanî da û rewşa wargehê guhert.

Guhertin ne di rewşa hewayê tenê de çêbû. Bi kirîna du jeneratorên mezin, xetên elektrîkê jî li nava wargehê hatin kişandin. Êdî di civatan de, li ser rêkan, li ser tenûran axavtin dizîvirî û dihat ser elektrîkê.

- Ma we elektrîk kişand mala xwe?

- Na, wele me nekişandiye.

- Me jî hîn nekişandiye.

Pişt re gilî, gazind û axavtinên di dil de dihatin ser zimên.

- Mala Hemê kişandiye. Yadê, bextê wan dişixule. Sindoqa elektrikê belav dike tam li ber deriyê wan e. Ji wan re, deh metre qeblo jî zêde ye.

- Ê me, pêncî metre jî têra me nake. Çar mal di navbera me û sindoqê de hene. Bi Xwedê ya me li ber derî be jî em nikarin bikişînin.Qirûşek pereyê me nîne. Qeblo ye, mifte ne, lempe ne... tonek pere digre.

- Ka belkî xwedê deriyekî xêre veke, heval bi xwe bikişînin an alikariyê bidin.

- Qet li hêviyê nemîne. Hevalan digot: “Pêwîst e herkes bi xwe bikişîne!”

De heval jî ecêb in lê! We ewqas mesref kir, we hinekî din bikira, elektrîk bianîba hundir û em ji vî derdî rizgar bikrana.

- Tu şaş î xwişka Zerê! Mirov her tiştî biavêje ser pişta hevalan ne baş e. Qey tu nizanî ? Hinek li vê wargehê hene, dikarin elektrîka semtekê bikişînin. Heval ji bo çi alikariyê bidin wana?

- Rast e yadê, yê wan, hatina wan ji Bakur heye. Lê yê me, kesî me nîne.

- Ka yên pereyên wan hene bila bikişînin, Xwedê mezin e....

Axavtin ji ser tenûran derbazî malan dibû û ji niqaşên navbera pîrek û zilaman re rê vedikir. Car caran jî zarokên li hêviya despêkirina dibistanan bûn, dibûn sedema van gengeşiyan.

- Yabo, qey tu ji me re elektrîkê nakişînî?

- Ma ezê bi pirça serê te bikişînim, jehro!? Tu dibinî ez bi kotekî zikê we dadigrim, elektrikê ji ku bikirim?

- Bi zarokan re nexeyide Miho, sûcê wan çi ye?

- Zarok bila zarokiya xwe bizanibin. Ji xwe tonek deyn ketiye stûyê me. Halê me ne bes e, elektrîk ji me kêm e.





- Çend rojên din wê dibistan dest pê bikin. Wê demê em pêwist in bikişînin. Ma zarok wê li ber çi dersên xwe çêbikin?

- Par li ber çi çêdikirin, îsal jî bila li ber wê çêbikin. Fanos bes e û zêde ye jî.

- Wê çavên zarokan hemû kore bibin.

- Çi dibe, bila bibe. Nîne, nîne, nîne! Ma hûn tênagîhêjin?

- Tu jî karekî bike, bila hebe; li zilamên xelkê binêre, çawa bi kêrî xwe tên. Pez dikirin û difroşin. Dikandar in. Bîran dikolin... Lê tu her betal û betal î.

- Uff, li vê malê êdî hizûr nîne! Nizam ji destê we biçim ku? Ger tu ewqasî pereyan dixwazî, kaxeza tê çêbikim, biçe mala bavê xwe, bîne, û rehet bike!

Gengeşiyên li ser elektrîkê hemû ne bi vî awayî hişk bûn. Li hinek malên rewşa wan li gorî yên din xweş, gengeşiyên berfirehtir dihatin kirin.

- Ma Silo te çima lempeyên wekî yên şehîdlikê neanîne; wele ronahiya wana pir xweş e!

- Ew biha ne. Lê min yek ji wana jî aniye. Emê wê deynin xurfa rûniştinê. Ji xwe yên din ferq nakin.

- Bavo, ne te gotibû 'ezê televizyonekê jî bînim'?

- Rast e, kurê min. Hema ez rê bibînim, ezê bînim.

- Êdî emê ji çûna kolka semtê xelas bibin. Li ser wan daran mirov hişk dibe. Heta ez nûçeyan temaşe dikim, deh birûsk dikevin pişta min.

Hinek malbat bi îmkanên xwe, hinek malbat jî bi deynkirinê ev pêşveçûna nû par ve dikirin. Roj bi roj malbatên dibin xwediyê elektrîkê, zêde dibin. Her êvar, lempeya li ber deriyê der ve pêdixin û tejên xwe radixînin. Li ber ronahiyê xwarina xwe dixwin û pişt re civatan digerînin.


Axavtina ji hatina elektrîkê despê dike diçe ser nûçeyên Medya TV û nirxandinên li ser rewşa Ewropa, Amerîka, Tirkî, Rojhilata Navîn tên kirin. Ev tev bi stratejiya nû ya PKKê ve tên girêdan û dawî axavtin dizîvire tê ser vegera welêt.

- Gelo tu dibêjî wê ev segbavên Tirkan efûyekê derxînin?

- Wele çi bêjim? Ma ne zirtan dikin, dibêjin; 'Emê payizê efûyê derxînin'. Lê çep û rastê Tirkan diyar nabe!

- Bi Xwedê qet baweriya min bi wana nayê. Ger em hinekî zorê bidinê, dibe ku efûyekê derbixin, lê ji ber xwe, qet bawer nakim.

- Ger dixwaze bi Ewropa re bibe yek, pêwîst e derbixe. Yan na Ewropa wê nagire nava xwe.



- Tu wiha bizanibe! Ew çi segbav bin, Ewropa ji wana segbavtir e. Herkes li ber fêda xwe ye. Ji bo ku rê ji partiyê re venekin, Ewropa dikare Tirkan bi vî halê wê jî bipejirîne.

- Na, xale Naso ne wiha ye; zagonên navnetewî hene. Pîvanên Kopenghangê hene. Prensîbên Ewropa hene. Li wana zor were jî, pêwîst in li gorî vana tevbigerin.

- Silo rast dibêje Naso. Ma qey Tirk mêrê diya wan in ku her tiştê wana bipejirînin. Ewropa jî wê li gorî berjewendiya xwe tev bigere. Ger Tirkiye neyê ser rêka demokrasiyê û wê bigrin nava xwe, we bibe sedema nerazîbûneke mezin di nava Ewropa de.

Şevbêrk bi van gengeşiyan heta nîvê şevê didomin. Çay tên vexwarin û çixare tên kişandin. Hêdî bi hêdî bayekî hênik ji nava kolanan digre ser hewşan û mijankên çavên wan bi jêr ve dikişîne.

- Tu dibêjî wê rewşa Yekîtiyê çawa be?

- Ê din çi mal e, li gorî min ew jî ew mal e.

- Gelo wê şerê hevalan bikin?

- Çima nekin? Çû Amerîka, hat Ewropa, çû Tirkiyê û li Rojhilata Navîn geriya. Wekî roviyan nasekine. Însanê nanê dijmin ket zikê wî, divê mirov xovan jê bike û her tiştî jê hêvî bike.

- Xwedê ya xêr çi be, wê yekê pêk bîne. Êdî bû dereng. Bi destûra we be, emê rabin.

- Hîn zû ye!

- Sibehê qederek karê min heye. Divê, em ser banê xwe naylon bikin. Ku baranek bibare em, perîşan nebin.

- Bawer nakim baraneke xurt bibare. Xwezî baran bihata, bila xanî li ber biçûna!

- De şeva we bimîne xweş.

- Şeva te jî xweş be. Car caran seran bidin me.

Şevbêrk belav dibe. Kolan nîv ronahî, nîv tarî ne. Dengê reyana çend kûçikan ji derdora wargehê û ji nava kolanan tê. Bayê hênik, her diçe zêdetir dibe. Ka sibeha bê, wê ji wargehê re çi bîne? Gelo ev roj jî wê wekî her roj be, yan wê rojeke nû be? Ji ber ku sibê li wargehê wê hilbijartinên reîstiya, şaredariyê pêk were. Xwedê a bi xêr bike!...

***

**ZIMANÊ DAYIKA XWE BIKAR BÎNE**
**ZIMANÊ DAYIKA XWE FÊR BIBE**
**ZIMANÊ DAYIKA XWE FÊR BIKE**
**BI ZIMANÊ DAYIKA XWE BIAXIVE**
**BI ZIMANÊ DAYIKA XWE BINIVÎSÎNE**




**BI ZIMANÊ DAYIKA XWE BIXWÎNE**
**BI ZIMANÊ DAYIKA XWE BIJî**
**ZIMANÊ DAYIKA XWE BIDE JIYANDIN**

**ZIMANÊ DAYIKA XWE LI PÊŞ BIXE**
**BI ZIMANÊ DAYIKA XWE BIKENE**
**BI ZIMANÊ DAYIKA XWE BIGRÎ**

